K.T.
Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

# ŞÎRET DI HELBESTA KURMANCÎ YA KLASÎK DA: NIMÛNEYA FEQÎYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ, MELE XELÎLÊ SÊRTÎ Û SEYÎD ELÎYÊ FINDIKÎ

Mehmet Emin Demir
14711028

Şêwirmend
Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn– 2019

K.T.
Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

# ŞÎRET DI HELBESTA KURMANCÎ YA KLASÎK DA: NIMÛNEYA FEQÎYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ, MELE XELÎLÊ SÊRTÎ Û SEYÎD ELÎYÊ FINDIKÎ

Mehmet Emin Demir
14711028

Şêwirmend

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn– 2019

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum **"Şîret Di Helbesta Kurmancî Ya Klasîk Da: Nimûneya Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mele Xelîlê Sêrtî û Seyîd Elîyê Findikî**" adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☐ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim/Projem sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

■ Tezimin/Projemin 3(Üç) yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

Aralık, 2019

Mehmet Emin Demir

## KABUL VE ONAY

**Mehmet Emin Demir** tarafından hazırlanan **Şîret Di Helbesta Kurdîya Klasîk Da: Nimûneya Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mele Xelîlê Sêrtî û Seyyid Elîyê Findikî** adındaki çalışma, **23.10.2019** tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[ İ m z a ]

Prof Dr. Hasan Tanrıverdi (Başkan)

Prof. Dr. Abdurrahman Adak

Doç. Dr. Hayrullah Acar

# PÊŞGOTIN

Edebîyat, ji bo ziman û çanda neteweyan xwedîyê girîngîyeka pir bilind tê dîtin. Wêjeya kurdî ya klasîk jî li gorî derfetên demê dikare ji gelek alîyan ve serkeftî bê pejirandin. Nûnerên vê beşa edebîyatê di berhemên xwe da mijarên curbicur anîne ziman û ji bo çand û zimanê kurdî xebitîne. Wêjeya kurdî ya klasîk, agahîyên ziman û çanda kurdî ya kevnare pêşkêşî me dike. Ji ber vê yekê çiqas lêkolîn bên kirin dê qîmeta vê şaxa wêjeyê bêhtir derkeve holê.

Hin helbestvanên klasîk helbestên xwe di pirtûkekê da berhev kirine. Navên van berheman ‘‘dîwan yan jî dîwançe ne.’’ Hin helbestvanan jî bi teşeya mesnewîyê berhemên xwe nivîsandine. Helbestvanên klasîk girîngî dane nivîsandin û berhevkirina helbestan. Di edebîyata kurdî ya klasîk da gelek mijarên cihêreng hatine hûnandin. Me jî xwest em li ser şîretê bixebitin û xebata xwe li ser şîretên kurdî yên klasîk ava bikin. Xebata me lêkolîneka li ser çar helbestvan û bi tevahî şeş berhemên wan e. Lêkolîn û terxankirina beyt û bendên dîdaktîk armanca vê xebatê ye.

Ev xebat, ji destpêkek û du beşan pêk tê: Di destpêkê da mijar û armanca xebatê, rê û rêbaz, çarçoveya xebatê û çavkanîyên xebatê hatine nivîsandin. Beşa yekem kurtenêrîneka edebîyata kurmancî ya klasîk, jîyana helbestvanên klasîk û berhemên wan ên ku bûne mijara vê xebatê, têgeha şîretê û helbesta dîdaktîk, şîretnameyên edebîyata tirk, ereb û farisan, çavkanîyên edebîyata klasîk û şîretnameyên kurdî dihûndirîne. Beşa duyem jî şîrovekirina beyt û bendên ku di berhemên navborî da hatine destnîşankirin e.

Hêvîya me ew e ku ev xebat bibe wek destpêkekê di mijara şîretê da..

Ez bi taybetî ji şêwirmendê xwe Doç. Dr. Hayrullah Acar ra pir spas dikim ku di vê xebatê da pir alîkarîya min kir. Ji Prof. Dr. Abdurrahman Adak û Prof. Dr. Hasan Tanrıverdi ra pir spas dikim. Wekî din di nivîsîna vê xebatê da keda gelek kesên bi rûmet heye. Ez ji dil û can spasîya wan dikim, mala wan ava be.

Mehmet Emin Demir

Mêrdîn, 2019

# KURTE

## ŞÎRET DI HELBESTA KURMANCÎ YA KLASÎK DA: NIMÛNEYA FEQÎYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ, MELE XELÎLÊ SÊRTÎ Û SEYÎD ELÎYÊ FINDIKÎ

**Mehmet Emin Demir**

Dema berhemên edebîyata kurdî ya klasîk tên vekolîn gelek beyt û bendên şîretwer ên cihêreng xuya dibin. Mijara vê xebatê ya sereke li ser gotinên şîretî û dîdaktîk ên di nav helbestên klasîk da cih girtine û armanca vê xebatê jî tesbîtkirina van beyt û bendan û şîrovekirina wan e.

Şîretên li ser dîn û tesewif, fanîbûn û demkîbûna dinyayê, cir û exlaqên xweş, dostanî û wefa, rêzên civakî, girîngîya duayan, sebir, perwerdehî, qencî û xîret û hwd. bi gelek mînakan hatine tomarkirin di vê xebatê da. Gelek helbestvanên wêjeya kurdî ya klasîk hene, lê ji bo vê xebatê me çar helbestvan û şeş berhemên wan hilbijartin. Helbestvanê ku bûne mijara vê xebatê û navên berhemên wan ên hatine vekolîn ev in: Feqîyê Teyran (*Feqîyê Teyran Hemû Helbest*), Ehmedê Xanî (*Mem û Zîn, Dîwan û Nûbihara Biçûkan*), Mele Xelîlê Sertî (*Nehcu'l Enam*), Seyîd Elîyê Findikî (*Dîwan*).

Ev xebat ji destpêkê û du beşan pêk hatiye: Di destpêkê da behsa mijar û armanca xebatê, rê û rêbaz, çarçove û çavkanîyên xebatê hatiye kirin. Beşa yekem bi kurtî edebîyata kurmancî ya klasîk, çavkanîyên wê, jîyana helbestvanên ku bûne mijara vê xebatê dihundirîne. Wekî din di edebîyata kurdî ya klasîk da helbesta dîdaktîk û dirokçeya wê ya edebîyata Îslamî ya klasîk da jî, di vê beşê da bi kurtî hatiye nivîsandin. Beşa duyem jî ji şîrovekirina hêmanên şîretî yên ku di berhemên navborî da derbas dibin pêk hatiye.

**Peyvên Sereke**: Şîret, şîretname, Helbesta dîdaktîk, edebîyata kurdî ya klasîk, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mela Xelîlê Sêrtî, Seyîd Eliyê Findikî.

# ÖZET

## KLASİK KURMANCÎ ŞİİRİNDE NASİHAT: FEQÎYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ, MELE XELÎLÊ SÊRTÎ VE SEYÎD ELÎYÊ FINDIKÎ ÖRNEĞİ

**Mehmet Emin Demir**

Klasik Kürt edebiyatına ait eserler incelendiğinde çok sayıda ve çeşitte nasihat içeren beyit ve bentler göze çarpar. Bu çalışmanın başlıca amacı, klasik şiirlerde nasihat içeren ve öğretici nitelik taşıyan bu beyit ve bentleri tespit etmek ve yorumlamaktır.

Din ve tasavvuf, dünyanın faniliği, güzel huy ve ahlaklar, dostluk ve vefa, toplumsal kurallar, duanın önemi, sabır, eğitim, iyilik ve cömertlik vs. ile ilgili nasihatler çok sayıda örneklerle bu çalışmada kaydedilmiştir. Klasik Kürt edebiyatında çok sayıda şairden ancak bu çalışma için dört şairin altı eserini seçtik. Bu çalışmaya konu olan şairler ve incelenen eserlerinin isimleri şunlardır:

Feqîyê Teyran (Feqîyê Teyran Tüm Eserleri), Ehmedê Xanî (Mem ve Zîn, Dîwan ve Nûbihara Biçûkan), Mele Xelîlê Sêrtî (Nehcu'l Enam), Seyîd Elîyê Findikî (Dîwan).

Bu çalışma, giriş ve iki bölümden oluşmaktadır: Giriş bölümünde bu çalışmanın konusu ve hedefi, yol ve yöntem, çalışmanın çerçevesi ve kaynakları üzerinde durulmuştur.

Birinci bölümde genel hatlarıyla klasik kürt edebiyatı ile ilgili kısa bir değerlendirme yapılmış, bu çalışmaya konu olan klasik şairlerin hayatları ve eserleri hülasa edilmiştir. Ayrıca bu bölümde Klasik Kürt Edebiyatında nasihat içeren eserler de kısaca inceleme konusu edilmiş ve Klasik İslam Edebiyatı nasihatname tarzı eserlerin tarihçesi de kısaca belirtilmiştir. İkinci bölümde ise adı geçen eserlerde tespit edilen ve nasihat içeren unsurların yorumlandığı bir bölümdür.

**Anahtar Sözcükler:** Nasihat, nasihatname, Didaktik şiir, klasik Kürt edebiyatı, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mela Xelîlê Sêrtî, Seyîd Eliyê Findikî.

# ABSTRACT

## LITERARY ADVICE IN THE CLASSICAL KURDISH KURMANJI POETRY: WITH EXAMPLES FROM THE WORKS OF FEQÎYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ, MELE XELÎLÊ SÊRTÎ AND SEYÎD ELÎYÊ FINDIKÎ

**Mehmet Emin Demir**

When works of Kurdish classical literature are examined, it can be seen that there exist many couplets and stanzas with literary advice. The subject of this study is to detect couplets and stanzas in the classical poems which are didactic and include literary advice and to comment on them.

In our study literary advice about religion and islamic sufism, ephemeral world, good humour and morality, friendship and fidelity, social norms, the importance of pray, patience, education, goodness and assiduity and so on have been collected with many examples. There are a lot of classical Kurdish poets, but for this study we decided on four of them. The poets who are subject to this study and their works are these: Feqîyê Teyran (Feqîyê Teyran all works by Feqî), Ehmedê Xanî (Mem û Zîn, Divan and Nûbihara Biçûkan), Mele Xelîlê Sertî (Nehcu'l Enam), Seyîd Elîyê Findikî (Divan).

This study consists of an introduction and two sections: In the introduction the subject and aim of the study, its methodology, framework and its resources are mentioned. The first section includes an outline of classical Kurdish literature and its notable representatives, the sources of classical Kurdish literature, the life of classical poets and their works which are subject to this study, the conception of literary advice and didactic, a short writing on islamic literary advice examples and Kurdish literary advice. The second section consists of comments upon the couplets and stanzas taken from these works.

**Key Words**: Advice, literary advice, didactic poetry, classical kurdish literature, Ehmedê Xanî, Mela Xelîlê Sêrtî, Seyîd Eliyê Findikî.

# NAVEROK


PÊŞGOTIN ........................................ I

KURTE ........................................ II

ÖZET ........................................ III

ABSTRACT ........................................ IV

NAVEROK ........................................ V

KURTEBÊJE ........................................ VIII

DESTPÊK ........................................ 1

1. MIJAR û ARMANCA XEBATÊ ........................................ 1

2. RÊ Û RÊBAZA XEBATÊ ........................................ 1

3. ÇARÇOVEYA XEBATÊ ........................................ 3

4. ÇAVKANÎYÊN XEBATÊ ........................................ 3

BEŞA YEKEM

ŞÎRETNAME DI EDEBÎYATA ÎSLAMÎ Û KURDÎ YA KLASîK DA

1.1. ÇAVKANÎYÊN EDEBÎYATA KLASÎK ........................................ 5

1.2. ŞÎRETNAME DI EDEBÎYATA ÎSLAMÎ YA KLASîK DA ........................................ 6

1.2.1. Helbesta Dîdaktîk û Şîret ........................................ 6

1.2.2. Şîretname di Wêjeya Klasîk a Tirk, Ereb û Farisan da ................................................ 6
1.2.3. Kurtenêrînek Li Ser Edebîyata Kurmancî Ya Klasîk .................................................... 9
1.2.4. Şîretname di Edebîyata Kurdî da .............................................................................. 10

**1.3. JÎYAN Û BERHEMÊN HELBESTVANÊN KU BÛNE MIJARA VÊ XEBATÊ .........13**
**1.3.1. FEQÎYÊ TEYRAN** ........................................................................................ 13
1.3.1.1. Jîyana Wî ........................................................................................................ 13
1.3.1.2. Berhemên Feqîyê Teyran ................................................................................ 14
1.3.1.3. Kesayetîya Wî ya Edebî, Ziman û Şêwaza Helbestên Wî ...................................... 14
**1.3.2. EHMEDÊ XANÎ** ........................................................................................ 15
1.3.2.1. Jîyana Wî ........................................................................................................ 15
1.3.2.2. Berhemên Ehmedê Xanî ................................................................................. 16
1.3.2.3. Kesayetîya Wî ya Edebî, Ziman û Şêwaza Helbestên Wî ...................................... 17
**1.3.3. MELE XELÎLÊ SÊRTÎ** .................................................................................. 18
1.3.3.1. Jîyana Wî ........................................................................................................ 18
1.3.3.2. Berhemên Mele Xelîlê Sêrtî ............................................................................ 18
1.3.3.3. Kesayetîya Wî ya Edebî, Ziman û Şêwaza Helbestên Wî ...................................... 21
**1.3.4. SEYÎD ELÎYÊ FINDIKÎ** ................................................................................ 21
1.3.4.1. Jîyana Wî ........................................................................................................ 21
1.3.4.2. Berhemên Seyîd Elîyê Findikî .......................................................................... 22
1.3.4.3. Kesayetîya Wî ya Edebî, Ziman û Şêwaza Helbestên Wî ...................................... 22

## BEŞA DUYEM

### MIJARÊN ŞÎRETÊ DI EDEBÎYATA KURMANCÎ YA KLASÎK DA

**2.1. DÎN Û TESEWIF** .............................................................................................. 24
2.1.1. Feqîyê Teyran .................................................................................................. 26
2.1.2. Ehmedê Xanî .................................................................................................... 27
2.1.3. Mele Xelîlê Sêrtî ............................................................................................... 30
2.1.4. Seyîd Elîyê Findikî ............................................................................................ 32
**2.2. FANÎBÛNA DINYAYÊ** ...................................................................................... 36
2.2.1. Feqîyê Teyran .................................................................................................. 38
2.2.2. Ehmedê Xanî .................................................................................................... 39
2.2.3. Mele Xelîlê Sêrtî ............................................................................................... 40
2.2.4. Seyîd Elîyê Findikî ............................................................................................ 40
**2.3. DUA** ............................................................................................................... 42
2.3.1. Feqîyê Teyran .................................................................................................. 43
2.3.2. Ehmedê Xanî .................................................................................................... 44

2.3.3. Mele Xelîl Sêrtî ........ 45
2.3.4. Seyîd Elîyê Findikî ........ 45
**2.4. HEZKIRIN Û EVÎNDARÎ** ........ 47
2.4.1. Feqîyê Teyran ........ 48
2.4.2. Ehmedê Xanî ........ 51
2.4.3. Mele Xelîlê Sêrtî ........ 55
2.4.4. Seyîd Elîyê Findikî ........ 55
**2.5. QENCÎ, CAMÊRÎ Û XÎRET ........ 58**
2.5.1. Feqîyê Teyran ........ 59
2.5.2. Ehmedê Xanî ........ 60
2.5.3. Mele Xelîl Sêrtî ........ 64
2.5.4. Seyîd Elîyê Findikî ........ 64
**2.6. PERWERDEHÎ Û ZANÎN** ........ 66
2.6.1. Feqîyê Teyran ........ 67
2.6.2. Ehmedê Xanî ........ 70
2.6.3. Mele Xelîlê Sêrtî ........ 73
2.6.4. Seyîd Elîyê Findikî ........ 74
**2.7. SEBIR** ........ 76
2.7.1. Feqîyê Teyran ........ 77
2.7.2. Ehmedê Xanî ........ 78
2.7.3. Mele Xelîlê Sêrtî ........ 78
2.7.4. Seyîd Elîyê Findikî ........ 79
**2.8. ŞÎRETÊN CURBICUR** ........ 81
2.8.1. Feqîyê Teyran ........ 81
2.8.2. Ehmedê Xanî ........ 84
2.8.3. Mele Xelîlê Sêrtî ........ 92
2.8.4. Seyîd Elîyê Findikî ........ 93

**ENCAM** ........ 97

**ÇAVKANÎ** ........ 99

# KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| amd. | :Amadekar |
| b.n.b | : Berhemên navborî |
| bnr. | :Binêrin |
| c. | : Cild |
| s. | : Sal |
| h.b. | : Heman berhem |
| h.g. | : Heman gotar |
| hwd. | : Her wekî din |
| j. | :Jimare |
| r. | :Rûpel |
| wer. | :Wergêr |
| weş. | :Weşanxane |
| M. | : Mesnewî |
| Q. | : Qesîde |
| X. | : Xezel |
| Mus. | : Musemmet |
| Mur. | : Murebbe’ |
| Msn. | : Musemmen |
| T. | : Texmîs |

# DESTPÊK

## 1. MIJAR Û ARMANCA XEBATÊ

Dema mirov li berhemên kurdî yên klasîk dinêre, di piranîya berhemên kurdî da mirov rastî hêmanên şîretî tê. Helbestvanên wek Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mele Xelîl Sêrtî û Seyîd Elîyê Findikî giringîyeka mezin dane vê rêbazê û di helbestên xwe da cih dane unsurên şîretê. Mijara vê xebatê tespîtkirina hêmanên şîretî û dîdaktîk yên çar helbestvanên klasîk e. Helbet di piranîya berhemên klasîk da helbestên lîrîk, pastoral, satîrîk û epîk jî hene. Lê di vê xebatê de mijar û armanca me li ser unsurên dîdaktîk in. "Gotinên zanyar û helbestvanên berê, şîret û tecrûbeyên wan ka çi ne û bi çi awayî ne, gelo rêbaza şîretê çawa bi kar anîne?" ji vê xebatê ra bûye mijar û armanca sereke. Me xwest ku hin helbestên klasîk bên xwendin û vekolîn, şîret û tecrûbeyên hin helbestvanan bi rêk û pêk bên berhevkirin, tesnîfkirin û rêzkirin.

## 2. RÊ Û RÊBAZA XEBATÊ

Xebat û lêkolînên hevçax ên li ser şîretnameyên kurdî gelek kêm in. Vê yekê valahîyek çêkiriye bo wêjeya kurdî. Di wêjeya tirkî da rewş berevajî ye û lêkolînên hevçax ên ku li ser şîretnameyan hatine kirin pir in. Ji ber vê sedemê rê û rêbaza xebatên hevçax ên di edebîyata tirkî da hatine kirin û lêkolînên li ser wan, fikrek dan me û bûn mînak ji vê xebatê ra. Gelek xebat hatin analîzkirin û di encamê da rê û rêbaza vê xebatê derket holê.[1]

[1]Metnê ku me ji vê xebatê ra kirine bingeh ra hin mînak, Mustafa Durdu, ***Türk Edebiyatında Nasihat,*** Yayınlanmamış Tez, Konya 2008; Zahir Ertekin**, "*Analizek li ser Guldana Hezîn di Çarçoveya Şîretnameyên Kurdî de,"*** Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, Yıl/Year/Sal:2 Cilt/Volume/Cîld:2 Sayı/Issue/Hejmar:3 ss. 62-86.; Murat Öztürk***,"Klasik Türk Edebiyatında Babadan-Oğula-Ebeveynden Çocuğa-Nasihat Geleneği,"*** Akademik Bakış Dergisi Sayı:39, Celalabat-Kırgızistan 2013; İbrahim Gültekin, **"*Taşlıcalı Yahyâ Bey'in Divanı'nda Nasihatname Türünde Yazılmış Şiirler Ve Bu Şiirlerin Konuları, Dili Ve Üslubuna Dair Bazı Hususiyetler*,**" Turkish Studies - International Periodical For The Languages, Literature And History Of Turkish Or Turkic Volume 8/9 Summer 2013, P. 1525-1552, Ankara-Turkey; Mahmut Kaplan, ***"Türk Edebiyatında Manzum Nasihat-nâmeler"***, Türkler, Ankara 2002.

Li gorî me di çavkanîyan da dît, li ser şîret û şîretnameyan du rêbazên lêkolînê hatine şopandin: Yek ji wan, rasterast wergera beytên klasîk bo zimanê hevçax e û bi vî awayî çêkirina xebatê ye. Ya din jî şîroveyên beytan e û bi vî awayî çêkirina xebatê ye. Di xebata me da rê û rebaza duyem hatiye hilbijartin û şîroveyên beyt û bendên kurdî yên klasîk hatine kirin.

Di vê xebatê da pêşî berhemên ku di beşa çavkanîyên xebatê da hatine tomarkirin bi hurgilî hatin xwendin û analîzkirin, hêmanên şîretî hatin berhevkirin û di dawîyê da jî dabeşkirineka naverokî hate kirin.

Piştî dabeşkirinê, beşa şîroveya beytan dest pê kir. Ji bo şîroveyên rast û qenc derkevin holê, xebatên li ser berhemên navborî hatin xwendin û analîzkirin. Wateyên peyvên di helbestan da derbas bûne di ferhengan da hatin dîtin. Wekî din ji bo term û têgihên wêjeya klasîk rast bên şîrovekirin, ji hin berheman sûd hatin wergirtin.[2] Di beşa çavkanîyan da hemû berhemên ku hatine xwendin û analîzkirin, hatine rêzkirin.

Li ber beyt û bendan di nav kevanekê da ji rêzê ve teşeyê nezmê, rêza helbestê, rêza beyt yan bend û rûpelên wan hatine dayîn. Ev yek ji bo *Mem û Zîn, Nûbihara Biçûkan* û *Dîwan*a Ehmedê Xanî, *Nehcu'l-Enam* û *Dîwan*a Seyîd Elîyê Findikî bi vî awayî hate nivîsandin. Wekî din di berhema Feqîyê Teyran da rêza helbestan a jimarî ne dîyar e. Rêza vê berhemê jî di nav kevanekê da wiha ye: Teşeyê nezmê, rêza beyt û bendê û rûpelê beyt û bendê.

Ayetên ji Quranê hatine veguhaztin ku bi mijarê ra têkildar in bi dirûvê sûre û rêza ayetê di jêrenotan da hatine tomarkirin. Wekî din ji bo mijar dewlemendtir bibe, li dawîya her mijara şîrovekirina gotinên şîretkar me hin gotinên pêşîyan jî nivîsandine. Kurtekirina peyvan di beşa kurtebêjeyê da hatine tomarkirin. Rê û rêbaza vê xebatê bi vî awayî hat meşandin.

---

[2] Bnr.,İskender Pala, ***Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü***, Akçağ Yayınları, 3.Basım, Ankara 1995; Neslihan Koç Keskin, Ahmet Mermer, ***Eski Türk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü***, Akçağ Yayınları, İstanbul 2005.

## 3. ÇARÇOVEYA XEBATÊ

Di edebîyata klasîk da cureyek bi navê şîretname/nesîhetname/pendname heye. Di beşa şîretnameyên Îslamî da ev cure hatiye vekolîn. Ev cure bi serê xwe ne ango berhemên cuda ne û ne di nava dîwanan da ne. Çarçoveya vê xebatê ne li ser berhemên bi navê şîretname û sîyasetnameyan e. Ev xebat lêkolînek e li ser hin helbestên kurdî yên klasîk. Lêkolîneka sînorkirî ye û bi beyt û bendên şeş berhemên çar helbestvanan hatiye sînorkirin. Di van berheman da gelek şîret me tespît kirin, lê me wek mînak ji her helbestvanî hin şîret terxan kirin. Çarçoveya vê xebatê ew e ku unsurên şîretê yên di nav helbestên kurdî yên klasîk da cihê xwe girtine, bên vekolîn û şîrovekirin.

Li alîyê din di helbestê da li gorî naverokê dabeşkirineka giştî heye. Wek mînak, mijarên evînî û hezkirinê bi navê helbestên lîrîk; xweza û xweşikahîya xwezayê bi navê pastoral; qehremanî û lehengî bi navê epîk; mijarên hînkirin û fêrkirinê jî bi navê helbestên dîdaktîk hatiye terxankirin. Çarçoveya vê xebatê li ser helbestên dîdaktîk hatiye sînorkirin. Wekî din, cureyên helbestê yên wek tewhîd, munacat, ne't, mewlûd, sîyer, eqaîd, medhîye, mersîye û hwd. hene. Di nav van cureyên helbestê da hêmanên ku li ser hînkirin û şîretê ne hatine berhevkirin, dabeşkirin û şîrovekirin.[3]

Temaya nesîhetê di gelek helbestvanan da heye, lê me li gorî sedsalan vê xebatê sînordar kir û di her sedsalê da wek mînak helbestvanek hilbijart. Di sedsala şazdehem da Feqîyê Teyran, sedsala hivdehem da Ehmedê Xanî, sedsala hijdehem da Mele Xelîlê Sertî û sedsala bîstem da Seyîd Elîyê Findikî di çarçoveya vê xebatê da hatine hilbijartin.

## 4. ÇAVKANÎYÊN XEBATÊ

Çavkanîyên vê xebatê bingeha xwe ji berhemên helbestvanê ku bûne mijara vê xebatê, digire. Helbestvanên ku me di vê xebatê da lêkolîn kirine û navê berhemên wan ên ku me esas

[3]Derbarê teşeyên nezmê da ji bo agahîyên berfireh binêrin, Abdurrahman Adak, ***Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî Ya Klasîk De***, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2019.

girtine ev in: Feqîyê Teyran[4](*Feqîyê Teyran Hemû Helbest*), Ehmedê Xanî (*Mem û Zîn*[5]*, Dîwan*[6] û *Nûbihara Biçûkan*[7]), Mele Xelîlê Sêrtî (*Nehcu'l Enam*)[8] û Seyîd Elîyê Findikî (*Dîwan*).[9]

Li alîyê din me ji ''*Şerha Dîwana Ehmedê Xanî*'' ya Abdurrahman Durre jî sûd wergirt[10]. Jan Dost, *Mem û Zîn Bi Kurdîya Îro*, Perwîz Cîhanî *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*[11] jî, ji me ra bûn alîkar bo şîroveya hin beytên Mem û Zînê. Me gelek sûd ji berhema Abdurrahman Adak a *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk* girt[12]. Ji bo têgihîştina hin peyv û têgihên edebîyata klasîk me ji *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr* ku Hayrullah Acar amade kiriye û ji *Dîwan*a Ehmedê Xanî ku Kadri Yıldırım amade kiriye sûd wergirt[13]. Wekî din me ji gelek xebat, tez, pirtûk û gotaran jî sûd wergirt. Navê çavkanîyên ku me jê sûd wergirtine di dawîya xebatê da yek bi yek hatine nivîsandin.

---

[4]Feqîyê Teyran, ***Feqîyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî,*** M. Xalid Sadinî (Amd.), Weşanxaneya Nûbihar, çapa 8.,Stenbol, 2014.
[5]Ehmedê Xanî, ***Mem û Zîn***, Huseyn Şemrexî (Amd.), Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol 2013.
[6]Ehmedê Xanî Külliyatı 4***, Dîwan***, Kadri Yıldırım(Amd), Weşanxaneya Avesta, İstanbul 2014.
[7]Ehmedê Xanî, ***Nûbar***, Zeynelabidîn Zinar(Amd.), Weşanên Roja Nû, Stockholm 1986.
[8]Mele Xelîlê Sêrtî, ***Nehcu'l Enam***, Zeynelabidîn Kaya/Zinar(Amd.), Weşanxana Kurdistan, Stockholm 1988.
[9]Seyîd Elîyê Findikî, ***Dîwan***, Selman Dilovan (Amd.), Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol 2012.
[10]Abdurrahman Durre, ***Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jîyana Wî***, Weşanên Avesta, Stenbol 2002.
[11] Ehmedê Xanî, ***Mem û Zîn Bi Kurdiya Îro***, Jan Dost, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2008; Perwîz Cîhanî, ***Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî***, Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol, 2013.
[12]Abdurrahman Adak**, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasî*k**, Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol, 2013.
[13] Bnr., ***Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr***, Hayrullah Acar(Amd.), Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol 2016., r.126-203.; Kadri Yıldırım, ***Ehmedê Xanî Külliyatı 4, Dîwan***, r.42-100.

# BEŞA YEKEM

# ŞÎRETNAME DI EDEBIYATA ÎSLAMÎ Û KURDÎ YA KLASÎK DA

## 1.1. ÇAVKANÎYÊN EDEBÎYATA KLASÎK

Edebîyata tirkî, erebî û farisî ya klasîk him di warê berheman him jî di warê cureyên nezmê da dewlemend tê qebûlkirin. Piştî ku ev her sê netewe bûne misilman, peyv û têgihên Îslamê di nav wan da belav bûn. Bandora dînê Îslamê di berhemên klasîk yên van her sê neteweyan da eşkere tê dîtin. Zimanê erebî jixwe di wêjeya klasîk da xwedîyê bandorek mezin e û bandora wê di helbesta kurdî, tirkî û farisî ya klasîk da jî eşkere ye. Li alîyê din zimanê farisî li Rojhilata Navîn demekî dûvdirêj bûye zimanê edebîyatê û bandora xwe di warê edebîyatê da nîşan daye. Zimanê farisî ewqas bûye xwedîbandor ku li dewleta Selçûqîyan wek zimanê fermî hatiye pejirandin. Rewşa sîyasî ya tirk, ereb û farisan bi giştî derfet daye helbestvan û nivîskaran ku berhemên xwe binivîsin û belav bikin. Ji ber vê yekê edebîyatvanên tirk, ereb û faris yên klasîk derfetên di destê xwe da baş bi kar anîne û di encamê da gelek berhemên klasîk anîne holê. Li alîyê din edebîyata kurdî ya klasîk ji alîyê cureyên nezmê ve hinek kêm be jî lê li gorî rêzikên edebîyata klasîk xwedîyê gelek berheman e. Edebîyata klasîk ji gelek jêderan sûd girtiye. Çavkanîyên giştî yên di edebîyata klasîk da hatine bi kar anîn ev in:

Qurana Pîroz, hedîsên şerîf, zanistên Îslamî (tefsîr, kelam, fiqih), dîroka îslamê, tesewif û têgihên tesewifê, mîtolojîya herêma îranê, çîrokên pêxemberan, bûyer û kesayetên dîrokî û

mîtolojîk, zanistên wê demê, dîrok, ziman û çanda neteweyî, nêrînên wêjeya wê demê, peyv û têgihên erebî û farisî.[14]

## 1.2. ŞÎRETNAME DI EDEBÎYATA ÎSLAMÎ YA KLASÎK DA

### 1.2.1. Helbesta Dîdaktîk û Şîret

Şîret di edebîyata cîhanê da beşek ji cureya helbesta didaktîk e. Têgeha şîretê ango têgeha dîdaktîk danasîna tiştên bi mifa û xisar e, ronîkirin, hînkirin û xîretek e ji bo feydeya mirovan. Armanca şîretê teşwîqa başîyê û dûrkirina ji xirabîyê ye. Peyva şîretê wek pend û nesîhet jî tê bi kar anîn. Di ferhengan da‘’şîret, nush, pend, mev’îze’’[15]; ji bo wateyên wek ‘’fêrkirina îbretamîz, pêşnîyaz, hişyarî, perwerdekirin, hînkirin.’’[16] tê bikaranîn. Wekî din wateyên’’dûrbûna ji xerabîyê, mebestxweşî û wateya ku mirov başîya kesên din bixwaze’’[17]dihundirîne.

Di nav mirovan da rêbaza şîretê berbelav e û tê dîtin ku pir caran tê bikaranîn. Mirovên temenbilind û kesên zana bi berdewamî ceribînên xwe ji yên din ra dibêjin û bi vê yekê dixwazin rêya baş nîşanî wan bikin. Tê dîtin piştî ku nivîsandin di nav mirovan da belav bû, gotinên şîretker û hîkemî derbasî ser kaxizê bûn û bi vî awayî bûn malên hemû mirovan. Çi dîndar çi ne oldar, tê dîtin ku kesayetên dîrokî şîret li derdora xwe kirine û wan vexwendine qencîyê.[18]

### 1.2.2. Şîretname di Wêjeya Klasîk a Tirk, Ereb û Farisan da

Ev her sê netewe ji hezar salî zêdetir e cîrantîya kurdan dikin. Lewma pêwist e ku di beşa şîretnamayen da kurtenivîsek li ser van her sê edebîyatan bên nivîsîn. Dema em li cureyên edebiyata klasîk dinêrin cûreyeka kevn û berbelav derdikeve pêşîya me. Navê vê cûreyê

---

[14]Ji bo agahîyên berfireh binêrin, İskender Pala, ***Divan Edebiyatı***, Kapı Yayınları, Çap.13., İstanbul 2010; Mine Mengi, ***Eski Türk Edebiyatı Tarihi***, Akçağ Yay., Ankara 1995; Agâh Sırrı Levend, ***Divan Edebiyatı***, Enderun Kitabevi Yay., İstanbul 1984; Adak, **h.b**., r.26-49; Ömer Faruk Akün, ***Divan Edebiyatı***, TDV İslam Ansiklopedisi, İstanbul 1994, C.9.,389-427.
**15**Ferit Devellioğlu, ***Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat***, Aydın Kitabevi Yay., Ankara 1995, s. 808.
**16**Osmanlıca-Türkçe ***Ansiklopedik Büyük Lûgat (hzl.: Abdullah Yeğin, Abdülkadir Badıllı vd.),*** TÜRDAV Yay., İstanbul 1978, C 2, s. 1188.
**17**Mustafa Çağrıcı, ***“Nasihat”***, TDV İslam Ansiklopedisi, İstanbul 2006, C 32, r.408.
[18]Bnr.,**Öztürk**, h.g., r. 4-5.

pendname/nesîhetname/şîretname ye. Di vê cûreyê da tê dîtin ku di gelek mijaran da şîret hatine kirin. Di edebîyata tirk û farisan da gelek minakên nesîhetnameyan hatine dayîn. "Pendname berhemên şîretan in ku bi gotinên hîkemî û şîretî têr û tije ne. Ev şîret bi zêdetirî derheqê birêvebirina dewletê, dîn, rabûn û rûniştin û perwerdehîyê da ne. Wekî din navê enderz jî li pendnameyan hatiye kirin. Pendname di wêjeya farisî da ji alîyê cureyê ve yekem berhemên exlaqî tên pejirandin."[19]

Ev berhem bi giştî bi navên wek sîyasetname, mev'îzename, hîkmet, pendname, wesîyetname, îbretname, nesîhetname û hwd. hatine bi kar anîn. Dînî, exlaqî, civakî, sîyasî, felekî, rêveberî, perwerdehî, dadwerî û hwd. di gelek mijaran da ev cure hatiye bi kar anîn û berhemên şîretkar derketine holê. Helbestvan/nivîskar xwe berpirsîyar dibîne ku şîreta qencî û rastîyê li derdora xwe bike. Lewra li gorî wan, meriv û civat tenê bi qencîyê dilşad dibe.[20]

Şîretnameya herî navdar Pendnameya Ferîduddînê 'Ettar (1120-1221) e ku zimanê wê farisî ye. Ev berhem bûye mînak ji bo wêjevanên klasîk û piştî vê berhemê gelek berhemên bi tevahî şîret in, derketine holê. Di van berheman de bîr û bawerîya Îslamê, îdareya dewletê û we'z, têgihên herî zêde berçav in.[21]

Şîretname bi gelek mijaran hatine hûnandin. Hinek ji wan şîretên ku hatine kirin li gorî dewr û dema wî wextî ne, hinek jî heta dema me rastîya xwe winda nekirine. Tê dîtin ku şîretname, agahîyên serdema xwe û rewşa civatên wê demê dihundirînin. Ev yek bandor û girîngîya şîretnameyan nîşan dide ku bi derbasbûna sedsalan jî qîmeta xwe wenda nekirine û hêj jî sûdewer in.

Di wêjeya klasîk a tirkî da gelek mînakên vê cûreyê hatine nivîsandin. *Kutadgu Bilig* a Yusuf Has Hacib wek yekem şîretnameya tirkî tê dîtin. Wekî din hin mînakên navdar ên din jî ev in:

- *Risâletü'n-Nushiyye* ya Yunus Emre,
- *Ferhengnâme-i Sa'dî* ya Hoca Mesud,

[19]Ertekin, **h.g.** r.66; Melîhe Mehdewî, ***"Pendname"***, DMBİ, Tehran 1367-? Hş, XIII, r. 728-731.
[20]Ji bo agahîyên berfireh bnr., Öztürk**, h.g.**,r.2-21.
[21]Musa Balcı, ***Taşa Kazınmış Sözler: İslam Öncesi Fars Öğüt Edebiyatı***, Büyüyenay Yayınları, İstanbul, 2016.

- *Maârifnâme* ya Sinan Paşa,
- *Vasiyyet-i Nûşirevân-i Âdil be-Pusereş* a Ahmet Dai,
- *Gülşen-i Pend* a Sâfî Mustafa Efendi,
- *Hayriyye* ya Nabi,
- *Düstûrü'l-Amel li-İslâhi'l-Halel* a Katip Çelebi,
- *Lutfiyye* ya Sünbülzâde Vehbî.[22]

Edebîyata farisî a klasîk da gelek mînakên şîretnameyan hene. Bi taybetî *Pendname* ya Ferîduddînê 'Ettar pir bi navdar e û bandoreka pir mezin li edebîyata tirkî jî kiriye.[23] Wekî din şîretnameyên farisî ên sereke û navdar ev in:

- *Pendname* ya Se'dîyê Şîrazî
- *Bostan* a Se'dîyê Şîrazî,
- *Gulistan* a Se'dîyê Şîrazî,
- *Mesnewî* ya Mewlana Celaleddînê Rûmî,
- *Baharîstan* a Molla Camî.

Edebîyata erebî da gelek mînakên sîyasetnameyan hatine dayîn. Berhemên erebî yên ku navê wan şîretname bin me nedîtin û di lêkolînên me da me tespît nekirin. Li alîyê din li gorî hin lêkolîneran, sîyasetname jî wek şîretname tên pejirandin. Ji ber vê yekê em dê hin mînakên sîyasetnameyên erebî li vir binivîsin:

- *Adâbû'l-Mûlûk* a Ebû Mansur es-Seâlîbî'
- *Nasîhatû'l-Mûlûk* a Mâverdî,
- *Nasîhatû'l-Mûlûk* a Îmâm-ı Gazâlî[24]

---

[22]Ji bo mînak û agahîyên berfireh binêrin**,** İskender Pala, ***Nasihatname***, DİA, C. 32, Ankara 2006, r. 409-410; Mahmut Kaplan, ***Türk Edebiyatında Manzum Nasihat-nâmeler***, Türkler, Ankara 2002.

[23]Derbarê şîretnameyên farisî da ji bo mînak û agahîyên berfireh bnr.,http://nimetyildirim.com.tr/hukumdarlara-ogutler-nasihatul-muluk/(29.07.2019);https://nyildirim.wordpress.com/2008/02/17/fars-ogut-edebiyati/(28.07.2019)**;** Azmi Bilgin, ***Emre Tercüme-i Pendnâme-i Attar***, Enderun Kitabevi, İstanbul 1988; Mehmet Arslan, "***Divan Edebiyatında Nasihatnameler (Pendnameler) ve Vak'anüvis Esad Efendi"nin Pendnâme'si"***, Türk Dili ve Edebiyatı Makaleleri, Sayı: 4, Sivas 2004,s. 5-80;İskender Pala, ***Nasihatname***, DİA, C. 32, Ankara 2006, r. 409-410.

[24]Ji bo mînak û agahîyên berfireh bnr.,Hayrullah Acar," ***İbrahîm bin Muhammed, Devlet ve İnsan, Siyasetin İlkeleri, Yöneticilerin Vasıfları, Âdâbu'l-Hilâfe ve Esbâbu'l-Hisâfe***," Büyüyen Ay, İstanbul, 2016**,** r.37-51.**;**Rıdvan Canım**,**

### 1.2.3. Kurtenêrînek Li Ser Edebîyata Kurmancî Ya Klasîk

Edebîyata kurdî ya klasîk ji ziman û çanda kurdî ra bûye çavkanî. Zimanê kurdî bi wêjeya kurdî ya klasîk pêşve çûye û kemilî ye. Di serdema me da edebîyat, wek hebûna neteweyan tê pejirandin. Ji vî alîyî ve edebîyata kurdî ya klasîk girîng tê hesibandin. Helbestvan û hunermendên kurdî yên klasîk her çiqas di nav derfetên kêm da mabin jî, dest ji xebatê bernedane û bi zimanê kurdî nivîsandine. Bi zaravayên kurdî yên wek soranî, lorî û zazakî jî gelek berhemên klasîk hatine nivîsandin. Lê di vê xebatê da em li ser edebîyata klasîk a kurmancî rawestîya ne. ‘‘Dînê îslamê, hêmanên erebî, farisî û çanda îranê ji wêjeya kurdî ya klasîk ra bûne çavkanî. Di bin sîya bandora van hêmanan da li gorî pergalekî û nivîskî wêjeya kurdî ya klasîk derketîye holê. Ji vê şaxa edebîyatê ra edebîyata kurdî ya klasîk tê gotin.’’[25]

Rewşa sîyasî ya neteweyan di xebatên ziman, çand û edebîyata wan da bandorê dike. Ji vî alîyî ve di dîrokê da derfetên hunermendên kurdan li gorî tirk, ereb û farisan kêm mane, dema ku derfet hinek xweş bûne jî gelek helbestvan û hunermendên mezin derketine holê. Ji kêmderfetîyê dibe ku hin cureyên wêjeyê nehatibin nivîsîn. Wek mînak, di edebîyata kurdî ya klasîk da berhemên ku agahîyên jînenîgarîya helbestvanan didin, nayên dîtin.[26]

Li alîyê din heya sedsala bîstem gelek helbestvanên kurmancî yên klasîk derketine holê. Di sedsala şazdehem da Mîr Yeqûbê Zirkî û Elîyê Herîrî ne. Sedsala şazdehem û hivdehem da Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û Mîr Îmadedînê Hekarî derketine holê. Mela û Feqî helbestvanên pir bihêz bûn, vêga jî bandora wan a gelek zêde xuya ye. Sedsala hivdehem da Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî, Ehmedê Xanî, Remezanê Cizîrî, Axaokê Bêdarî, Xalid Axayê Zêbarî/Laxer, Mela Remezanê Ebasî berbiçav in. Ehmedê Xanî bi berhemên xwe bandoreka pir mezin li edebîyata kurdî kiriye û berhemên wî hêj jî gelek zêde tên xwendin.

Sedsala hijdehem da helbestvanên wek Melayê Bateyî, Selîmê Silêman, Harisê Bedlîsî, Mela Mensûrê Girgaşî, Seyfîyê Şûşî, Îsmaîlê Bazîdî, Miradxanê Bazîdî, Macin, Mîna û Sadiq û

---

“***Pendnameler ve Türk Edebiyatında Benzer Nitelikli Öğüt Kitapları”***, Millî Kültür**,** 1989, s.22-25**.;** İskender Pala, ***Nasihatname***, DİA, C. 32, Ankara 2006, r. 409-410.

**25**Ji bo agahîyên berfireh bnr., Abdurrahman Adak**, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk***, Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol, 2013., r.26.
**26**Bnr., Adak**, h.b.**, r.47.

Şêx Xalidê Zêbarîyê Yekem derketine pêş. Di vê sedsalê da *Mewlûd*a Melayê Bateyî bandoreka pir mezin li helbestvanan û gelê kurd kiriye û hêj jî li gelek deveran tê xwendin. Piştî vê berhemê gelek mewlûdên kurdî hatine nivîsandin.

Sedsala hijdehem û nozdehem da helbestvanê wek Siyahpoş, Pertew Begê Hekkarî, Weda'î, Şêx Nûredînê Birîfkanî, Mela Xelîlê Sêrtî, Feqe Reşîdê Hekkarî, Bekir Begê Erizî, Mihemed Teyyar Paşayê Amêdîyê, Şêx Ehmedê Feqîr derketine holê. Wekî din Mela Mehmûdê Bazîdî[27] di vê sedsalê da nunertîya pexşanê kiriye û xizmetên girîng ji edebîyata kurdî ra kiriye. Di vê sedsalê da helbestvanê herî girîng Mela Xelîlê Sêrtî tê pejirandin. Mela Xelîl bi *Nehcu'l Enam*a xwe navdar bûye û bandoreka berbiçav li medreseyên kurdan kiriye.

Sedsala bîstem da helbestvanekî xuyanî jî Seyîd Elîyê Findikî ye. Seyîd Elî dîwaneka bi şîretan dagirtî anîye holê. Mela Husnî Hezîn jî rêya helbestvanên klasîk şopandiye û bi vî awayî dikare wek helbestvanekî klasîk ê hevçax bê dîtin.[28]

### 1.2.4. Şîretname di Edebîyata Kurdî da

Piştî ku dînê Îslamê di nav kurdan da belav bû, rê û rêbazên vî dînî jî derbasî çanda kurdan bû. Di berhemên kurdî yên klasîk da motîfên Îslamî pir zêde xuya dikin. Em dikarin bibêjin û di berhemên klasîk da jî xuyaye ku bingeha wêjeya klasîk a kurdî bi giştî dînê Îslamê ye. Pêxemberê dînê Îslamê di hedîseka xwe da gotîye 'Dîn, şîret e.'[29] û jixwe rêjeyeka gelek zêde ji hedîsan, tê zanîn ku şîretan dihundirînin. Quran û hedîs, ji bo misilmanan ji her aliyî ve wek mînak û ronahî tên pejirandin. Ev yek bûye rênîşanek ji bo zana, nivîskar û helbestvanan. Wan jî şîret ji xwe ra wek peywir dîtine û di berhemên xwe da cih dane şîretê. Çi pexşan çi helbest di piranîya berhemên zanyarên Îslamê da gotinên şîretwer û hîkemî kêm zêde cih digirin. Tê dîtin ku di edebîyata kurdî ya klasîk da jî rewş bi heman awayî ye û rêbaza hînkirin, hişyarkirin, dîdaktîk û şîretkirinê hatiye bi kar anîn. Di rûpelên pêş da gelek gotinên ku bi vî rengî ne, qiseta wan hatiye kirin. Mijara me

---

[27] Derbarê edebîyata kurdî ya klasîk da ji bo agahîyên berfireh bnr., Adak**, h.b**., r**.**15-322; Feqî Huseyn Sağnıç, ***Dîroka Wêjeya Kurdî***, Weşanxaneya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002; ZeynelAbidîn Zinar, ***Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê***, Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm 2009; ZeynelAbidîn Zinar, ***Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî***, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stockholm, 1991; Me'rûf Xeznedar, ***Mêjûy Edebî Kurdî***, Dezgay Aras, Hewlêr, 2002; Qenatê Kurdo, ***Tarîxa Edebîyata Kurdî***, Weşanên Öz-Ge, Ankara, 1992.

[28] Derbarê Mele Husnî Hezîn da ji bo agahîyên berfireh binêrin, Yakup Aykaç, ***Dîwana Hezîn (Metn û Lêkolîn)*,** Teza Masterê Ya Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê Enstituya Zimanên Zindî, Bîngol 2015.

[29] Ahmed ibn Hanbel, ***Müsned*,** Beyrut, 1999, 28/138.

ya ku me lekolîn kiriye jî di vî warî da ye û me şîroveya gelek beytên ji hin berhemên wêjeya kurdî ya klasîk tomar kirine.

Nesîhetname di edebîyata klasîk da cureyek e. Ev cûreyê edebîyatê ji bo wêjeya neteweyên misilmanan pir girîng e. Lewra dikare bê gotin ku misilmanan fermanên Xweda bi vê cureyê anîne ziman û derfetên wan deman bi kar anîne. Şîretname him bi pexşanê û him bi helbestê hatine nivîsîn. Em dibînin ku şîret di wêjeya klasîk da zêdetir bi rêya helbestê hatine nivîsîn. Di helbesta kurdî ya klasîk de jî em rastî gelek mînakên nesîhetnameyê hatin, lê helbestvanên kurdî ev şîretên xwe zêdetir di nava helbestan da tomar kirine ku ev helbest jî di nava dîwan û dîwançeyan da ne.[30] Di naveroka helbestên kurdî da gelek şîret hene. Mijara me jî lêkolîn û lêgerîna şîretên ku di nav helbestên kurdî yên klasîk da tomarkirî ne. Di edebîyata zazakî da me şîretname nedîtin. Li alîyê din di edebîyata soranî da helbestvanên wek Ehmedî Korî Mukrîyanî, Êl Beg Caf û Hecî Qadirê Koyî di helbestên xwe da rêbaza didaktîk şopandine û şîretên xwe kirine.[31]

Di edebîyata kurmancî ya klasîk da berhemên ku bi rêjeyeka bilind şîretan dihûndirînin hatine nivîsandin. Hin mînakên şîretnameyên kurdî ev in:

- *Ehmedê Xanî, Nûbihara Biçûkan*[32]
- Mele Xelîlê Sêrtî, *Nehc'ul-Enam*[33]
- Cîgerxwîn, *Pendname*[34]
- Şêx Mûsayê Şêxanî, *Dîwançeya Şîretî*[35]
- Şêx Mûsayê Şêxanî *El-Kelamu'l-Wafî fî Ekami's-şûfî*[36]

---

[30]Bnr., Ertekin, **h.g.** r.62.

[31]Ji bo agahîyên berfireh bnr., Ertekin, **h.g.** r.69-71.

[32]Ehmedê Xanî, ***Nûbar***, Zeynelabidîn Zinar(Amd.), Weşanên Roja Nû, Stockholm 1986.

[33]Mele Xelîlê Sêrtî, ***Nehcu'l Enam***, Zeynelabidîn Kaya/Zinar(Amd.), Weşanxana Kurdistan, Stockholm 1988.

[34] Helbesteka Cîgerxwîn bi navê pendnameyê heye. Bo vê yekê ketîye nav lîsteya şîretnameyên kurdî. Bnr., Cîgerxwîn, ***Pendname***, Hawar, Weş. Nûdem, Clid II, hj. 52, 20 Kanûna Paşîn 1943, r. 1094.

[35]Destxet e û nusxeya Mele Seîd Erzen e, hêj çap nebûye**.** Di vê berhemê da rêjeya şîretê gelek zêde ye.

[36]Ev berhema Şêx Mûsa pexşan e û rêjeya şîretê zêde ye. Wek mînak li vir hatiye tomarkirin. Bnr: Şêx Mûsayê Mardînî, ***Mecmu'etu mîn Erbe'ete Kutub***, Weş. Nûbihar, Amadekar Mela Ebdisselamê Bêcirmanî, Stenbol,1433-2012; Wekî din bnr.,Ramazan Çetin, ***Şêx Musayê Şêxanî Gundikî û Berhemên Wî yên Menzûm(Metn û Lêkolîn),*** Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Çapnebûyî, Mêrdîn 2019.

- Şêx Mûsayê Şêxanî *El-Mewaîze'd-Dewawî li Men Yuhtacû île't-Tedawî*[37]
- Mele Husnî Hezîn, *Guldan*[38]
- Mele Husnî Hezîn, *Gulzar*[39]

Abdurrahman Adak di berhemeka xwe da cih daye çend mînakên şîretnameyên kurdî:[40]

- Mela Mihemedê Heldaî, *Tûbe'z-Zeman,*
- Mela Mihemed Şah el-Metmûrî, *Eqîdeya Îslamî û Mew'îzeya Hesene,*
- Mela Mihemed Nurî, *Nuzhetû'n-Nufûs fi'n-Nesaîh,*
- Şêx Hebîbê Qadî, *Tezkiyetu'n-Nufûs,*
- Mela Siraceddînê Xelîlî, *Gulbahar,*
- M.İbrahim Paresî, *Nasîhatu'l- Îhvan.*

Wekî din berhemeka pexşan a Zeynel Abidînê Arîkele bi navê *Şîretname*[41] heye û di vê berhemê da şîretên curbicur yên ku jîyana kesane û civakî ra têkildar in, tên pêşkêşkirin. Ev berhem çavkanîyên xwe ji zargotinê digre. M. Burhanê Hedbî wergera *Dîwana Şafiî*[42] bi navê ‘‘Pendên Şafiî’’çap kiriye. Elî Ebdullah Kolo gotinên pêşîyan berhev kiriye, li gorî mijaran dabeş kiriye û bi navê *Pendên Kurdî* berhema xwe çap kiriye. Dilazad Art jî di berhema xwe ya dîjîtal a bi navê Ramanên Azad da beşek bi navê *Şîretname*yê vekiriye û berhemeka pexşan çêkiriye. Wekî din xebateka Dilazad Art a bi navê *Pendname* jî heye û derbarê *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî da ye.[43]

Şîretnameyên kurdî divê di xebateka din da bi berfirehî bên vekolîn. Em vê babetê vêga li vir dihêlin.

---

**37**Orîjînala vê berhemê erebî ye. Wergera wê a kurdî hatiye kirin. Wek mînak hatiye tomarkirin. Bnr**:**Şêx Mûsayê Mardînî, ***Mecmu'etu mîn Erbe'ete Kutub,*** Amadekar: Mela Ebdisselamê Bêcirmanî ,Weş. Nûbihar, Stenbol, 1433-2012.

**38**Yakup Aykaç, ***Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng),*** Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar, Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî, Bîngol, 2015.

**39**Ji bo agahîyên berfireh **bnr**.; Doç. Dr. M. Zahir Ertekin Dr. Öğr. Üyesi Bedrettin Basuğuy ***Pend û Amojgarî Di Dîwana Ehmedê Xanî De***, Uluslararasi Ahmed-i Hani Sempozyumu; **https://www.agri.edu.tr/upload/anasayfa/2-uluslararasi-ahmedihani-sempozyumu.pdf**

**40**Abdurrahman Adak, ***Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî Ya Klasîk De***, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2019.

**41**Zeynel Abidînê Arîkele, ***Şîretname,*** Aram Yayınları, 2018.

**42**Muhammed b. Îdrîs, ***Dîwan***, th. Muhammed ‘Efîf ez-Ze'bî, Weşanxaneya Beyrûdê.

**43****https://dilazad.wordpress.com/kurdi-kurdish-kurtce-dilazad-a-r-t/ (08.07.2019)**

Di edebîyata kurmancî ya klasîk da me çar şîretnus tespît kirin. Di vê beşê da em dê kurtejiyana van çar helbestvanên kurmancî yên klasîk bidin.

## 1.3. JÎYAN Û BERHEMÊN HELBESTVANÊN KU BÛNE MIJARA VÊ XEBATÊ

### 1.3.1. FEQÎYÊ TEYRAN

#### 1.3.1.1. Jîyana Wî

Feqîyê Teyran di nav edebîyata kurdî da helbestvanekî navdar e. Navê wî yê rasteqîn Mihemed e, Feqîyê Teyran ji xwe ra wek mexles bi kar anîye û di nav kurdan da jî bi mexlesa xwe navdar bûye. Li Miksê di dawîya sedsala şazdeh û dora nîveka hivdehan da jîyaye. Miks hingê girêdayî Colemêrgê bû, lê vêga girêdayî bajarê Wanê ye. Feqî di sedsala şazdehem û hivdehem da jîyaye.

Li Miksê, Hîzan û Finikê xwendina medreseyê pêk anîye. Feqîyê Teyran, heya çûye ber rehma Xweda, li Miksê û li gundê Werezozê jîyaye. Gora wî li Werezozê ye û hêj vêga jî gelek meriv diçin serdana gora Feqîyê Teyran.[44]

Feqîyê Teyran û Melayê Cizîrî hevçerxê hev in. Hinek nivîskar Feqîyê Teyran wek xwendekarê Melayê Cizîrî bi xwe jî dipejrînin.[45]Mehmet Uzun jî Feqîyê Teyran wek xwendekar û şopînerê Mela dibîne û dipejrîne.[46]

Feqîyê Teyran di nav helbestvanên klasîk da yekî sereke ye û wekî piranîya helbestvanên kurd ên klasîk, alimekî Îslamê ye û di nav jîyana dînî da temenê borandîye.[47]

---

[44] Bnr., Sadînî, ***h.b***. r.54.
[45]Abdurrehman Durre, ***Evîna Welat***, Weşanxaneya Melsa, Stenbol 1992, r.27.
[46]Bnr., Mehmed Uzun, ***Destpêka Edebiyata Kurdî***, İthaki Yayınları, İstanbul 2011, r.12-13.
[47]Bnr., Hüseyin Koyuncu, ***Di Hin Dîwanên Kurdî De Bandora Tesewûfê***, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî Ziman û Wêjeya Kurdî (Teza çapnebûyî), Bîngol, 2014, r.36.

### 1.3.1.2. Berhemên Feqîyê Teyran

- ***Şêxê Sen'an***: Ev menzûme ji 363 bendan pêk tê. Di vê berhemê da şêxekî zahid, dibe evîndarê keçeka ermenî û bi sedema vê evînê mirîd, dergeh, welat û di dawîyê da jî dest ji dînê xwe berdide. Şivantîya berazên hezkirîya xwe dike û xaçê jî dixe stûyê xwe. Pişti demekê şêx hişyar dibe, bi hev ra dibin misilman û dimirin.
- ***Bersîsê Abid***: Ev menzûme ji 211 bendan[48] pêk tê. Mijara berhemê ev e ku Bersîs, abidekî cihû ye. Eşqa mecazî ew serxweş kiriye û ji eşqa heqîqî dûr xistiye.
- ***Zembilfiroş***: Ji 65 bendan pêk tê. Berhemeka evînî ye û çavkanîya xwe ji zargotina kurdî digire. Zembîlfiroş di wêjeya kurdî da çîrokeka navdar e, ji bilî Feqî hinek helbestvanên kurd ên din jî ev çîrok derbasî nivîsê kirine.
- ***Kela Dimdimê***: Li keleha Dimdimê di navbera kurdan û şahê Îranê da şerekî pir dijwar qewimîye. Ev berhem qiseta vî şerî dike. Ev menzûme ji 67 bendan pêk tê.
- ***Helbesten Curbicur***: Gelek helbestên Feqî yên ku bi mijarên cuda cuda hatine nivîsîn hene. Ev helbestên wî ji alîyê lêkolînerên kurd ve hatine komkirin û çapkirin. Di van helbestan de mijarên wek xweza, dildarî, şîn, teyr û hwd. hene. Helbestên wek ''Ey av û av'', Feqe û Bilbil'', Îro Werin Lêzim Werin'', ''Îro Ji Dest Husna Hebîb'' û hwd.[49] di vê kategorîyê da ne. Zimanê van helbestan gelek zelal û hêsan e.

### 1.3.1.3. Kesayetîya Wî ya Edebî, Ziman û Şêwaza Helbestên Wî

Feqîyê Teyran di berhemên xwe da dewlemendîya zimanê kurdî nîşan daye. Zimanê ku Feqî bi kar anîye zimanekî gelek zelal û hêsan e.[50] Tê dîtin ku ev yek ji bo Feqî nirx û cûdahîyek e, lewra wêjeya klasîk bi giştî xwedîyê zimanê pir giran e û ji bo fêmkirinê zanînekê dixwaze. Lê berhemên Feqî (hinek termên dînî-tesewifî ne tê da) ji alîyê her xwendevanî ve dikare bê fêmkirin. Zimanê helbesta Feqî hêsan e û motîfên gelêrî jî hûnandîye. Wekî gişên wêjevanên klasîk Feqî jî berhemên xwe bi mijar û peyvên dînî hunandine. Îbadet, pesnê pêxember, bîr û bawerî, tesewif,

---

[48]Yekeyeka nezmê ye û ji sê heya deh misrayan pêk tê. Derbarê yeke û teşeyên nezmê da bo agahîyên berfireh binêrin, Abdurrahman Adak, ***Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî Ya Klasîk De***, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2019.

**[49]**Adak, ***h.b.*** r.217.

[50]Feqî Huseyn Sağnıç, ***Dîroka Wêjeya Kurdî***, Weşanxaneya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, r.371.

şîretên olî û hwd. gelek mijarên dînî di berhemên Feqî da ciyê xwe girtine. Ji vî alîyî di navbera helbesta klasîk û gelêrî da wek pirekê dikare bê dîtin. Dema ku peyveka biyanî daye, pirê caran hemwateya wê ya kurdî jî nivîsandîye. [51]

Sotim bi **nar** û **agirî**[52]

**Zulmet**a **tarî** û kûr e[53]

Di edebîyata klasîk da piranîya helbestvanan di berhemên xwe da di şûna navê xwe yê rastîn da nasnavan bi kar anîn e. Feqî jî mexlesên wek “Mîm û Hê, Meksî, Feqî yan jî Feqîyê Teyran” bi kar anîne.[54]

## 1.3.2. EHMEDÊ XANÎ

### 1.3.2.1. Jîyana Wî

Ehmedê Xanî, di nava helbestvan û nivîskarên kurd da pir bi nav û deng e. Ev navdarî bi piranî ji berhema wî ya Mem û Zînê tê. Tê dîtin ku *Mem û Zîn* li her deverên welat belav bûye û tê nasîn.

Navê bavê Ehmedê Xanî, Îlyas e û Îlyas lawê Rostem Beg e. Rostem Beg, girêdayê eşîra "Xanî"ye. Ehmedê Xanî li Bazîdê, di sala 1650yan da jidayîk bûyê. Xanî, di sala 1706an da li Bazîdê çûye ber dilovanîya Xweda. Gora wî li nêzî kelheya Îshaq Paşa ye. Gelê Bazîdê û herêmê serdana gora wî dikin.[55]

"*Mem û Zîn*" a Xanî di nav gelê kurd da ji berhemekê zêdetir, girîngîya xwe heye. Tê dîtin ku *Mem û Zîn* ewqas di giyanê gel da cih girtîye ku ji biçûkan heya mezinan, ji alîyê hemû hemwelatîyan ve tê nasîn. Ehmedê Xanî bi jiyan û gotinên xwe bandoreka wisan li kurdan kiriye ku ji alîyê gelek kurdan ve wek ‘Xanîyê Nemir’ hatiye binavkirin û bi vî awayî girîngîya wî û hezkirina li wî derdikeve holê.

---

[51] Bnr., Adak, ***h.b.*** r.217.
[52] Sadînî, ***h.b.*** r.140.
[53] Sadînî, ***h.b***. r.142.
[54] Bnr., Sadînî, ***h.b***. r.19.
[55] Bnr., Durre, ***h.b***. r.10.

Ehmedê Xanî helbestvanê mîrektîya Bazîdê ye, lê *Mem û Zîn* ku berhemeka pir bi nav û deng e li ser çîrok û efsaneyên herêma Botan ava kiriye û bûyera *Mem û Zînê* jî herêma Cizîra Botan e.[56] Li Xelat, Bedlîs, Cizîr, Riha, Şam, Heleb û Bexdadê xwendina medreseyê kiriye. Li dewletên wek Misir û Îranê jî ji bo zanistê gerîya ye. Bi taybetî li xwendingehên Mezopotamya, Surîye û Îranê fêrî felsefeya Yewnan a kevnare, tesewif, zanista asîmanzanîyê, rê û rêbaza helbestê û teknîka hûnerî bû ye. Ehmedê Xanî li gelek herêman gerîya ye û hînî zanistên cihêreng bûye. Dawîya vê xwendin û hînbûna ilmê da vegerîya ye Bazîdê, medrese ava kiriye û di medreseyan da zarokên kurdan zanistên cuda cuda kiriye.[57]

### 1.3.2.2. Berhemên Ehmedê Xanî

Berhemên wî yên ku di destê me da hene û gihîştine roja me ev in:

- ***Nûbihara Biçûkan***: Ferhengeka kurdî-erebî û erebî-kurdî ye. Yekem ferhenga kurdî ye. Ji bo zarokên kurd ên ku li medreseyan perwerdeyê dibînin ra hatiye nivîsîn. Tê dîtin ku bandoreka pir mezin li gelê kurd kiriye û yê vê berhemê nebihîstibe dikare bê gotin, tune ye. ‘‘Nûbihara Biçûkan ji 13 beşan pêk tê. Tê de derdora 200 beyt û 1000 bêjeyî hene. Destpêk, beşa yekem û beşa dawî li gorî teşeya ‘‘mesnewî’’yê; beşên din li gorî teşeya ‘‘xezel’’ê hatine nivîsandin. Di berhemê da 7 heb behrên erûzê hatine xebitandin ku ew jî ev in: hezec, recez, remel, mudarî’, besît, serî’ û muteqarîb.’’[58]
- ***Eqîdeya Îmanê*:** Ji bo ku xwendekarên medreseyan ‘eqîdeya dînê Îslamê bi kurdî hîn bibin, hatiye nivîsîn. “Li gorî cudahîyên nusxeyan ji dora 70-73 beytan pêk tê. Bi teşeyê mesnewîyê hatiye nivîsîn. Di medreseyên kurdan da wek pirtûka fêrbûnê hatiye xwendin.’’[59]
- ***Mem û Zîn***: Bi teşeyê mesnewîyê hatiye nivîsîn û di warê mesnewîyên kurdî da ya herî pêşketî û bi rêk û pêk tê pejirandin. Di nav gelê kurd da gelek navdar e û hat dîtin ku pir

[56]Bnr.,Zülküf Ergün, ***Di Peydabûna Edebiyata Kurdî ya li Cizîra Botan de Karîgeriya Bajarvaniyê***, Teza Çapnebûyî, Mêrdîn 2012, r.6.
[57]Bnr., Koyuncu, ***h.b***. r.37.
[58]Adak, ***h.b.*** r.228.
[59]Yıldırım, ***h.b***., r. 25.

zêde tê hezkirin. ‘‘Ehmedê Xanî bi Mem û Zînê bandoreka mezin li yên pişt xwe, yên wekî Siwadî, Weda’î, Haci Qadirê Koyî û Şêx Ebdurrehmanê Axtepî kiriye.’’[60]

- ***Helbestên Wî*:** Ev berhem piştî wefata Ehmedê Xanî, bi rêya komkirina helbestên wî derketîye holê. Xanî ji bilî berhemên serbixwe, gelek helbestên curbicur jî nivîsîne, lê ev helbest di jîyana wî da nehatine çapkirin. Piştî wefata Xanî, ew helbest hatine komkirin, bi vî awayî jî ev berhem derketîye holê. Helbestên ku mijarên wan cihêreng in tê da hene û ev berhem taybetîyên wêjeya klasîk dihundirîne. Abdurrahman Durre[61] û Ebdullah M.Varli[62] li ser helbestên wî xebat kirine û bi navê Dîwana Ehmedê Xanî çap kirine.

### 1.3.2.3. Kesayetîya Wî ya Edebî, Ziman û Şêwaza Helbestên Wî

Ehmedê Xanî di berhemên xwe da pir caran cih daye peyv û têgihên erebî û farisî. Hin peyvên ku Xanî bi kar anîne di kurdîya îro da hatine ji bîr kirin an jî nayên zanîn. Giranîya dîn û tesewifê di berhemên wî da eşkere ye. Ev yek jî pir caran bi bikaranîna peyvên dînî xwe nîşan dide. Lê ji ber ku Xanî pevgirêdana peyv û mijarê bi serkeftî saz kiriye, ew giranîya ziman neketiye pêşîya berhemên wî. *Nûbihara Biçûkan* û *Eqîdeya Îmanê* ji ber ku bo fêrkirinê hatine nivîsîn, li gorî *Mem û Zîn* û *Dîwan*ê xwedî zimanekê zelal in. Di *Mem û Zîn*ê da giranî li ser mijara eşqê ye.

Ehmedê Xanî ji xeynî kurdî; erebî, farisî û tirkî jî dizanîbû û bi van zimanan gotinên wî jî hene, lê berhemên xwe bi kurdîya kurmancî nivîsîye.[63] Sedemê vê biryara xwe wiha anîye ziman:

Da xelqi nebêjitin ku Ekrad
Bê me'rîfet in, bê esl û bunyad

Enwa’ê milel xudankitêb in
Kurmanci tenê di bê hisêb in[64]

Ehmedê Xanî bi gotin û helwestên xwe piştî derbasbûna 300 salî li ser wefata xwe, hêj jî pir girîng tê pejirandin û li ser berhemên wî lêkolînên cihêreng tên kirin.[65] Ev yek jî girîngî û hêza

---

**60**Adak, ***h.b.*** r.230.
61Abdurrahman Durre, ***Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jîyana Wî,*** Weşanên Avesta, Stenbol 2002.
62Ebdullah M.Varlı, ***Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn***, Sîpan Yayınları, Stenbol 2004.
63Adak**, *h.b*.**,r.230.
64Şemrexî, ***h.b***.,r.41.
65Sağnıç**, *h.b*.**,r.394-401.

helbestvanîya Ehmedî Xanî nîşan dide. Xanî him di zanistên dinyewî him jî di yên uxrewî da kemilî bûbû û di berhemên xwe da li gelek cîyan cih dide ilmên ku dizane. Di felsefeyê da pêşketî bû. Bi kurtî Xanî, nivîskarekî piralî bû û di gelek beşan da pispor bû.

## 1.3.3. MELE XELÎLÊ SÊRTÎ

### 1.3.3.1. Jîyana Wî

Mele Xelîl Sêrtî helbestvanekî navdar e di nav gelê kurd da. Em dikarin bibêjin ku ev navdarîya wî ji berhema wî ya *Nehcu'l Enam*ê tê. Mela Xelîlê Sêrtî, li gundê Gulpika Hîzanê ku navçeya Bedlîsê ye di sala 1753an da hatiye dinyayê. Mele Xelîlê Sêrtî bi eslê xwe ji bajarê Hîzan a Bedlîsê ye. Bavê wî Mele Hesen e. Dersên pêşî ji bavê xwe girtîye. Li Bedlîs, Miks, Hîzan, Xoşab, Cizîr û Imadîyê di medreseyên kurdan da xwendîye û îcazeta xwe ya ilm li cem Mela Mehmûdê Behdînî standîye. Mela Xelîl pişt ra vegerîyaye Hîzanê û di medreseya Meyadanê da ders daye şagirdan. Pişt ra çûye Sêrtê û li navenda Sêrtê bi cih bûye. Mele Xelîl ji xwendinê pir hez dikir. Hem seydatî dikir hem jî ji seydayên mezin fêrî ilm dibû. (Li gorî raya gişti) di tesewifê de gihîştiye kemalê. Bûye miftîyê wê demê. Li gor rîwayetan gelek keramet nîşan daye. Di sala 1843yan da jî, li Sêrtê çûye ber rehma Xweda.[66]

Mele Xelîlê Sêrtî di nav jiyaneka tesewifî de maye, tê dîtin ku ilmê wî pir fireh e û di gelek mijaran da berhem dane. Di medreseyan de xwendîye û piştî îcazetê dersdarî jî kiriye. Demekê melatî jî kiriye. Bi jiyan û berhemên xwe gelek navdar bûye û ji alîyê ehlê medreseyan ve hatiye hezkirin.

### 1.3.3.2. Berhemên Mele Xelîlê Sêrtî

Mela Xelîlê Sêrtî di gelek cureyan da berhem dane. Wek mînak derbarê ilmên wekî Tecwîd, Serf û Nehw, Tefsîr, Eqaîd û Kelam, Hedîs, Belaxet, Fiqih, Mentiq, Tesewif û hwd. gelek berhemin dane. Mela Xelîl ji Hîzan a Bedlîsê ye, paşê li Sêrtê bi cih bûye û piştî hatina Sêrtê hatiye naskirin. Mele Xelîl kesayetekî ilmî ye ku gelek berhemên wî hene, bi jiyan û berhemên xwe tesîreke mezin

---

[66] Bnr.,Sağnıç, ***h.b***.,r.412-414.

li medreseyên kurdan kiriye. Mele Xelîl berhemên edebî jî dane ku ev berhem bi kurmancî û erebî hatine nivîsandin. Berhemên wî yên bi kurdî Nehcu'l-Enam û Rîsaleya Tecwîdê ye. Ji xeynî van berhemên menzûm helbestên wî yên bi erebî û kurmancî hene ku vê dawîyê hatine dîtin û heta niha wek destnivîs hatine parastin. Mexlesa Mela Xelîlê Sêrtî ya ku di helbestên xwe da bi kar anîye "Şewqî" ye.[67]

Berhemên wî yên bi kurdî ev in:

- ***Nehcu'l Enam*:** Berhemeka li ser mijarên dînî û exlaqî ye, bûye mijara lêkolîna vê xebatê, tê da mijarên curbicur hene. Berhem seranser bi mijarên dînî, exlaqî û dîdaktîk hatiye nivîsîn. Li medreseyên kurdan ji bo dersdarîyê û sûdgirtina xwendekaran, hatiye nivîsîn. Dikare bê gotin ku bi awayekî serkeftî gihiştîye armanca xwe û li gelek medreseyan hatiye xwendin. Ev berhem bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn, ji 22 beşan û 271 beytan pêk hatiye. Ji alîyê naverokê ve du beş in. Beşa yekem derheqê eqîdeyê de ye û 151 beytan pêk hatiye. Beşa duyem jî derheqê exlaq de ye û ji 120 beytan pêk hatiye. Xatîmeya wê jî ji 14 beytan pêk hatiye. [68]
- ***Menzûmeya Tecwîdê***: Di warê tecwîdê da hatiye nivîsîn. Tecwîd, rêzikên rastxwendin û xweşxwendina Qur'ana Pîroz pênase dike. Menzûmeya Tecwîdê bi zimanekê hêsan hatiye nivîsîn. ''Ji alîyê mijara xwe ve gelek girîng e, lewra di edebîyata kurdîya kurmancî da berhema yekem tê hesibandin. Ji 241 beytan pêk hatiye. ''[69]
- ***Helbesten wî***: Çar heb helbestên wî yên bi kurdî vê dawîyê hatine dîtin. Du heb medhîye ne, yek şîretnameyeka derbarê nefsê ye, yek jî munacatek e.[70]

Mele Xelîl gelek berhemên erebî jî nivîsandine:

- *El-Qâfiyetu"l-Kubrâ fî"n-Nahv*

---

[67]Ji bo agahîyên berfireh binêrin, Abdurrahman Adak, ***Mela Xelîlê Sêrtî: Helbestvanê bi Mexlesa Şewqî û Helbestên Wî Yên Kurdî(Kurmancî) Mukaddîme***, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, j.1, Mardin 2010, r.144-147.
[68] Adak***, h.b.,*** r. 299.
[69] Adak***, h.b***., r. 300.
[70] Adak***, h.b.,*** r. 301.

- *El-Qamûsu"s-Sânî fî" s-Serfi ve n-Nahvi" ve"l-Meânî*
- *El-Manzumetu"z-Zumrudiyye Nazmu Telxîsi"l-Miftâh*
- *Rîsâle fî"l-Mecâz we"l-Îstîâre*
- *Basîretu"l-Qulûb fî Kelâmî Allâmî"l-Xuyûb*
- *Kîtabun fî Usuli"l-Hedîs*
- *Zubdetu mâ fî Fetâva"l- Hedîs*
- *Tabakatu"r-rîcâl*
- *Mînhâcu"l-Wusûl îlâ Îlmî"l-Usûl*
- *Rîsâle Saxîre fî"l-ma Fuwwât*
- *Te"sisu Qevâidi"l-Eqâid âlâ mâ Senehe min Ehli"z-Zâhir we"l-Bâtin*
- *Mine"l-Awâid*
- *Muhtasaru Şerhi"s-Sudûr fî Şerhi"l-Mevti we Ehvâli"l-Qubûr*
- *Mulahhasu"l-Qewâti,, ve"z-Zewâcir fî mâ Tekellemû ala"s-Sexâir we"l-Kebâir*
- *Minhâcu"s-Sunnetî"s-Seniyye fî Adâbi Sulûkî"s-Sûfiyye*
- *Nebzetu Mevâhîbî"l-Ledunniyye fî"ş-Şatahâtî we"l-Wahdeti"z-Zâtiyye*
- *Rîsâle fî Menâqibî Şêx Ahmed*
- *Diyâu"l-Qelbî"l-Arûfi fî"t-Tecwîd ve"r-Resmî ve Ferşî"l-Xurûf*
- *Şerhu Manzûmetî"ş-Şâtibî fî"t-Tecwîd*
- *Şerhu Qasdetî"l-Hemziyye*
- *Kîtabu Ezhâri"l-Xusûn mîn Maqûlât-i Erbâbî"l-Funûn ve mâ lî"t-Tâlibîne fîhi Qarru"l-uyûn*
- *Mahsûlu"l-Mewâhîbî"l-Ahadiyye fî"l-Hasâîsî we"ş-Şemâili"l-Ahmediyye*
- *Manzûme fî Mewlidi"n-Nebi*
- *Rîsâle fî Îlmî"l-Mantiq*
- *Rîsâle fî"l-Wa"d*
- *El-Habiyye fî Îlmî Adâbî"l-Bahsî we"l-Munâzara* [71]

[71]Ji bo agahîyên berfireh binêrin, İbrahim Gözeten, ***Mele Xelîlê Sêrtî ve Nehcu'l-Enâm Adlı Eseri (Metin Ve İnceleme),*** Muş Alpaslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü (Teza Masterê Ya Çapnebûyî), Muş 2015. r.20-30; ***http://mollahalil.siirt.edu.tr/(04/12/2019)***; Nesim Sönmez, ***Tehlîla Nehcu'l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî***, Bingöl

### 1.3.3.3. Kesayetîya Wî ya Edebî, Ziman û Şêwaza Helbestên Wî

*Nehcu'l Enam* li gelek deverên ku kurd tê da dijîn belav bûye, li hin medreseyan bûye pirtûka dersê û hêj jî li gelek deveran tê xwendin. Gelek sedemên vê yekê hene, lê dikare bê gotin ku herikbarî û hêsanîya ziman du sedemên herî girîng in ku evqas navdar bûye û hatiye hezkirin. Li gelek cîyên berhemê şîretên cuda cuda hene û ev yek jî girîngî û cudahîyekê dide vê berhemê. Dikare bê gotin ku Mele Xelîl di berhemên xwe yên kurdî da zimanekî zelal bi kar anîye. ''Di helbestên xwe da navê xwe yê rastîn û mexlesek cuda jî bikaranîye. Ew mexles ''Şewqî'' ye. Wek ''Xelîl Şewqî'' jî hatiye naskirin.''[72]

## 1.3.4. SEYÎD ELÎYÊ FINDIKÎ

### 1.3.4.1. Jîyana Wî

Seyîd Elîyê Findikî helbestvanekî kurd ê klasîk e. Di qada wêjeya kurdî ya klasîk da helbestvanê dawîya sedsala nozdehem û sedsala bîstem e.

Li Findika Botan a ku girêdayî Sêrtê ye di sala 1890î da hatiye dinyayê. Kurê Seyîd Suleymanê kurê Seyîd Îbrahîm e. Malbata wan bi rêya şêx Evdilqadirê Geylanî digihîje Îmamê Hesen. Zarokatîya xwe li Findikê derbas kiriye. Ders ji feqîyan girtîye û ji Seyîd Evdirehman îcazet sitendîye. Paşê li gundê xwe melatî kiriye. Seyîd Elî di sala 1967an de li Cizîrê wefat kiriye.[73]

Seyîd Elî wekî piranîya wêjevanê kurd ên klasîk li medreseyan xwendîye û paşê dersdarî jî kiriye. Xwendekarê ku bawernameyê distîne, ders dide xwendekarê nû û bi vî awayî pergala perwerdeyê berdewam dike, heya dema me. Ev yek wek kevneşopek e li medreseyê kurdan. Bandora tesewifê eşkere ye di helbestên Seyîd Elî da û di van helbestan da jî gelek şîret hene.

---

Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi Yıl:4, Cilt:4, Sayı:7, Bingöl 2018/1, ss. 67-85; ***https://islamansiklopedisi.org.tr/molla-halil-siirdi (04/12/2019).***

[72]Adak, ***Mukaddîme***, jimar.1,r. 153.

[73] Dilovan, ***h.b***., r.7-9.

### 1.3.4.2. Berhemên Seyîd Elîyê Findikî

- ***Dîwan*****:** Dîwana Seyîd Elî ji bo edebîyata kurdî berhemeka gelek bi qîmet tê dîtin, zimanê wê hêsan e, di vê berhemê da gelek şîret hene û dilsozîya helbestvan di helbestan da eşkere ye. Dikare bê gotin ku ev taybetî, bûye sedem ku berhema Seyîd Elî ji alîyê gelek welatîyan ve bê naskirin û xwendin. Dîwana wî ji 52 helbestan pêk tê. 50 helbest bi kurdî, yek erebî û ya din jî farisî ye. Ev dîwan ji ber ku zewqeka edebî di xwe da dihewîne û zimanê wê kurdî ye, hêsan e û exlebî li ser meseleyên mirovahî yên ku her kesî têkildar dike sekinîye, ji aliyê gel ve gelek zêde hatiyexwendin.[74] Dîwana wî da ji alîyê teşeyê ve 31 xezel, 9 qesîde û 12 mesnewî hene.

Berhemên wî yên bi zimanê erebî ev in:

- *Def'u'ş-Şubuhât fi Nezmi't-Turrehât*
- *Hewâşi 'Elâ Tefsîri'l-Qadîel-Beydâwî*
- *Hewâşin 'Elâ Şerhi Dîwani'l-Cezerî*
- *Risâletu'l-Lem'e fil'âdetî'l-Cum'e*
- *Risâletun fi Necâti Ebeweyn'i-Nebî*
- *Risâletun fi Cewâzi Def'i'z-Zekâti Ilâ Benî Hâşim we'l-Mutelib*
- *Zûlfiqarû 'Elî fi Reqebeti Munkiri'l-Istimdâdî Mine'n-Nebîyyi ew Weliyyin.*[75]

### 1.3.4.3. Kesayetîya Wî ya Edebî, Ziman û Şêwaza Helbestên Wî

Seyîd Elîyê Findikî mirovekî zana bû, li medreseyan xwendibû û bi vê rêyê hînî zimanê erebî bûbû. Wekî din Seyîd Elî tirkî û farisî jî zanîbû. Hin têgihên dînî û tesewifî ne tê da, dîwana wî bi zimanekê gelek hêsan hatiye nivîsîn. Zimanekî zelal û herikbar di helbestên wî yên kurdî da berbiçav e. Di helbestên xwe da cih daye mijarên wek tesewif, dostanî, mirin, demborîya dinyayê, xurafeyên dînî, eşqa mecazî û îlahî, sebir, keda helal, kubarî û euretî û hwd. Di helbestên Seyîd Elî da tê dîtin ku ewî hunerên edebî yên wek teşbîh (şibandin), isti'âre, mecâza mursel, kinâye, te'rîz,

[74] Muhammed İkbal Deniz, ***Jîyana Seyîd 'Elîyê Findikî û Dîwana Wî***, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Edebîyata Kurdî, Teza Çapnebûyî, Çewlig 2017, r.21.
[75] İkbal, ***h.b.,*** r.19-21.

tenasub, telmîh, tezad, leff û neşr, istîfham, muqabele, alîterasyon û hwd. bi kar anîye. [76] Seyîd Elî wek mexles navê xwe yê eslî bi kar anîye. Mexlesên “Elî, Elî Findikî û carinan jî Seyîd Elî” bi kar anîye.

[76] Bnr., İkbal, ***h.b***., r.50-80.

# BEŞA DUYEM

## MIJARÊN ŞÎRETÊ DI EDEBÎYATA KURMANCÎ YA KLASÎK DA

### 2.1. DÎN Û TESEWIF

Dîn û tesewif du bingehên mezin ên wêjeya klasîk in. Di piranîya helbestên klasîk de ev yek kêm zêde eşkere dixweyê. Em dikarin bibêjin ku bandora dînî li ser her civatê, çi misilmanî be çi ne misilmanî be heye. Ev yek di edebîyata kurdî ya klasîk da jî berbiçav e. Helbestvanên klasîk di berhemên xwe da têgih û peyvên dînî û tesewifî bi dewlemendîyeka berbiçav bi kar anîne. Tesewif jî bingeha xwe ji dînê Îslamê, jîyana pêxemberan û sebabîyan digre. Ji ber ku mijara me ya bingehîn ne tesewif e, em dê bi kurtî qiseta tesewifê bikin û derbasî şîroveya beytên vê mijarê bikin.

Di nêrînekî da tê îfadekirin ku dema Hezretî Pêxember de komeka sehabîyan a bi navê "Ehlê Suffe" hebûne. Ew sihabeyên Hezretî Pêxember di çavîyên Mescîda Nebewî de dijîyan û tu xebatên bazirganîyê nedikirin. Ew bi tenê di rêya Xwedê de li pey îbadetan diçûn, sibe û êvarê li razîbûna Xwedê digerîyan û zikir dikirin. Ji ber vê yekê ji wan ra "sufî" hatiye gotin. Tesewûf, bi wan sihabeyan ra derketîye holê. Ehlê Suffe wekî mitesewifên paşê, bi felsefeyê ra hemdemnebûne.[77]

Di tesewifê da peyvên mecazî û têgihên tesewifî yên wekî eşq, aşiq, me'şûq, şerab, mehbûb, gul, yar, bilbil, mey, mecnûn, dil, dilber, cewr, cefa, evîn, serxweşbûn, mestbûn hwd. bi gelek caran tên bikaranîn. Tê dîtin ku bi van têgihan armanca mitesewifan gihîştina eşqa îlahî ye. Aşiq û

[77]Ji bo agahîyên berfireh binêrin, Dilaver Selvi, ***Kaynaklarıyla Tasavvuf***, Semerkand Yayınları, C.1, İstanbul 2001, r.5-30.

mutesewif bi rêya her tiştî dixwaze bigihê Xwedê û di eşqa Xwedê da bihele. Bêyî eşqa Xwedê, mutesewif wek mirîya ne û ew tenê dîsan bi eşqa Wî dikare bijîn.

Di helbestan da tê dîtin ku helbestvanên kurdî yên klasîk pêşniyaza rêya rast û şîreta zikrê Xweda di helbestên xwe da kirine. Şîreta rîayeta dînê Xweda kirine. Helbestvanên klasîk ên mutesewif her tim gazî mirovan dikin û pêşnîyaza evdîtîya Xweda li wan dikin. Li gorî wan divê mirov rê û rêça pêxember bernedin, ferman û qedexeyên dînê Îslamê bicih bikin. Dikare bê gotin piranîya helbestvanên klasîk yên kurd girêdayî teriqetekî ne. Ji bo vê yekê behsa şêx û murşîdê xwe û terîqeta xwe jî kirine. Tê dîtin ku di nav vê qisetkirinê da şîret jî kirine ku, gel ji rêyên ku ew tê da diçin ra bêpar nemînin, pesnê şêx û terîqeta xwe dane û xwestine meriv bibin pêgirtîyên terîqetê. Ev yek di piranîya helbestên ku me vekolîn kirine da dixweyên. Wekî din di beytên jêr da gelek şîretên dînî û tesewîfî hatine rêzkirin.

Di nav helbestên Feqîyê Teyran da 11 bendên dîdaktîk ên li ser dîn û tesewifê me dîtin (Bnr., r.105/6, 109/16, 109/18, 234/76, 235/77, 237/4, 239/2, 337/2, 338/4, 341/23, 449/3). Hin mînakên van şîretan di vê beşê da hatine şîrovekirin.

Helbestên Ehmedê Xanî da 31 gotinên li ser dîn û tesewifê hate tespîtkirin (Bnr., *Mem û Zîn* r.,15/1, 21/15, 26/1-4, 280/38-41, 288/20-21, 291/55-56, 293/72-75, 295/94-97, 298/21-22; *Dîwan* r.,110/10-11, 111/16-17, 118/1-2; *Nûbihar* r.,20/1). Hin mînak vê di beşê da hatine nivîsandin.

*Nehcu'l Enam* a Mele Xelîlê Sêrtî da 22 beş hene û ev berhem bi tevahî dîdaktîk e. Di deh beşên pêşî da bi tevahî mijar li ser dîn û tesewifê ye û şîretên dînî dihûndirînin (Bnr., *Nehcu'l Enam* beşa 1-10, 68 beyt). Wekî din di şeş beşên din da jî têr û tije ev mijar hatîye hûnandin (Bnr., *Nehcu'l Enam* beşa 13/14/15/16/17/18, 50 beyt). Tevahîya berhemê li ser mijarên dînî, tesewifî, exlaqî ye û seranser bi şîretan hatîye hûnandin. Hin mînak me li vir nivîsandine.

Helbestên Seyîd Elîyê Findikî da 61 beyt û bendên dîdaktîk yên bi dîn û tesewifê ra têkildar me tespît kirin (Bnr., r.,47/1,2,8,11, r.,63/21-22,33-34, r.,77/1-4, r.,95/14-15, r.,171/5-6, r.,185/1-4, r.,201-211/5-34, r., 253/20-21). Hin ji van şîretan me di vê beşê da nivîsandine.

Di şîretên dînî û tesewifî da Mele Xelîlê Sêrtî li pêş e.

### 2.1.1. Feqîyê Teyran

Tê dîtin ku dîn û tesewif stûnên mezin ên edebîyata klasîk in. Di helbestên klasîk da gelek zêde motîfên dînî tên berçavên me. Feqî di vir da hin nav û taybetîyên Xweda anîye ziman. Xwedê kerîm e; li erd û asîmanan her tişt îkrama Wî ye. Veşarî ye, lê li her deverî amade ye, her tiştî dibîne. Ew yek e û pêşîya Wî tune ye, çi bixwaze dikare bike û qeweta Wî heye bo her tiştî. Ew afirîner e, dê û bavê Wî tune ye. Feqî bi van gotinên xwe xwestîye ku Xweda bide naskirin.

Ew Mîr kerîm e, satir e
Xweş hakim e d’barê xwe da

Xelqno! Ne dûr e, hazir e
Ew wahid e û bê îbtîda

Her çî bikit ew qadir e
Ew xaliqê bê bab û da (Q 6, r.105)

Xwedê erd û asîman ji bo meriv û candaran çêkiriye û nîmetên bê sînor amade kiriye. Li gorî Feqî pêwist e ku meriv ji bo afirînerê xwe şikir bikin, pesnê wî bidin û perestineka qenc bikin. Perestina Xwedê li gorî dînê Îslamê, peywira meriv a herî mezin e. Di jêr da tê dîtin ku divê meriv hewl bide di rêya Xwedê da. ‘Evd divê ‘evdîtîya xwe pêk bîne. Lewra roja qiyametê ev ta’et dê kêrî meriv werin.

Hemd û sena heqq e li me
Bê hed û bê qiyas bikin

Zikr û îbadet lazim e
Cuhda terîqa ras bikin

Roja qiyamet qaîm e
Ta’etek pir esas bikin (Q 16, r.109)

Feqî anîyê zimên ku bêyî şêx, pîr û aliman ta’etên meriv li haşê diçin. Lewra ew, rêya rast nîşan didin û meriv di her warî da têdigihînin. Feqî dixwaze meriv ji murşîd û terîqetê bêpar nemînin. Wekî din li gorî Feqî mîr û hakim divê dilovanî li gel bikin û pêwistîyên gel pêk bînin; gel jî divê xizmetê ji wan ra bikin. Yekalî çênabe, divê her du alî jî peywirên xwe pêk bînin.

Xizmeta sultan û mîran
Sin'eta dana û zîran

Hûn mekin bê şêx û pîran
Guh bidin vê şîretê (Mur 2, r.337)

Mirwet ji mîr û hakiman
Xizmet ji qûl û xadiman

Bê şêx û pîr û 'aliman
Zayi' mekin hûn ta'etê (Mur 4, r.338)

### 2.1.2. Ehmedê Xanî

Navê Xweda li ku hebe, li gorî dînê Îslamê li wê derê xêr û bereket heye. Xanî di vê malikê da şîretê dike ku meriv di serê her karî da bi navê Xwedê dest pê bikin. Lewra di malikê da jî xuya ye ku ew karên bê navê Wî dest pê dikin; kêmbereket in, ne temam in û xêra wan tune ye.

Sernameyê name, namê Ellah
Bê namê wî natemam e wellah (M 1-1, r.15)

Di jîyana mirovan da gelek kar û bar û rewşên cuda cuda hene. Ji wan karan hinek nebaş hinek jî pir baş dixweyên. Lê encamên wan carinan serûbin dibin ango yên baş dixweyên nebaş dertên, yên nebaş jî baş encam didin. Xanî van yekan tîne ziman û dibêje; Xwedayê mezin perde kişandîye ser her tiştî û zanîna her merivî nagihê hemû razan. Xweda, zanîna karên veşarî nedaye her kesî, Wî bi tenê daye yên ku bo Wî bûne xizmetkar ango jîyana xwe ji bo Wî nezir kirine. Em dikarin bibêjin ku di şîroveya karûbar û bûyerên jiyanê da ev yek divê neyên ji bîrkirin û meriv divê bi aramî tevbigerin.

Şolin hene, zahiren xerab in
Fê'ilin hene, sûreten sewab in

Yek 'edl e, li sûretê cefayê
Yek qehr e, di kiswetê wefayê

Yê perdekeşê rumûzê hîkmet
Bê sirr nekir ew kunûzi qismet

Mexsûsi ewî da nedîmê nasan
Tewzî’i nekir li ‘amê nasan (M 57/38-41, r.280)

Di tesewifê da tê zanîn ku ew kesên ku dixwazin bigihên Xwedê, divê hin şert û merc û peywiran pêk bînin. Wefadarî yek ji wan şerta ye. Xweda ser rûyê erdê her tişt ji bo meriv û candarên din amade kiriye. Pêwist e ku meriv bêbext nebe, wefayê nîşan bide û şikra Xwedê bike. Wekî din li gorî Xanî ew kesê ku xwe di hebûna Xwedê da winda û tune neke, ew nagihîje Xwedê û jîyana ebedî bi dest naxe. Yên van şertan pêk bîne ku bimre jî mirin jê ra hebûn e, man e, hevdîtin e û guherandina fenayê bo beqayê ye.

Bê meşrebeyê wefayê şahî
Ew naçite meşreba îlahî

Fanî nebitin fenayê mutleq
Nabînitin ew beqayê bîlheq

Fanîtî ji bo wî ra beqa ye
Baqîtî ji bo wî ra liqa ye (M 59/73-75, r.293)

Xanî şîretên xwe didomîne û tîne ziman ku peywira meriv a pêşîn ew e divê bixebite ku Xwedayê xwe nas bike. Her çiqas meriv kêm û gunehkar be jî, ev yek divê armanca pêşîn be. Piştî ku meriv rebbê xwe nas kir, êdî pêwist e ku jê bitirsin ango ji tixûbên fermanên Wî derneyên û rêzdarîyeka resen nîşan bidin. Li alîyê din divê meriv dînê xwe ji zanayan û pisporan bipirse. Ev zanyar ku pisporên gihaştî bin, divê meriv li pey wan here. Temenê meriv divê di ta’et û lêkolînê da derbas bibe û heya mirinê ev rewş bidome. Bi vî awayî hêvî heye ku Xwedayê mezin meriv ji agir biparêze.

J’ewel ve Xudê bi heq binasîn
Herçende qusûr û kêm û kas în

Paşê bi dilê xwe jê bitirsîn
Dînê xwe ji ‘aliman bipirsîn

Çawa ku bibêjin em wesa bîn
Hetta ku ji rû dinyayê fena/wefa bîn

Pala xwe bideyne lutfê Barî
Belkî me bibexşitin ji narî (M 59/94-97, r.295)

Gelek tişt hene ku mirovan dixapînin, berê wan didin gunehan û karen kirêt. Xanî hişyarîyek dide û vegera ji wan xeletîyan dixwaze. Dixwaze ku meriv tewbe bikin, poşman bibin û dest ji karên neqenc berdin. Lewra ku meriv bimre êdî derîyê tewbeyê tê girtin. Li gorî Xanî hêj ew derî vekiriye divê meriv ji gunehan vegerin û tobe bikin.

Meşxûlî bes e bi le'b û lehwan
Tewba xwe bike j'xeta û sehwan

Carek were ser terîqê tewbe
Hindî negehiştiye te newbe (M 60/21-22, r.298)

Xanî di vê beytê da şîretek li şêx û sofîyan kiriye ku li gorî Xanî şêxîtî û sofîtî tenê bi gotin, şikl û bi cil û berg û şaşikên delal çênabe, emel û kirin pêwist e. Di serî da zanîn, xwendin, şarezatî û kirin pêwist e. Ku ev tune bin tu kes bila doza wan payeyan neke. Xilweta (tenê man) qenc, xwendin û fêrbûn e; terîqeta rast jî tenê şerîeta Xwedê ye.

Şeyx û sofîtî û keramet ilm xwendin û hem emel
Xilwet e hucre, terîqet e şerîet bêxelel. (M 7-1, r.20)

Pêgirtîbûna terîqetê di piranîya helbestvanên klasîk da tê dîtin. Xanî jî pêgirtîyê terîqetekî ye û dibêje ku ‘‘ Bi xêra neqşîbendîyan girêka destê min vebû û dilê min berfireh bû, înkîşaf kir.’’ Xanî xêr û bereketek ji terîqet û tesewifê dîtîye û vê yekê anîye ziman. Bi vî awayî di vir da pêşnîyazeka veşarî heye bo kesên din ku Xanî dixwaze bila herkes li pey murşîdekî here û tu kes bê rêber nemîne.

Me dî neqşek ji neqşê neqşibendan
Vebû bendê di min yek yek ji zendan

Guşada dil ji bo min ra muyesser
Nebû bê suhbeta sûretlewendan (X 5/1-2, r.118)

### 2.1.3. Mele Xelîlê Sêrtî

Mele Xelîl tîne ziman ku Xwedayê mezin ji nefsa meriv bixwe nêzîktirê evdê xwe ye û agahdarê her gotin û kirinên wan e, qet tiştek nayê veşartin, haya Xwedê ji her tiştî heye.

Ji nefsa te nêzîktirînê te ye
Xebîrê bi ef’al û qewlê te ye. (M 2-6, r.8)

Tê zanîn ku Xweda teala gava ji neteweyek an ji herêmekê ra dînê xwe dişîne yan jî nû dike, ew dînên berê yên li wir betal dibin. Mele Xelîl vê yekê anîye ziman û dibêje bi vê yekê xêr û fezîleta merivan zêdetir bûye. Wekî din li gorî Mele Xelîl Pêxemberê Îslamê ji bo meriv, cin û ferîşteyan jî pêşiwar û rêber e. Xwedayê mezin Wî hinartiye bo vê peywirê.

Bi Qur'anê xeyrê wê mensûxî bûn
Kemal û fedil bo me pê zêde bûn. . (M 3-5, r.9)

Muhemmed resûlê Xwedaye hinar
Ji bo ins û cin û melek pêşiwar.

Bi dînê wî dînê dî mensûxî bûn
Kemal û fedil bo me pê zêde bûn. (M 5/1-2, r.10)

Meriv carinan dema ku sucê xwe fêm dike, dixwaze wê xeletîyê li ser xwe rake. Ev yek bi mijara qederê ra têkildar e. Tê dîtin ku gelek caran meriv barê giran diavêjin ser qederê û xwe paqij dikin. Mele Xelîl îrade û vîna merivan tîne bîra meriv û tîne ziman ku kes nikare sucê xwe veşêre an ji ser xwe rake. Lewra Xweda vîn û îrade daye û meriv bi xwesteka xwe her karî pêk tîne.

Xweda xaliqê cumle fi'la te ye
Welê îxtiyarî bi destê te ye.

Ew e mubdi'ê fi'lê, kasib tu yî
Cezakarê fi'la ku talib bûyî. (M 13/1-2, r.16)

Di bawerîya Îslamê da tê zanîn ku ehlê qible ango qewmên ku ji wan re pirtûk hatine, heya ku ji wan înkara Xweda xuya nebû divê meriv tawana kufrê li wan neke û ji wan re nebêje kafir. Li aliyê din mijara le'netê gelek caran tê pêşiya her kesî. Mele Xelîl li ser van rawestîyaye û şîreta le'neta giştî kiriye. Lewra yê ku le'net lê tê kirin miribe an jî wê le'netê heq neke ev yek dibe guneh. Li gorî Mele Xelîl ku le’net bê kirin divê le'neta bênavdayî û bi awayekî gelemperî bê kirin.

Welê ehlê qiblê tu kafir mezan,
Serîhî ku kufrê nebînî ji wan. (M 16-6, r.21)

Mu'eyyen li kes le’netê tu meke,
Li ehlê 'ezabê 'umûmen bike! (M 16-11, r.22)

Gelek caran mijarên dîrokî tên nîqaşkirin û kesayetên dîrokî tên rexnekirin. Dema ev rexne tên kirin, şert û mercên wan deman gelek caran nayên berçav. Ev buyerên ku bûne û di ser de çend sedsal an hezar sal bihurîne, tê dîtin ku bê feyde ye li ser wan nîqaş bên kirin û mejî û hiş pê bên mijûlkirin. Mele Xelîl tîne ziman ku ew kesên li ser wan nîqaş tên kirin sehabayên pêxember bin, divê meriv baldar be û haj ji gotinên xwe hebe.

Ji herba sehaban mekin qal û qîl
Bihiştîne hem qatil û hem qetîl. (M 9-14, r.14)

Li gorî Mele Xelîl, Xwedê aqil û fikr daye merivan. Ev aqil û fikr, meriv û ajalan ji hev vediqetîne. Li aliyê din Xwedê gelek xurek û vexurekên cuda cuda ji bo jîyana merivan daye. Divê

mirov wekî heywanan nebe û spasîya Xwedayê xwe bike, Rebbê xwe bihizire, zikra Wî bike û her tim Wî bibîr bîne ji bo van nîmetan.

Tesewwur di vê 'alemê de bike,
Bi dil-can tu xellaqê wê nas bike. (M 17-26, r.24)

Ji fikrê li zikrê xwe xafil meke,
Ricayê li xewfê ji wî her bike. .(M 17-28, r.24)

Xwedê ev te'amê di xweş dane te,
Digel av û fêkî, libasê li te!  . (M 20-1, r.31)

Tu, bêşukrî manendê heywan mexwe!
We bê mulheza wî tu tiştek mexwe!  (M 20-2, r.31)

Mele Xelîl bi vê malika xwe rehma Xwedê ya bêsînor tîne ziman û merivên ku hêvîşikestî ne hişyar dike. Li gorî wî di Îslamîyetê da bêhêvîbûn nayê pejirandin û wek rewşeka ne baş tê dîtin.

Eger ew ji rehma wî bêhêviye
Bibêje ku "rehma Xwedê hed niye"   (M 17-41, r.26)

## 2.1.4. Seyîd Elîyê Findikî

Di wêjeya kurdî ya klasîk da têgihên dînî û tesewifî gelek caran tên pêşîya me. Nunerên wêjeya kurdî bi rêjeyeka bilind pêgirtîyên terîqetan bûn û di atmosfera tesewifê da jiyabûn. Vê yekê bandorek mezin li helbesta wan kiriye. Seyîd Elî bi van beytên xwe vexwendina pêgirtîbûna terîqet û murşîdekê dike. Li gorî wî bêyî terîqet û murşîd, ne gengaz e ku meriv bi serê xwe bigihê rastî û xelasîyê, terîqet û murşîd ji bo axretê pir hewce ye. Li gorî wî gelek mirov bi tevahî nikarin rastî û çewtîyan ji hev veqetînin. Bo vê yekê rêberek pêwist e. Seyîd Elî vî rêberî wek murşîd û terîqetê bi nav dike. Li gorî wî yên biçin li bal murşîd û bibin tabi’ê wî dê bigihên rizgarî û dilşadîyê.

Heçî mehsûbê seyda bî
Dikim hêvî ku dilşa bî
Qiyamet ku li me rabî
Xilas bit ew bi yek carî (X 4-12, r.45)

Bizan bê seyda qet nabî
Ji ber xwe keskî çênabî
Bila sed carî xwenda bî
Xudadar î çi xemdar î (X 5-11, r.51)

Vê şîretê li guhê xwe kin
Xwe ji axretê mehrûm nekin
Zadê rêya xwe peyda kin
Da hûn nebên weyla li minê

Teqwa ye zadê rê bizan
Ne beqlewat û nan û man
Peyda ye ew nik murşidan
Baş guh bidin vê gotinê (X 9/3-4, r.77)

Ê ku bêjî ez bi xwe bighim Xwedê bê murşidî
Ev xiyala wî mehal e pur mehal e pur mehal (X 11-15, r.95)

Li gorî Seyîd Elî bi pesindanê naçe serî, kirin û bicihkirina peywirên dînê Îslamê hewce ye ji misilmanekî ra. Ew kesên ji xwe ra dibêjin misilman, divê misilmanîya xwe di kirinên xwe da nîşan bidin. Tenê dev na, fiîlîyat jî pêwist e. Pêwist e ku durûtî ji wî misilmanî dûr be. Nimêj, rojî, dilovanî, ‘edalet û hwd.  hemû taybetîyên misilmanîyê li dor wî kom bibin.

Musulmanî bi dev nabê
Bi hirt û hirtê çênabê
Bibêj ew kes bila şabê
Ku safî bî ji riyayê (X 3-11, r.37)

Li gorî Seyîd Elî jîyana vê dinyayê jiyanek xapînok e, meriv gelek caran bi delalîyên wê dixape. Mal, milk, pere û lezzetên dinyayê yên din merivan dixapînin. Meriv dikeve nav guneh û tevgerên çewt. Seyîd Elî gazîkirina tewbeyê û vegera ji karên xelet dike. Bi vê bendê hişyarîyekê dide û şîreta hişyarbûna li ber xapandinên vê dinyayê dike.

Tewbe bikin gelkî biran
Ji guneh û zenbên giran
Qet guh nedin mulk û peran
Hem lezzet û malê dinyayê    (X 9-1, r.77)

Seyîd Elî şîretên jêr li nunerên Îslamî kiriye, lê em dikarin bibêjin ku para her kesên ku misilman in tê da heye. Li gorî Seyîd Elî; mele, şêx, seyda berîya her tiştî divê rast bin, tu carî derewan nekin, kesî nexapînin, hîleyan li tu kesî nekin, malên tu kesî bi heramî nexwin û dînê Xwedê bi tu awayî nekin navgînê maldarî û bidestxistina berjewendîyên xwe. Gava mele, seyda yan jî şêxek dîn kire navgîn bo berjewendîyên xwe; ew karê dike ne rast e û jê ra ceza heye.

Wekî din li gorî Seyîd Elî, peywirên meleyan pir mezin û girîng in. Nunerên dînî divê ji hev ra rêzdar bin, hev sivik nekin di nav civatê da, bi tevgerên xwe rûmeta dîn neşkînin, dilan bi hev şêrîn bikin û hwd.  çi tiştên xweş û qenc hene divê bi cih bikin. Lewra, mirovên nezan li gorî rewşa wan tevdigerin, ji vî alîyî ve barê wan pir giran e.

Helbestvan şîretên xwe didomîne û dibêje ‘‘Mela divê xwedî ilm û teqwa bin, di mijara heram û helalê da pir hişyar bin, pozbilindî û çavnebarî li bal xwe nehêlin. Wekî din mela divê ji kesî minetê hilnegrin. Lewra minet nahêle ku rastî derbikevin holê û jixwe xwedîyê minetê jî dixwaze li gorî xwe her mijarê bide pejirandin. Li gorî wî ev yek birînek mezin e di teblîx û danezana Îslamê da. Mela, seyda û şêx her tim divê ji Xwedê ra amade û xizmetkar bin, di belavkirina fermanên Xwedê da ji kesekê netirsin, heq bizanibin û her tim heq bibêjin.’’

Belê lazim ji dîn ra bibne rêzan
Nexun malê musulmana bi heyalî
Wezîfa xwe nekî rast û durustî
Bila kî bît dibit ew kes cezalî          (Q 7-33, r.65)

Şeyx û mela ku ha bibin
Cem hev sivik û eybdar bibin
Cahil dê bê hefsar bibin
Guneh stuwê şeyx û mela (Q 28-7, r.201)

Hûn in şivanê ummetê
Ku hûn bi xwe xwehr kin xetê
Cahil dê çêkin hêcetê
Ji pey we bibin tert û bela (Q 28-8, r.201)

Qelba bi hev şîrîn bikin
Bendê bi şeytên ra bikin
Dînê mubîn keskîn bikin
Ev e heqê şeyx û mela (Q 28-9, r.201)

Her kî melayê ku we bê
Ilm û emel teqwa hebê
Kibr û hesed cem wî nebê
Pîroz bî lê rutba mela (Q 28-27, r.209)

Minnet ji kes hilnagirin
Daîm ji Xuda ra hadir in
Safî ji wî ra ew hur in
Gerçi bibit hewlul-wela (Q 28-32, r.211)

Çepera dîn girtibû pakî ji keskî nedikir
Heq dizanî heq digot û heq dikir her dem we bî (X 32-3, r.227)

Derbarê vê mijarê da ayetên Quranê gelek in. Me hin mînak li vê derê tomar kirin:

Tu bibêje: "Perwedekarê min edalet emir kiriye. Her ku hûn çûne secdeyê berê xwe bidin wî, tenê wî bihebînin û dîn tenê bikin yê wî. Ji serê ewil da wî çawa hûn afirandine, wisa jî piştî mirinê hûnê dîsa lê vegerin."[78]

Îbrahîm ev wesîyet li zaroyên xwe kir, Yaqûb jî: "Lawên min! Bêguman, Ellah dînê Îslamê ji bo we hilbijartîye, nexwe hûn jî li serê bijîn û li serê bimrin."[79]

Bêguman, dînê heq û meqbûl li cem Ellah tenê Îslam e. Ên kitêb ji wan ra hatine dayîn jî tenê piştî ku zanîn ji wan ra hat, ji dexesî û çavnebarîya xwe ketin îxtilafê. Kî ayetên Ellah înkar bike, bêguman Ellah wê hesabê wan pir zû bibîne.[80]

Derheqê vê mijarê da gotinên pêşîyan jî hene, hin mînak:

- Bawerîya nezanan, xewrojk û xûrafe ne.[81]
- Kesê Xwedê nasneke, xwe jî nas nake.[82]
- Bawerkirin, çêtir e ji hezkirinê.[83]
- Dîndarî ji tirsa mirinê ye.[84]
- Dîn bawerî ye, ne zordarî ye.[85]

## 2.2. FANÎBÛNA DINYAYÊ

Dema mirov li berhemên klasîk dinêre, tê dîtin ku helbestvanên klasîk ên kurd qet qîmet nedane dinyayê. Ji ber ku ev dinya demkî ye, ew kesên li pey vê jiyanê diçin her tim hatine şermezar kirin. Bi vî awayî hat dîtin ku qîmetnedana cîhanê ciyekî taybet digre di berhemên kurdî yên klasîk da. Peyva fanî, wateya’’Tişta dawî lê tê û dewama wê tune ye.’’[86] dihundirîne.

---

78 Sûreyê E'raf/29.
79 Sûreyê Beqere/132.
80 Sûreyê Alî Îmran/19
81 Ebdulah Celan, ***4250 Gotinên Pêşiyan***, Weşanxaneya Pencînar, Stockholm 2017, r.24.
82 Celan**, h.b.,**r.99.
83 Celan**, h.b.,**r.24.
84 Celan**, h.b.,**r.58.
85 Celan**, h.b.,**r.58.
86 Sami, ***Kâmûs-ı Türkî***, Çağrı Yayınları., İstanbul 1992, r. 980.

Li gorî bawerîya Îslamê dinya wek sîyê ye û ne warekî rasteqîn e. Bi giştî em dikarin bibêjin ku di Îslamê da fanîbûn wek wesfê dinyayê derdikeve pêşîya me. Em dikarin bibêjin ku hemû zanyarên misilman di berhemên xwe da cih dane vê yekê û qiseta demkîbûna dinyayê kirine. Her wiha li jêr dê bê dîtin ku edebîyatvan û zanyarên kurd jî bêpar nemane û di berhemên xwe da cih dane fanîbûna cihanê.

Li gorî bawerîya Îslamê tê dîtin û pejirandin ku ev dinya ji kesî ra nema ye û namîne jî. Çi evdê Xweda yê meqbul û çi evdê wî yê îsyankar be jî qet ferq nake, hemû mirov dê bimrin û tehma fenayê dê bimijin. Ev dinya çiqas fanî be ewqas jî xapîner e, tê dîtin ku mirovan bi xwe ra girê dide û hişê mirov ji serê mirov dibe. Li alîyê din li gorî bawerîya Îslamê cihaneka bêdawî û baqî heye. Dîsa jî tê dîtin ku piranîya mirovan cîhana bêdawî berdidin û bi hemû hestên xwe ji vê dinyayê ra dixebitin. Ji ber vê yekê, di mînakên jêr da jî dê were dîtin ku helbestvanên klasîk li ser vê mijarê hûr û kûr bûne, mirovan hişyar kirine, vê dinyaya demkî li ber çavan reş kirine û xerabîya wê nîşan dane. Di vê mijarê da jî çavkanîya herî mezin Qurana Pîroz e ji helbestvanên klasîk ra.

Li gorî ku me dîtîye 25 bendan da Feqîyê Teyran li ser vê mijarê rawestîya ye û fanîbûna dinê hûnandîye(Bnr., r.,138/4-6, 141/10, 145/24, helbesta Dilo Rabe r.,203-236, beytên 22,23,25,36,37,38,42,49,50,51,52,53,54,55,56,57,58,61,62,68). Me hin mînak li vir tomar kirine.

Ehmedê Xanî helbestên xwe da bi 10 beyt û bendan fanîbûna dinyayê anîye ziman û armanca hînkirinê daye pêşîya xwe (Bnr., *Mem û Zîn* r., 197-198/25-31, 257-258/74-75; *Dîwan* 134/30,33, *Nûbihar* r.,25/1). Hin mînak li vir hatine nivîsandin.

Mele Xelîlê Sêrtî bi 4 beytan li ser vê mijarê sekinîye (Bnr., *Nehcu'l Enam* beşa Mebhes-ul Melaîketî r.,10/6, beşa Mebhesu-l Sûal-îl Qebr r., 18/4-5, beşa Mebhesu-l Tesewwûfî Wel Exlaqî r.,22/45). Hin mînak me di vê xebatê da tomar kirine.

Seyîd Elîyê Findikî li 42 cîyan têr û tije li ser vê mijarê rawestîya ye (Bnr., r.,17/2-4, r.,18/9, r.,21/11-16, r.,25/2-3,5, r.,29/11-12, r.,79/6-10, r.,105/1, 133/7, r.,139/20, 141/22, 213/1-8, r.,217-218/1-6, r.,247/1-4). Wek mînak hin gotinên wî me li vir nivîsandine.

Di vê beşê da Seyîd Elîyê Findikî bi awayekî eşkere li pêş e.

### 2.2.1. Feqîyê Teyran

Feqî fanîbûna dinyayê û candaran anîye ziman û hişyarîyê dide hemû mirovahîyê. Li gorî wî, jiyan bi dawî ye li vê dinyayê. Ji bo her kesî demek hatiye dîyarkirin û gava ew dem tê, jiyan diqede. Ev jiyan emanet e li merivan û xwedîyê emanetê kengê bixwaze wê distîne. Li ser rûyê erdê her tişt dê helak û tine bibe. Dildar, nazik, baş û xirab, delal û kirêt û hwd. tu cudahî nayê kirin û hemû bûnewer dê ji erd û asîmanan werin tinekirin, wekî din erd û asîman jî dê bên guhertin, tenê Xwedayê erd û asîmanan dê bimîne.

Heta heyîn em maîl în
Hişyar bibîn ey xafilîn
Em ji heyatê dest hilîn
Ji we‘deya emanetê (Mur 4, r.138)

Nazik û mehbûb ciwanik
Qamet û bejna ziravik
“Kullu şey’în” dê bin halik
Ji xeyrî Şahê Qudretê (Mur 10, r.141)

Di bendên jêr da tê dîtin ku li gorî Feqî tu kes li vê dinyayê namîne. Yên têk dibin û têk diçin, yên daxwazkar û daxwazkirî, mirovên xwedantext û pozbilind, yên Xwedênas û Xwedênenas û hwd. ev jiyan jî kesî ra nemaye û namîne. Li gorî bawerîya Îslamê jî piştî ku jîyana vê dinyayê qedîya, dê her kes hisabê tevgerên xwe bide, mezlûm dê heqê xwe ji zaliman bistînin û bi vî awayî her meriv dê bigihê mafê xwe.

Ne xalib ma, ne mexlûb ma
Ne talib ma, ne metlûb ma
Ne ewladê di Ye‘qûb ma
Kefa behrê Yûsif xare (Mur 57, r.227)

Ne xwundkarê xûdantext man
Ne kubbarê xûdanbext man
Ne kuffarê xûdansext man
Tu yî Îsa ku neyhar e (Mur 62, r.229)

### 2.2.2. Ehmedê Xanî

Ev cîhan û jîyana dinyayê demkî ye, zû diqede. Meriv li vê jîyana fanî evîndarê gelek tiştan dibe, yek ji wan jî malê dinyayê ye. Komkirina mal dijwar e, dema ku ji mîratgiran ra dimîne jî pir caran talan dibe. Xanî vê yekê dide berçav û hişyarîyê dide merivan. Li aliyê din ew kesên ku ji pereyan pir hez dikin, di nav civatê da nayên hezkirin û navên wan jî dilewite. Roja ku meriv biçin ber destê Xweda di destan da tu mal û mulkê dinyayê dê tune be. Li gorî Xanî ji bo vê yekê pêwist e ku meriv dest ji dildarîya malê dinyayê berde. Lewra ev jiyan demkî ye û her gav gengaz e ku biqede.

Malî mehebîn tu ey nikûnam
Hubba wî diket mirovî bednam

Zînhari mebe li malî haris
Lew ra ku diben ji dest te waris

Cem'a wî ji bo te bar û zehmet
Terka wî ji bo te narê hesret
Roja biçî pêşedestê Barî
Destê te ji genc û mali ‘arî (M 41/25-28, r.197)

Di vê beyta Xanî da tê dîtin kesên ku hezkirina dinyayê ji dilê xwe diavêje û xwe jê dûr dixe, ew kes di nav civatê da dibe xwedîyê gotina bi qîmet û payebilindîyê. Dîsa tê fêmkirin ku hezkirina dinyayê astengê gelek rûdanên erênî ye. Meriv, ji hezkerên dinyayê hez nakin û girîngîya wan roj bi roj kêm dibe.

Herçî ku ji dunyaê berdeişte damen bû
Bê şubhe di nêv amê evreişte gerden bû (M 9-1, r.25)

Xanî derbarê demborî û fanîbûna dinyayê da gotinên xwe didomîne û tîne ziman ku ‘‘Dinya demkî ye û jîyana vê dinyayê bi mirin e. Dewlemendîyên vê dinyayê naçe axretê û mirovek çiqas payebilind be jî nikare ji destê mirinê bifilite.’’ Xanî dixwaze ku meriv van rastîyan tu carî ji bîr nekin û li gorî wê tevbigerin.

Dinya diborîtin bi dor
‘Umrê ‘ezîz nadin bi zor
Dewlet dibên naçîte gor
Kan Padîşahê Serhedan? (Mur 7-33, r.134)

## 2.2.3. Mele Xelîlê Sêrtî

Ev jiyan jiyaneka demkî ye û pir zû diqede, ji dest diçe. Mele Xelîl li gorî vê rastîyê anîye ziman ku divê ne heqên Xwedê (nimêj, rojî, zekat hwd. ), ne jî heqên evdan li ser meriv bimînin. Li gorî dînê Îslamê gava mirin qewimî, êdî meriv bixwazin jî nikarin peywirên xwe pêk bînin, lewra azmûna meriv diqede û hisab dê dest pê bike.

Edake heçî ku li ser te hebî
Çi heqqê Xwedê bit çi yê ademî. (M 17-45, r.26)

## 2.2.4. Seyîd Elîyê Findikî

Demkîbûna dinyayê dîwana Seyîd Elî da pir caran hatiye nivîsandin, li vir du bend wek mînak hatine tomarkirin. Li gorî wî çi belengaz çi dewlemend, çi şêx çi axa, tu cudahî tune û kes nikare xwe ji mirinê xelas bike. Kesê ku li pey vî warê demkî here, li gorî Findikî ew kes dîn e û aqil avêtîye. Lewra jiyan jî, ev cîhan jî demkî û demborî ye.

Di dinyayê heçî rabe
Feqîr û şêx û axa be

Ji ber mirnê xilas nabe
Di şerq û hem di xerbê da (Q 1-9, r.19)

Dinê mulkê kesî nîn e
Çiqa bêbext û xayîn e
Kesê goh bidyê ew dîn e
Xwe hinde bernede tê da (Q 1-15, r.21)

Derbarê vê mijarê da me hin ayetên Quranê wek mînak li vir tomar kirin:

Bêguman rewşa jîyana dinyayê bes weke baranekê ye ku me li esmên barandîye. Vêca bi wê avê giyayên ser erde (rengereng) ji yên ku mirov û heywan ji wan dixwin têkilî nav hev bûn. Heta dema ku erd xişrê xwe digire (û reng bi reng) dixemile. Xwedîyê wê jî hizir dikin ku ew dikarin berên xwe biçinin û sûdê jê wergirin. (Hingê) fermana me bi şev yan jî bi roj bi ser da hat, vêca me wekî zevîya dirutî (çinandî) lêkir, her wekî ku duh ew şînkahî tune bû. Ha bi vî rengî ji bo yên ku difikirin, em ayetên xwe bi berfirehî tînin.[87]

Bêguman çi tiştê li ser erdê heye me ji (erdê) ra kiriye xeml û xweşkayî da ku em însên pê bicerbînin; ka kî ji wan bêhtir kar û kiryarên qenc dike. [88]

Ev jîyana cîhanê tenê kêf û lîstik e. Herçi ku mala axretê ye, ew jîyana rasteqînê ye, xwezî wan ev bizanîya.[89]

Her candar wê mirinê tehm bike. Bêguman, roja qiyametê wê mukafata we bê kêmasî ji we re bên dayîn. Kesê ji agir bê dûrxistin û têkeve cenetê, ew rizgar bûye. Jixwe, jîyana vê dinyayê ji mal û meta'ê xapandinê pêve ne tiştekî din e.[90]

Me hin gotinên pêşîyan ku derbarê vê mijarê da ne li vir tomar kirin:

---

[87]Yunis /24.
[88]Kehf /7.
[89]Enkebût /64.
[90]Ali Îmran /185.

- Dinya gulek e, bêhn bike û bide hevalên xwe.[91]
- Dinya xan e, mirov bazirgan e.[92]
- Kî bête dinê, wê vexwe şerbeta mirinê.[93]
- Mirin kerê beqqalan e, li ber derê her malan e.[94]

## 2.3. DUA

Em dikarin bibêjin ku dua, ji Xweda daxwazek e. Evd ji bo hemû pêwistîyan berê xwe dide rebbê xwe û jê dixwaze. Tê dîtin li dinyayê gelek tişt hene ku evd bi wan nikare, ji bo vê yekê jî alikarîyê ji Xweda dixwaze. Li alîyên din mirov ji ber ku evdê Xweda ne, Xweda ji mirovan îbadetê dixwaze û dûrketina ji gunêhan ferman dike. Lê tê dîtin ku mirov pir caran vê yekê li cih nayne û dikeve gunehan. Di vê hengameyê da evd ji Xwedayê xwe bexşandinê dixwaze. Navê vê xwestina alîkarî û bexşandinê jî dua ye.[95]

Wekî din dema ku meriv li helbestvanên wêjeya klasîk yên kurd dinêre, bandora tesewifê pir eşkere dixweyê û bi giştî jî merivên mitesewif in. Ji ber vê yekê bandor û nexşên duayê di helbestên wan da berbiçav e.

Di berhemên kurdî yên klasîk da gelek dua hene. Xwedîyê berheman dua kirine û ji Xweda daxwazên xwe xwestine. Di vê beşê da armanca me ne ew e ku em duayên helbestvanên klasîk yên di helbestên xwe de kirine, pêşkêş bikin. Berevajî di helbestên kurdî da helbestvanên kurd daxwaz û şîret li xwendevanan kirine ku dest ji duayê bernedin û her tim di bin sîya hêza duayê da bimînin. Em dê van beytên ku şîreta duakirinê dihundirînin, pêşkêş bikin.

Feqîyê Teyran bi 30 bendan qiseta vê mijarê kiriye (Bnr., r.,429-434/1-26, r.,458-459/9-12). Lê divê ev yek bê gotin ku piranîya van duayên Feqî duayên normal in û Feqî ji Xweda daxwazên xwe xwestine. Rasterast armanca hînkirinê tune ye. Meriv dikare ji duayên Feqî rêya

---

[91] Celan, **h.b**., r.56.
[92] Celan**, h.b.,** r.57.
[93] Celan, **h.b**., r.107.
[94] Celan**, h.b**., r.127.
[95] Ji bo agahîyên berfireh binêrin, Süleyman Uludağ, ***Dua, TDV İslam Ansiklopedisi***, C 9., İstanbul 1994, r.530-535.

duakirinê hîn bibe û dua çawa tê kirin bibîne. Ji ber vê yekê hin duayên Feqî me di vê beşê da wek mînak tomar kirine.

Ehmedê Xanî 2 gotinên xwe ev mijar anîye ziman (Bnr.,*Mem û Zîn* 294/88; *Dîwan* 135/34). Ev her du mînak jî me di vê xebatê da tomar kirine.

Mele Xelîlê Sêrtî bi 5 beytan şîreta duakirinê kiriye (Bnr., Mebhesu Tesîr-îl Duaî r.,15/1-2, Mebhesu-l Tesewwûfî Wel Exlaqî r.,26/42, Mebhesu Adab-îl Eklî r.,31-32/9,12). Çend mînak me di vê beşê da tomar kiriye.

Helbestên Seyîd Elîyê Findikî da ev mijar li çar cihan derket pêşîya me (Bnr., r.,111/9, 155/22, 165/3, 197/18). Me van duayan di vê beşê da nivîsandine.

Di beşa duayê da Mele Xelîlê Sêrtî li pêş e.

### 2.3.1. Feqîyê Teyran

Her çiqas rasterast ne şîret bin jî, tê dîtin ku Feqî di helbestên xwe da cih daye duayê, ji nefsa xwe ra dua kiriye û bi vî awayî dikare bê gotin ku rê û rêbazeka duakirinê nîşan daye.

Selatan ez bi cî bînim
Du'axwaz û bi amîn im
Ji wê fikrê betal nîn im
Li reca û temennayê

Temenna û recaya min
Qebûl nabe du'aya min
Ji duxanan nedaya min
Bidda sîran Leylayê (Mur 11-12, r.423)

Tu rehman î bi heqqê te
Gunahêd min ji hed zêde
Nehin xeffar ji xeyrê te
Di nîv zulmat û pinhan î (Mur 8, r.430)

Tu yî Xaliq ez im bende
Ze’îfê jar û şermende
Dirêj lewra dilim hind e
Tu kêm nabî ji îhsanê (Mur 15, r.432)

Xwedawenda tu yî me’bûd
Duayê min nekî merdûd
Şefî’ê min bikî Mehmûd
Seqîl bin xêr di mîzanê (Mur 24, r.433)

Îlahî lew dikim zarî
Di van roj û şevê tarî
Ji zunûban ra xemxwar î
Gunahê min bi Xufran î (Mur 25, r.434)

### 2.3.2. Ehmedê Xanî

Li gorî bawerîya Îslamê meriv ta’etên xwe divê tenê ji bo Xwedê bike. Ku durûtî/rîya bikeve dilê meriv, ew perestin betal dibin û dibin sedemê helakbûna meriv. Li alîyê din merivên îsyankar jî ku tewbe bikin û duayên ji dil bikin, dibe ku paqij bibin û bên bexşîn. Bandora duayê pir mezin tê pejirandin û tê zanîn ku duayên tu kesî bê bersiv namînin.

‘Abid bi riyayekê hilak in
‘Asî bi du’ayekê di pak in (M 59-88, r.294)

Li gorî Ehmedê Xanî dua derman e ji derd û birînên dilê meriv ra. Her çiqas ku meriv ne rehet be û dilşewat be jî divê her tim dua bike. Di vir de tê dîtin ku Xanî ji bo mîrî Serhedê duayan dixwaze. Bi vî awayî şîreta duakirinê dixweyê di gotinên wî da.

Xanî tu jî destan hilîn
Herçen ku zêde dilkul în

Îro bo mîrî sailîn
Kan padişahê Serhedan? (Mur 7-34, r.135)

### 2.3.3. Mele Xelîl Sêrtî

Li gorî Mele Xelîl dua hêzeka bi bandor e. Di van beytan da bandora duayê û ji bo dûrxistina belayan girîngîya wê anîye ziman. Li aliyê din meriv divê her tim ji Rebbê xwe bexşandinê bixwaze, lewra guneh û xeletîyê meriv pir in. Meriv bi tobe û duayê paqij dibe, rûpeleka nû vedike. Şîreta Mele ya li ser duayê bi vî rengî ye.

Duayânê bê şek eser ba hene
Ji def'â belâyê re hinga me ne (M 11-1, r.15)

Ji Rebbê xwe xufranê telbe bike,
Bi tewbê tu paqij dibî, her bike. (M 17-42, r.26)

Gelek caran tê dîtin ku mirov neqebûlbûna duayên xwe tînin ziman û encamên duayên xwe li vê cîhanê dixwazin pir caran. Tê zanîn ku hin caran duayên meriv ji bo axreta wî merivî tê pejirandin. Mele Xelîl sedemeka neqebûlbûna duayên meriv wiha anîye ziman ku ew kesên malên heram dixwin, duayên wan nayên pejirandin û ew kes encamên duayên xwe nabînin. Li gorî vê şîreta Mele divê ev yek li ber çavan be her tim.

Ku goştgirtina te j'heramî bitin
Duayê te êdî qebîl nabitin. (M 20-9, r.31)

### 2.3.4. Seyîd Elîyê Findikî

Li jêr jî tê dîtin kul i gorî Seyîd Elî dua, razeka pir bihêz e û sedemê firehîya dil û giyan e. Ji Xwedê bêhtir derîyê hawar û hêvîyê tune ye. Barê vê cîhanê yê mezin, tenê bi duayê dikare li ser pişta meriv sivik bibe. Di bawerîya Îslamê da jî tê zanîn ku kesên bi dil dua dikin, yan li vê

dinyayê yan jî li axretê teqez dê xêr û bereketa duayên xwe bibînin. Ji ber vê yekê Seyîd Elî di her rewş û demê da kirina duayê şîret kiriye.

Dua em dê bikin tu jî dua ke
Dua baş in ji dermanê Xuda ne (Q 15-9, r.111)

Siparê rehmeta Rebbê Rehîm bî
Ricakarê li dergahê Kerîm bî (M 20-22, r.155)

Ez birîndar û xerîb im bêdewa û bêtebîb im
Kuştiyê cewra reqîb im hêviya min Zulcelal (X 22-3, r.165)

Ez nabînim kesê barê te bar kî
Ji xeyrê dergehê Reb nîne hawar (Q 27-18, r.197)

Di Quranê da li ser duayê gelek ayet hene. Hin mînak:

Gava evdên min, ji te bipirsin; bêguman ez pir nêzî wan im. Gava yê gazî min bike jî ez gazîya wî qebûl dikim; bila ew jî, gazîya min qebûl bikin û bawerîyê bi min bînin. Da ku ew bi ser rêya rast bikevin.[96]

Perwedekarê we dibêje ku: "Hawara xwe bi min bikin, ez dê bersiva we bidim. Bêguman ewên li xwe danaynin ku min bihebînin, ewê bi riswatî têkevin cehenemê."[97]

Hûn bi tirs û xof, ji dil gazî û hawara xwe bi perwerdekarê xwe bikin! Bê guman, ew ji yên ji xetê derdikevin, hez nake.[98]

Li ser duayê hin gotinên pêşîyan li jêr hatine tomar kirin:

- Xwedê derdê bê derman nedaye, dema Xwedê bike, wê mele çi bike.[99]

---

**96**Beqere/186.
**97**Mû'min/60.
**98**E'raf/55.
99 Celan, **h.b.**, r.187.

- Xwedê heye, xem tune ye.[100]
- Ku hebe bixwe, ku tune dua bike.[101]

## 2.4. HEZKIRIN Û EVÎNDARÎ

Di wêjeya klasîk da têgihên wek eşq, aşiq û me’şûq, yar, dilber, mehbûb, dost û hwd. ciyekî berfireh digre. Em dikarin bibêjin berhemeka klasîk tune ku tê da qiseta eşqê û hezkirinê/muhebbetê nehatibe kirin. Tê dîtin ku hemû wêjevanên klasîk, berhemên xwe kêm zêde bi têgih û wateyên eşq û hezkirinê hûnandine. Em dikarin bibêjin ku eşq, têgiha herî girîng a edebîyata klasîk e.

Di edebîyata klasîk da eşq, hezkirina herî bilind e û ji bo aşiqan, hebûna jiyanê pênase dike. Ji bo evîndar, ji hezkirinê bilindtir tu tişt tune ye û ji bilî eşqê her tişt bêwate ye. Di helbestên klasîk da tê dîtin ku aşiq ji bo hezkirîya xwe dikare xwe bikuje, bişewtîne û hwd. dikare her tiştî bike ji bo dilbera xwe. Evîndar wisa ji hezkirîya xwe hez dike ku êdî xwe winda dike, bîr û hiş ji ser diçe û dest ji pêdivîyên jiyanê berdide. Ji bo aşiq, jiyan bi hezkirîya wî watedar dibe û veqetîna ji dilberê bo wî mirin bi xwe ye. Divê ev yek jî bê gotin ku di wêjeya klasîk da eşq, bi rêjeyeka mezin eşqa îlahî ye û armanca helbestvan ew e ku bi rêya evîna mecazî xwe bigihîne evîna îlahî.[102]

Di tesewifê de du cûreyên eşqê derdikeve pêşîya me: yek eşqa mecazî, ya din jî eşqa heqîqî ye. Eşqa mecazî, eşq û hezkirina dinyayê û mirovên fanî ra têkildar e. Eşqa heqîqî, eşqa Xweda ye. Eşqa heqîqî gelek zêde bûye mijar û armanca helbestvanên klasîk. Helbestvan dema behsa eşq û têgihên eşqê dikin jî, armanca wan a giştî eşqa Xwedê ye, ango eşqa heqîqî bixwe ye. Di edebîyata klasîk da eşqa mecazî wek navgîneka gihîştina eşqa heqîqî, tê pejirandin. [103]

---

**100**Celan, **h.b**., r.187.

101Amed Tîgrîs, ***6762 Gotinên Pêşiyan***, Weşanxaneya Rewşen, Stockholm 2001, r.150.

**102**Uludağ, Süleyman, ***Aşk, TDV İslam Ansiklopedisi***, C 4., İstanbul 1991, r.18-21.

103 Selvî, **h.b**., r.18-21.

Têgiha eşqê di tesewifê de gelek zêde hatiye bikaranîn. Eşq di helbesta klasîk da wekî şewitandina di nav agir da hatiye dîtin. Aşiq ji bo evîndara xwe ewqas dihele û dinale ku ji bo vê yekê, eşq wekî agir û şewitînê hatiye binavkirin.

Aşiq, dilketî ye, dildayî ye. Ji dereceyên herî zêde ji Xwedê hez dike. Me'şuq, yar e, dilber e, canan e. Di tesewûfê de ew, Heq Teala ye. Lê Belê Heq Teala ji hezkirinê ra bi her awayî layîq e.[104]

Feqîyê Teyran li gorî me dîtîye di helbestên xwe da mijara eşqê di 27 bendan da hûnandîye (Bnr., r.,128/4, 129/7, 132/17-18, 133/21,24, r.,134/25, 135/28, 136/31-33, 148/4, 149/5, 150/7, 152/12, 153/13-14, 177/14, 244/22, 281/158, 293/197, 305/243, 427/8, 438/19, 449/1, 450/6,9). Me hin mînakên wan di vê beşê da tomar kirine.

Helbestên Ehmedê Xanî da temasa vê mijarê hatîye kirin. Li gorî ku me tespît kiriye Ehmedê Xanî di 44 beyt û bendan da qiseta eşqê kiriye (Bnr., *Mem û Zîn* r.,15/1-4, 42/8-10, 63/12-15, 147/3-7, 151/49, 225/15-16, 259/89-91, 284/16-21, 285/22-31; *Dîwan* r.,144/16, 161/4, 166/6-8; *Nûbihar* r.,31/1). Me hin mînak ji van gotinan di vê beşê da nivîsandine.

2 beytên Mele Xelîlê Sêrtî da ev mijar hatîye nivîsandin (Bnr., r.,24/29, 26/50). Ev her du beyt jî di vê beşê da hatine tomarkirin.

Li gorî tespîta me Seyîd Elîyê Findikî li deh cihan mijara eşqê hûnandîye û şîretên xwe kirine (Bnr., r.,77/2, 99/6, 101/12,14, r.,107/8-10, 131/2-3, 251/12). Hin mînak me di vê beşê da tomar kirine.

Di beşa hezkirin û evîndarîyê da Feqîyê Teyran zêdetir şîretên xurt kirine û li pêş e. Ehmedê Xanî mijara eşqê li gelek ciyan bi kar anîye, lê şîretên Feqîyê Teyran zêdetir in.

### 2.4.1. Feqîyê Teyran

Feqî ji yara xwe wiha hez dike ku li gorî wî sed ser û sed hezar dev hebana û bi wan pesnê hezkirîya xwe bidaya dîsa dê kêm bimaya. Lewra li gorî wî qîmeta hezkirîyê nayê jimartin û

[104]Koyuncu, **h.b**., r.53.

pênasekirin. Di vir da gazîyek ji dilberê ra dixweyê ku Feqî pîleya hezkirina xwe pêşkêşî wê dike. Şîretek veşarî li dilberê heye ku divê li gorî vê hezkirinê tevbigere û dilê Feqî geş bike.

Xwezî min sed ser hebana
Sed hizar dev pêve bana
Ew hemû l'medhê te bana
Hêj bi wan noqsan im ez (Mur 25, r.134)

Li gorî Feqî evîn ne hêsan e, tenê bi ziman çênabe. Evîndar divê pêşî daxwazkar û dilxwaz be û guhdarîya hezkirîya xwe bike, ji bilî hezkirîya xwe tu tiştî nehizire û nekeve fikara. Li aliyê din xizmeta meşûqê ya timî pêwist e, lê belê bi awayekî rastî û dirustî. Her dem hezkirî divê di hiş da be û evîndar doza westanê neke, gilîyan ji vê rewşê neke. Feqî ji wan kesên ku ketine rêya evînê yan jî dê bikevin wê rêyê ra şîretên xwe li jêr rêz kirine.

Kesê bi işq û muhbet
Bi dil yekê peristî
Daim dê bête xizmet
Bi rastî û dirustî
Muqîm dê çav li rê bet
Lew şev û roj nawestî (X 5, r.149)

Dê aşiqan meylek hebî
Guhdarê me'şûqa xwe bî
Qet hay ji paşrojê nebî
Ji intîzara wesletê (Mur 243, r.305)

Di dilê mirov da hesta hezkirinê heye. Tê dîtin ku mirov li vê dinyayê aşiqê gelek tiştan dibe. Lê belê ev dinyaya qerase û asîman demkî û fanî ye. Feqî di van bendan da vê yekê anîye ziman û mirovan hişyar dike. Di tesewifê tê dîtin ku meriv her çiqas xwe bixapîne jî jiyan, dost û hemû hezkirî fanî ne, piştî hezkirina wan gava veqetîn çêdibe dil û rihê meriv perçe dibe. Li gorî Feqî hezkirî û dostê rasteqîn Xweda ye, li vê dinyayê gelek êş û kul hene û wefa, dilrehetî tenê li bal Xweda ye. Evîna vê dinyayê û bûneweran dînê meriv betal dike. Yê ebedî Xweda ye, wekî din

hemû bûnewer demkî ne û bi mirin in. Hezkirina vê dinyayê bê feyde ye û tije cewr û cefa ye. Dost û hezkirîyê heqîqî tenê Xweda ye û meriv divê hestên xwe ji bo Xwedê bixebtîne.

Feqî go bilbil taze
Tu bilbilek sewda yî
'Işqa gulê mecaz e
Tu yarek bê wefa yî
Dostê ebed bixwaze
Da lê nebit fenayî (X 12, r.152)

'Işqa mecaz tu terk ke
Ew sir û dîn betal bûn
Tu yarekê heder ke
Li min bê ilmê xeyb bûn
Carek li wî nezer ke
Ebed heye her hebûn (X 13, r.153)

Ey dilo terk ke sefa
Qet kes li bal nînin wefa
Bêfayde cewr û cefa
Qet kes li bal nînin wefa (Mur 1, r.449)

Hubba Xwedê bîr bîn tinê
Me'bud ew e nabit fenê
Yar her ew e jê bin xenê
Qet kes li bal nînin wefa (Mur 6, r.450)

Li gorî Feqî hezkirî ango dilbera wî jîyan bi xwe ye, ku dilber tune be ava kewserê jî bêwate ye û agirê dojehê jî ji wê veqetînê çêtir e. Evîndar, birîndar e. Ji bo başkirina birînê dermanek pêwist e. Ew derman jî dilber bi xwe ye. Aşiq li dermanê digere û hawarê dike. Wê nexweşîyê tenê dilber dikare baş bike û hawarê tenê ew dibihîse, lewra dilber nexweşîya evîndarê xwe baş dizane.

Aşiq her tim li benda dilberê ye ku were dermanê bidiyê û wî baş bike. Ev her sê bend şîretê li dilberê dike.

Bê ism û cismê dilberê
Çi b'kim bi ava kewserê
Dê ixtiyar kim seqerê
Nar xweştir e ji firqetê (Mur 197, r.293)

Dikim hawar dewa lê kî
Ku bê carek derman lê kî
Welê bejnê tu zahir kî
Bibînim ez di cîlwê da (Mur 8, r.427)

Tu yî derman tu yî melhem
Bi halê min tu yî e'elem
Xiyala min tu yî herdem
Te nadim ez bi sed tiştî (Mur 19, r.438)

## 2.4.2. Ehmedê Xanî

Li gorî Xanî evîn, ciwanî, hezkirin û hwd. hemû hebûn û têgih bi fermanên Xwedê hatine çêkirin û jêdera hemû afirandinê Ew e. Dildarê heqîqî û mecazî Ew e. Navên Xweda keval û lewheyên kitêbên evînê û neqşên pênûsa evînê ne. Navên Xwedê bi her awayî cîhanê dixemlînin, evîn jî xemleka navê Wî ye. Navên Wî ku tune bin her tişt xav, kêm û bê xêr e. Her tişt bi bereketa navên Wî dikemilin û dixemilin. Ji ber vê yekê evîn jî divê ji bo Xweda be, ango heqîqî be ne mecazî be. Evîn divê meriv bigihîne Xwedê û dilê meriv divê bi evîna Wî tije bibe. Şîreta Xanî ya li ser eşqa heqîqî bi van beytan xuya dike.

Ey metle'ê husnê eşqibazî
Mehbûbê heqîqî û mecazî

Namê te ye lewhê nameya ‘eşq
Îsmê te ye neqşê xameya ‘eşq

Bê neqşê te neqşê xame, xam e
Bê namê te name, natemam e (M 1/2-4, r.15)

Li gorî Xanî ev jiyan tije kul û keser e. Gelek rewşên vê jiyanê dilê meriv diêşîne û aramîya dil direvîne. Barê xemên dinyayê pir giran e, meriv bi tena serê xwe nikare vî barî hilbigre. Ji bo şahî û xeman dost û bira pêwist in. Meriv bi alîkarîya dora xwe dê bikaribe ji bin barê vê jiyanê derbikeve. Ji bo evîndaran jî tenêtî barê herî giran e û gelek dijwar e. Evîndar dema ku tenê man û ji hezkirîyê dûr ketin divê sebir bikin û bi aram bin. Sebir pêwist e ji bo evîndaran. Li alîyê din evîndar divê hev tenê nehêlin. Lewra tenêtî ji bo wan dînbûn e û malxirabî ye. Xanî şîretên xwe li evîndaran bi vî awayî rêz kiriye.

Hemdem ku nebin ji bo derman ra
Hemderdi nebin ji bo xeman ra

Xemgîn bi çi dê biken tehemmul
Şahîn bi çi dê biken tewessul

Şahî û xeman divêti enbaz
Derdan û deman divêti demsaz

Unsiyyetê aşiqan sukûn e
Sermayeyê wehşetê cunûn e

Asûde diben bi yekdu hemqal
Xasma ku hebin bi yek ve hemhal (M 27/3-7, r.147)

Di wêjeya kurdî ya klasîk da tê dîtin ku rexneyên li evîndaran tên kirin, nayên pejirandin. Li gorî wan kesê ku evîndar dibe ango dikeve bin sîya evînê, pir caran mêzîna bîr û hiş tevlihev dike. Lewra işq, bandoreka mezin li rih û dilê aşiq dike. Kesên aşiq birîndar in, nexweş in. Bo vê

yekê ku xeletîyên evîndaran çêbibe jî divê bê bexşîn û lome li wan neyê kirin. Xanî jî van yekan tîne ziman û li eşq û aşiqan bêhnfirehîyê dixwaze.

Mem ger çi ku zêde pirr gunah e
Lê aşiq e, ‘eşqi padîşah e
Hukmê tu meke li padîşahan
Zulmê tu meke li bêgunahan (M 47/15-16, r.225)

Li gorî Xanî evîn mirêka Xwedê ye, Wî nîşan dide û wek roja li asîmanan dibiriqe. Evîn nêzîktirîn rêye ku meriv digihîne Xwedê. Evîn mirovan diguhêre û dixe alemek din. Bihayê evînê gelek zêde ye û evîn wek gewherê ye. Bi vî wayî Xanî hişyarîya qîmetzanîna evînê dike. Li gorî wî li ser rûyê erdê kes nîne ku ava evînê venexwaribe, lê hin kes dibe ku dûr û kêmpar mabin, tehma evînê baş fêm nekiribin. Êdî her keseku bi camêrîya xwe û bikaranîna vîna xwe vê yekê dijî. Hînkirin û diyarkirina qîmeta eşqê di van beytên Xanî da hatine rêzkirin.

‘Eşq ayîneyê Xudanuma ye
Xurşîdisifet xudanziya ye

Xafil mebe ‘eşqê fîlheqîqe
Ey rahirew eqrebutterîqe

Xweş cewher e cinsê kîmiya ye
Qedrê wê bizan giranbiha ye (M 58/17-19, r.284)

Kes nîne ji ‘eşqê bê eser bit
Mumkin ku ji zewqê bê xeber bit

Her kes bi qiyasê hîmmeta xwe
Dê serfi biket îradeta xwe (M 58/24-25, r.285)

Demsala biharê serdema herî xweş a salê tê dîtin. Gul û gîya vedibin, kulîlkên curbicur reng didin, ajal ji hêlînên xwe derdikevin û di encamê da dilê merivan pir geş dibe. Li gorî Xanî di demsala biharê da evîndar û dilber biçin ger û geştê, xweşikahîya biharê bibînin û ji bo van rûdanên

rind û spehî spasîya Xwedê bikin, ev yek karekî pir qenc dibe. Xanî dibêje ‘‘Ev yek li min gelek xweş tê, ez bawer im li evîndaran jî dê pir xweş were.’’ û şîreta xwe ya bî rengî li evîndaran dike.

Di fesla nûbiharê da digel dîlber biçin geştê
Ji wê xweştir umur nabit ev hal li min qewî xweş tê (M 12-1, r.31)

Yê ne evîndar be li gorî Xanî dîn e, kêm û bê fêm e. Girîngîya eşqê li bal hemû helbestvanên klasîk gelek bilind tê pejirandin, lê Xanî bi taybetî di berhema xwe ya *Mem û Zîn*ê da pir zêde li ser eşqê rawestîya ye. Divê malikê da xuya ye ku ew kesên ku qîmeta evînê nizanin wek mirovên kor in û ji bo kor in, nabînin divê rexneyên tuj li wan neyên kirin.

Me’zûr e eger sofî bit munkirê mehbûban
Kor dê çi tesewwur kit sirra ku di dûribîn (X 10-16, r.144 )

Şîreteka Xanî li dilberê dixweyê di vê beyte da ku li gorî wî aşiq birîndar e, dilêş e, ketî ye. Aşiq tedawîyê dixwaze ji hezkirîya xwe. Destê me’şûqê pîroz e, aşiq dixwaze destê hev bigrin û bi vî awayî baş bibe, bigihîje şîfayê. Dermanê aşiqan me’şûqê wan in. Di vê malike da vexwendinek heye li me’şûqê ku divê ew were û aşiq derman bike.

Vede destan hebîba min, bike derman tebîba min
Bike derman birîna min, bi destê di mubarek (X 19-4, r.161 )

Li gorî Xanî yê ku eşqê bixwaze û bikeve rêya evînê, divê hin tiştan bipejrîne. Rêya eşqê gelek dijwar e, zor û zehmet e, tije strîn e di edebîyata klasîk da. Aşiq divê her tim di soza hezkirîya xwe da be, dile wê qet neêşîne wek Şêxê Sen’an. Evîndar divê her tim li ber fermana hezkirîyê amade be û ku hewce be canê xwe jî bê fikar divê bide. Li gorî Xanî evîndarî tenê bi gotinên xemlandî çênabe, divê di pratîkê da jî xuya bibe.

Di fermanê ku aşiq bit, we nexwazit minafiq bit
Divê her dem muvafiq bit, wekî şeyxê di sen’anê

Wekî şeyxê wî hadir bit, li fermanê we nazir bit
Bi emrê dostê kafîr bit, bisojit sufhê Qur’anê

Disojim suhf û mektûbê, bi emrê yar û mehbûbê
Dema dil dem bi metlûbê, didim ez dîn û îmanê (X 21/6-8, r.166 )

### 2.4.3. Mele Xelîlê Sêrtî

Li gorî Mele Xelîl ew kesên doza hezkirina Xweda bike divê vê yekê îspat bike bi kirinên xwe. Hezkirina Xwedê ji hemû hezkirinan pêştir û çêtir e. Divê meriv qelbê xwe ji hezkirin û hemû bûnewerên vê dinyayê bişo. Tu hezkirina vê dinyayê li ber hezkirina Xwedê nayê hisabê. Tê dîtin ku Mele, şîreta eşqa îlahî dike li merivan.

Mûcerred bike qelbê xwe j'masîwan
Li ber wî tune tu bibîne ewan. (M 17-29, r.24)

Tu hingav Xwedayê xwe hez jê dikî
Ku dinyayê bavêjî, hez jê nekî. (M 17-50, r.26)

### 2.4.4. Seyîd Elîyê Findikî

Li gorî Seyîd Elî tehma rasteqîn a vê dinyayê di hezkirina Xwedê da ye. Kî vê çêjê bigre, bila bernede. Hezkirina Xwedê li her du cîhana sedemê gihandina armancê û dilfirehîya dil e. Eşqa heqîqî, eşqa Xwedê bixwe ye. Yên aşiqê Xwedê dibin, li axretê digihin hemû daxwazîyên xwe.

Lezzet ew e hubba Xudê
Her kî ku bigrê bernedê
Ew dê bighête meqsedê
Gava biçîtin wê dinyayê (X 9-2, r.77)

Dilber divê hezkirîyê xwe perişan neke, here li balê, dest ji kîna xwe berde û wî dilşad bike. Li gorî Seyîd Elî ku dilber van yekan bike, dê minetek mezin li hezkirîyê xwe bike.

Heta kengî bikî kînê
Ji dil rakî cuwê xwînê
Eger dilber me bîr bînê
Te minnet der beyabanê (X 12-6, r.99)

Eşq wek dermanekî ye ku nexweşên dilşewitî baş dike. Kesê ku evîndar dibe, êdî nikare bandora eşqê mandel bike. Lewra kesên ku hima qurtek ji dermanê eşqê tehm kiribe, vê yekê pir baş fêm dike û dibîne. Li gorî Seyîd Elî eşq, xwazgînê xwe dilşad dike.

Rastî dermanê derdê dilê nexweş
Ev ji bil işqa perîrûyan nîn e

Her yê ku qurtek ji ev derman tam ke
Eger ehlê însaf be munkir nîne

Kesê qurtek ji ev tiryak dibexşin
Ku ew xwedperest û tenperwer nîne (X 14/8-10, r.107)

Di nêrîna Seyîd Elî da hezkirina vê dinyayê wek belayekî ye ku dibe asteng bo gihandina Xwedê. Dinya ji derve şêrîn dixuyê, lê li hundirê xwe tehl e. Kesê ku armancek xwe hebe bo axretê, divê baldar be di vê mijarê da.

Me çiqa nêrî me dî hubba dinyayê bûye bela
Qet kesek negha Xudê hetta ji dil ew ranekir

Tu ji dil bavêje wê tehl e di batin de bizan
Ger çi zahir de şîrîn e ew wekî şîr û şekir (X 17/2-3, r.131)

Seyîd Elî jî qiseta birîndarîya aşiq kiriye. Li gorî wî aşiq; birîndar e, kezebşewitî ye, mêzîna dil û hiş winda kiriye. Lewra divê gazin, zêde jê neyên kirin.

Nekin gazind ji ‘Elî ku qirqirê kit
Birîndar e ji kezeb nebêjin nenale (X 37-12, r.251)

Hezkirin, di Qurana Kerîm da bi awayên cihêreng cihê xwe girtîye. Wek mînak:

Hinek mirov jî, ji xeynî Ellah jê ra hemtayan çêdikin û çawa ji Ellah hez dikin, ji wan jî wisa hez dikin. Ên îmanê anîne jî Ellah bêhtir hez dikin. Xwezî ewên zulm li xwe kirine, wek gava ku ew 'ezab dibînin, bizanîbûna ku bêguman hêz hemû ya Ellah e û teqez 'ezabê Ellah pir dijwar e.[105]

Tu bibêje: "Her hûn ji Ellah hez dikin, werin bibin tabi'ê min, ji bo Ellah jî ji we hez bike û gunehên we ji we ra 'efû bike. Ellah xefûr û rehîm e."[106]

Tu bibêje:" Hûn bi ya Ellah û pêxemberê wî bikin. Eger ew berê xwe jê biguherînin, bila baş bizanibin ku Ellah, ji kafiran hez nake."[107]

Derbarê vê mijarê da gotinên pêşîyan jî hene. Hin mînak:

- Evîndar, birîndar.[108]
- Evîn behr e, ewê bide nav diçe nav.[109]
- Jana dilan û êşa kezeban, dernakeve ji dilan.[110]
- Ji evîndaran re Bexda ne dûr e.[111]
- Hatina evînê, çuyîna aqil e.[112]

---

**105**Beqere/165.
106 Alî Îmran/31.
107 Alî Îmran/32.
**108**Celan**, h.b.,**r.14
**109**Celan**, h.b.,**r.63.
**110**Celan**, h.b.,**r.87.
**111**Celan**, h.b.,**r.191.
**112**Celan**, h.b.,**r.20.

## 2.5. QENCÎ, CAMÊRÎ Û XÎRET

Di ekola tesewifê de peyvên wek îhsan, hîmmet, kerem û hwd. gelek caran hatine bikaranîn. Di vê beşê da beytên şîretker ên ku bi van peyvan hatine nivîsandin yan jî wateyên van peyvan dihundirînin, armanca me ye.

Îhsan wateyên wek’’Qencî, başî û comerdî, bexş’’[113] dihundirîne. Îhsan, qencîkirin e. Îhsan ew tişt e ku li ser meriv ne ferz be, lê dîsa jî meriv başî û qencîyan bike ye. [114]

Kerem wateyên wek’’comerdî, bexş, 'eta, xelat, îkram.[115] dihundîrîne. Lê bi giştî ji bo wateyên comerdî/camêrî, îkram û xelatê hatiye bikaranîn di edebîyata klasîk da.

Xîret/hîmmet wateyên wek’’'Ezm û îrade, xwestin û vayîna/îradeya bi dil û can, namûs, alîkarî.’’[116] û ‘’xebat, xîret, hewl.[117]dihundîrîne. Di tesewifê de sewqkirina dil ji bo armancek. Hîmmet, wek alîkariyeka manewî tê dîtin. Ji ber vê yekê di wêjeya klasîk da aşiq li benda hîmmetê/xîretê ye ji hezkirîya xwe. [118]

Wêjevanên edebîyata klasîk dema derheqê mijarên navborî da şîretan dikin, carinan li xwe yan li hezkirîya xwe, carinan jî li yên dîtir dikin. Tê dîtin ku bi taybetî helbestvanên klasîk ji ber ku dilşewat in, ji hezkirîya xwe qencî/îhsan, camêrî/kerem û xîretê/hîmmetê dixwazin. Hin caran em dibînin ku ji civata giştî ra jî bi wateyên jorîn şîret hatine kirin. Di helbestên kurdî yên klasîk da îhsan, kerem û xîret bi wateyên cihêreng hatine bikaranîn. Li jêr di şîrovekirin û nirxandina beyt û bendan da hin mînakên van têgihên girîng dê bên pêşkêşkirin.

Li gorî tespîta me Feqîyê Teyran li 5 cîyan ev mijar hûnandîye (Bnr., r.,221/39-40, 222/43, 271/122, 285/171). Me ev bend vê beşê da tomar kirine.

---

[113] Durre, h.b., r.248.

[114]İmam Gazâlî, ***Kimyâ-yı Saâdet***, C 1, s. 297.

[115] Durre, **h.b**., r.27.

[116] Durre, **h.b**., r.21.

[117] İskender Pala, ***Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü***, Akçağ Yayınları, Çap.3., Ankara,1995, s. 231.

[118] Pala, **h.b**., r.231.

Helbestên Ehmedê Xanî da wateyên xîret, qencî û camêrîyê li 20 cîyan da hatine hûnandin (Bnr., *Mem û Zîn* r.,38/23-27, 40/40-46, 145/63, 198/36; Dîwan r.,121/6-8, 163/2, 164/4-5). Di vê beşê da şîroveya van gotinan hatine kirin.

2 beytên Mele Xelîlê Sêrtî li ser vê mijarê me tespît kirine û di vî beşê da me tomar kirine (Bnr 24/29, 25/35).

Helbestên Seyîd Elîyê Findikî da 6 gotinên derbarê vê mijarê da ne me tespît kirin (Bnr., r.,31/20, 39/14, 91/5, 93/6-8). Hin mînak me di vê beşê da tomar kirine.

Di vê beşê da Ehmedê Xanî li pêş e.

## 2.5.1. Feqîyê Teyran

Jîyana vê cîhanê her çiqas demkî ye û zû diqede jî, lê tê dîtin ku bi rast were bikaranîn, pir guncaw e ji xêr û bêran ra. Feqî vê yekê tîne ziman û şîretên xwe rêz dike. Her wiha mirovên hişmend divê qencî û xêran bikin û vê dinyayê bi camêrîya xwe ava bikin. Ev cîhan ji kesî ra nemaye, divê meriv di vê jîyana demkî da pir qencî û xêran bikin. Lewra ev jiyan carek tenê tê pêşîya meriv. Feqî dixwaze meriv bi xweşmêrî qencîyan bikin û vê yekê wek mêr û şêran bikin.

Dinê qenc e ji mêran ra
Eceb mulk e ji şêran ra
Ku ava kin ji xêran ra
Ecêb mezr e û eqqar e (Mur 39, r. 221)

Dinê qenc e tijî şêr bin
Jê xêran ra di xweşmêr bin
Ne mislê min di bêkêr bin
Dibê kesp û dibê kar e (Mur 40, r. 221

Dinê xelqno bi kê maye
Belê qenc e û mezra ye

Ji xêran ra Xwedê daye
Xebatkar bin ku ev car e      (Mur 43, r. 222)

Di vê bendê da tê dîtin ku karên hatine dest pê kirin, divê nîvco nemînin. Teralî li vê dinyayê xisar e. Li gorî Feqî dinya cihê xîretê ye, pêwist e ku xizmet bên têkûzkirin. Feqî bo vê şîretê her çiqas mirîdan dabe axaftin jî, em dikarin bibêjin ev yek ji bo hemû merivan bi heman awayî ye.

Şeyxê me esnam niyyet e
Ya Reb em û ev qisete
Çibkin ku dinya xîret e
Şert e temam kin xizmetê      (Mur 122, r. 271)

Tê dîtin ku xîret û xebat derîyên serfirazîyê vedikin. Meriv û neteweyên bê xîret, teral û sist her tim di nav geremol û keşmekêşîyê da ne. Li gorî Feqî pêwist e ku meriv him ji bo xwe him jî bo neteweyê xwe xîretkar, jêhatî, xebatkar be û berjewendîyên neteweyê xwe li ser yên kesane bigre.

Em şîreta nûriyetê
Hem xîreta qewmiyetê
Nadin bi teb‘ê dînetê
Bê cezbeya sefahetê      (Mur 171, r. 285)

### 2.5.2. Ehmedê Xanî

Ji van beytên Xanî tê fêmkirin ku ev cîhan cihê xîret û xebatê ye. Kesên ku dixwazin bigihîjin armancên xwe divê xîretkar û xebatkar bin. Dikare bê gotin ku ev yek ji bo kesan wisa ye, bi heman awayî ji bo neteweyan jî wisa ye. Hat dîtin ku ji dîrokê heya vêga bêyî xîret û xebatê, bêyî qencî û lutfa navxwe tu meriv û tu gel negihîştine armancên xwe. Li gorî Xanî ev kêmahî wek

nexweşîyekê ye li nav kurdan, lê Xanî dermanê vê nexweşiyê daye û nîşan kiriye. Ev jî xîret, şûr û îhsan in.

Her çî bire şûrê destê hîmmet
Zebt kir ji bo xwe bi mêrî dewlet

Lewra ku cîhan wekî ‘erûse
Wê hukmê di destê şûrê rûse

Lê ‘eqd û sîdaq û mehr û kabîn
Lutf û kerem in, ‘eta û bexşîn

Pirsî ji dinê min ev bi hîkmet
Mehra te çi? Gote min ku hîmmet

Hasil ku dinê bi şîr û îhsan
Tesxîri dibit ji boyi însan (M 5/23-27, r.38)

Li gorî Ehmedê Xanî gelê kurd pir bi xîret û wêrek e. Lê bi qasî wê, ji minetê jî aciz in, dixwazin bi tena serê xwe tevbigerin û nakevin bin barê minetê. Ji ber vê yekê gelê kurd bi yekcarî li hev nakin, her kesek an komek ji hev cuda ne û bi serê xwe tevdigerin. Ev demeka gelek dirêj e rewşa kurdan bi vî awayî ye. Xanî ev yek bi kurtahî û zimanekî zelal xistîye nav helbestên xwe.

Li aliyê din li gorî Xanî, ku kurd bibana yek û hemûyan bida pey serwerekî, dê bigihîştana hemû armancên xwe, dê huner û zanîn biketa destê wan, gelên dora kurdan dê ji kurdan ra bibana xizmetkar, qenc û neqenc dê ji hev bihatana cudakirin û xwedîyê huner û zanînê dê pir bihêz bibana. Xanî bi van malikan nexweşîyên kurdan û dermanên van nexweşîyan yek bi yek rêz kiriye.

Hindî ji şeca‘etê xeyûr in
Ew çende ji minnetê nefûr in

Ev xîret û ev ‘uluwwê hîmmet
Bû mani‘ê hemlê barê minnet

Lew pêk ve hemîşe bê tifaq in
Da‘îm bi temerrud û şiqaq in

Ger dê hebûwa me îttifaqek
Vêkra bikira me înqiyadek

Rûm û ‘Ereb û ‘Ecem temamî
Hemiyan ji me ra dikir xulamî

Tekmîli dikir me dîn û dewlet
Tehsîli dikir me ‘îlm û hikmet

Temyîzi dibûn ji hev meqalat
Mumtazi dibûn xudankemalat (M 5/40-46, r.40)

Li gorî Xanî, qencî divê li cih be û li layîqan bên kirin. Qencîya li namerdan qencîyeka vala ye û bêkêr e. Gava qencî û başî ciyê xwe nebîne, winda dibe û tu sûd jê nayê.

Lê zayî’e hîmmeta kerîman
Derheqê nelayîq û leîman (M 26-63, r.145)

Li gorî Xanî hêj ku meriv sax in û qencî ji deste wan tê, divê tu kêmahîyê nekin di qencîyên xwe da. Malê xwe di karên qenc û hêja da xerc bikin. Lewra gava ku temen qedîya êdî meriv nikarin tu tiştî bikin.

Hêja ku xweşî telef bike mal
Bilcumle bide bi husunê e’mal (M 41-36, r.198)

Gelek caran tê bihistîn ku tê pirsîn ‘‘Ka misilman bi tevahî çima di rewşeka xirab da ne.’’ li gorî Xanî rêvebirên misilmanan sucdarê herî mezin in. Lewra li bal rêvebiran başî, xîret û

fedakarî nemaye. Wekî din rêvebir li pey berjewendîyên xwe digerin û alema Îslamê ji wan ra ne derd e. Tê dîtin ku xîret, qencî, fedakarî û camêrî ji kes û civatê ra pir pêwist e.

Îslamê li cengê tu mebê bo çi zebûn e?
Lewra ku kerem nîne li humatan û kumatan (Q 6-7, r.121)

Li gorî Xanî xebat û têkoşîna meriv a kesane tune be tu kes alîkarîya meriv nake û xîretkar nabe ji meriv ra. Meriv bila ji kesî hêvî neke ku jê ra zehmetîyên bê berjewendî bikşînin. Berjewendî tune be tu kes ji meriv ra alîkarîyê nake. Bêyî bihayê xizmeta xwe bi dest bixe kes barê meriv nakşîne û hilnagire ser milê xwe. Li gorî Xanî ku Îsa be jî pêşî dê kar û barê xwe bifikire. Her kes pêşî xwe û berjewendîyên xwe difikire.

Bê ‘emel tu ji kes meke hêvî ‘eta u hîmmetê
Bêxered nakêşitin qet kes ji kesê zahmetê
Kes nehin qet hilgirit barê te ew bê ucretê
Gerçi ‘Îsa bit ku wî fikra ker û barê xwe ye (Mur 20-2, r.163)

Vê çarîna Ehmedê Xanî da tê dîtin ku nesîb û para destheqê merivan divê bên dayîn, derengî pê nekeve. Ku debara merivan pêk neyê, bivê nevê dê nikaribin fedakarîyan bikin. Leşker jî heman wisa ye ku ew jî negihîjin mûçeyên xwe û îltîfat li wan neyên kirin, bi hêsanî canê xwe nadin di şer da. Heqdayîn di her cureyê jiyanê da navgînîya serfirazîyê dike. Xanî bi vî awayî şîretek kiriye.

Ca nezer ke îbretê pêla ku waqi’ bit sewaş
Ger nebîtin îltîfat û mûçe û debr û me’aş
Cundiyê rimbazê faris naditin canî belaş
Sa’eta serbaziyê hêvî ji serdarê xwe ye (Mur 20-4, r.164)

Li gorî Xanî dikare bê gotin ku ji bo gihandina armancê xwestin pêwist e. Mirovên ku ji bo mijarekê daxwaza wan tune be, ew tişt ne gengaze ku pêk were. Xwestin, mereq û hewes têgihên sereke ne bo serkeftinê. Xwedayê mezin her çiqas pêwistîya Wî tune, dîsa jî qencî û lutfa xwe dide ‘evdên xwe yên daxwazkar. Ji bo serfirazîya dinyayê û axretê daxwaz girîng e.

Xaniya! Zayî’ meke weqtê xwe ey nadan ’ebes
Bê teleb nabî ji weslê behremend ey bulhewes!
Sani’ê mutleq ku nîne îhtiyacek wî bi kes
Lutf û îhsana ji wî derheq telebkarê xwe ye (Mur 20-5, r.164)

### 2.5.3. Mele Xelîl Sêrtî

Li gorî Mele Xelîl meriv ku bixwaze qencî, îhsan û kereman bibîne li vê dinyayê, divê li gor fermanên Xwedê tevbigere. Ku evdên Xwedê di rêya Wî da bin û fermanên Wî bînin cih, wê gavê Xweda jî li wan evdên xwe qencîyan dike.

Rî'ayet bike emr û nehyê di wî,
Ku îhsan û lutfê bibînî ji wî. (M 17-29, r.24)

Mele Xelîl anîye ziman ku gava qencî kete dilê merivekî divê ew kes lez bike û wê qencîyê pêk bîne. Xerabî jî berevajî ye ku hate dilê merivekî divê ew xerabî neyê kirin û ji dil bê avêtin.

Ku qencî kete qelbê te lez bike,
Xerabî ji şeytaniye, wê meke. (M 17-35, r.25)

### 2.5.4. Seyîd Elîyê Findikî

Li gorî Seyîd Elî divê meriv malên xwe di rêya qencîyê da xerc bikin. Dinya demkî ye û zû diqede. Veca hêj derfet di destê meriv da heye, divê meriv malê xwe di qencîyê da serf bike, pê xêran bike û dilê xemgîra bi malên xwe şad bike.

Meger serf kî wekî mêra
Nehêlî tu ji xelkê ra
Bikî pê qencî û xêra
Dile xemgîra pê şakî (Q 2-20, r.31)

Seyîd Elî dibêje ku hezkirina dinyayê, ji qencî û xêran ra jî asteng e. Yên ku bixwazin bibin mirovek qenc û qencîyan bikin, pêwist e ku hezkirina vê cîhanê nexe dil an jî ji dilê xwe biavêje. Hingê dê derîyê qencî û xêran jê ra vebin û li gorî dilê xwe dê bikaribe qencîyan bike.

Heta kengê tuwê bêjî
Elî lakin tu napêjî
Heta dunyayê navêjî
Bizan qencî ji te nayê (X 3-14, r.39)

Di Quranê da şîret, peyv û wateyên li ser qencî, camêrî û xîretê hatine bikaranîn. Hin mînak:

Tu bi tiştê ku Ellah daye te, warê axretê bixwaze û ji dinyayê jî nesîbê xwe ji bîr neke, wek ku Ellah qencî bi te kiriye, tu jî qencîyê bike û li ser rûyê erdê xerabîyê nexwaze! Bêguman Ellah ji fesadan hez nake![119]

Bêguman Ellah, edaletê, qencîkarîyê û ji bo xizmên we jî fermana alîkarîyê dike; fuhşîyat, xerabî û neheqîyê jî li we qedexe dike. Ellah bi hêviya ku hûn bifikirin û îbret bigirin şîretan li we dike.[120]

Hûn di rêya Ellah da înfaq bikin û bi destên xwe, xwe neavêjin xeterê. Qencîyê bikin, bêguman Ellah ji ên qencîyê dikin hez dike.[121]

Gotinên pêşîyan da li ser vê mijarê gelek mînak hene. Hin mînak me li vir tomar kirin:

- Xîret zêr e, ji xeynî namusa pê re.[122]
- Xîret ji îmanê ye.[123]
- Başî kar e, xirabî bar e.[124]

---

**119**Qesas/77.
**120**Nehl/90.
**121**Beqere/195.
122Celan, **h.b.**, r. 184.
**123**Celan**, h.b.**, r. 184.
**124**Celan**, h.b**., r. 24.

- Başî, hevalê roja xirab e.[125]
- Camêrî dûvê masî ye; ku ji dest filitî, tu nagrî.[126]
- Kesê başîyê dixwaze, dive baş be.[127]
- Kesê ku bi kevir were te, tu bi nan herê.[128]
- Qencîyê bike bavêje avê; beg nizanibe jî Heq dizane.[129]
- Qencî, qencîyê tine.[130]

## 2.6. PERWERDEHÎ Û ZANÎN

Dikare bê gotin ku perwerdehî hewcehîyek e ji bo her merivî û neteweyî. Meriv bi perwerdehîyê, xwe û cîhanê nas dike, pêşve diçe û dikemile. Tê dîtin ku li ser rûyê dinyayê, hemû merivên serkeftî û neteweyên pêşketî bi perwedehîyeka tekûz û resen gihîştine wê kemilînê. Girîngîya perwerdehî, zanîn û xwendinê berbiçav e di jîyana merivan da. “Perwerdehî ji hîndekariyê cudatir bi gelek aliyê însan ve têkildar e. Ne tenê hînkirina ziman û hin zanistan e; herwiha hînkirina exlaq, kiryar û nirxan e. Ji bo ku perwerdehî bê dayîn divê pêşî meriv xwedî sîstem û mufredatekê be. Di perwerdehîya zimên de ev pêdivî girîngtir û acîltir e. Lewre perwerdehîya zimên, perwerdehîya çandî, dînî, kevneşopî, bîr û baweriyan e jî. Dîsa madem ziman mifteya hemû zanistan e, şêwe û kalîteya perwerdehîya zimên bandor li zanîna zanistên din jî dike...”[131]

Helbestvan û nivîskarên klasîk jî vê yekê dîtine û di xebatên xwe yên nivîskî da cih dane perwerdeya gelên xwe. Tê dîtin ku di helbestên klasîk da him ji bo xwendekaran û him ji bo mamosteyan şîret hatine kirin ku di hengama perwerdehîyê da rê û rêbazên baş û rast bikarbînin. Helbestvanên kurdî yên klasîk di perwerdehîya kurdan da pirsgirêk û kêmahî dîtine û li gorî derfetên demê pêşnîyazên xwe anîne ziman. Hat dîtin ku di helbestên xwe da şîretên xwendin û

---

[125]Celan, **h.b**., r.24
[126]Celan, **h.b**., r.38.
[127]Celan, **h.b**., r. 97.
[128]Celan**, h.b**., r. 103.
[129]Celan, **h.b.,** r. 147.
[130]Celan, **h.b**., r. 147.
[131]Zahir Ertekin, ***Li Tirkiyeyê Hin Astengên Li Pêşperwerdehiya Kurdî û Pêşniyarên Çareseriyê***, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi Yıl:1, Cilt:1, Sayı:1, Ocak 2015, ss. 28-38, r.2-3.

zanînê, ilmê rast û belavkirina zanyarîyan kirine. Dema şîretên xwe kirine jî carinan ji nefsa xwe ra gotine. Vê yekê jî em dikarin bibêjin bandora gotinên wan zêde kiriye.

Di helbestên Feqîyê Teyran da 13 bendên ku li ser perwerdehî û zanînê ne me tespît kirin (Bnr, r.,121/31, 118/21-22, 119/23, 122/33-34, 244/23, 252/52, 272/125, 286/174, 292/194, 340/17, 366/133). Hin gotinên Feqî wek mînak di vê beşê da hatine tomarkirin.

Ehmedê Xanî di berhemên xwe da li ser perwerdehîyê rawestîya ye û li gorî dîtina me li 20 cîyan qiseta perwerdehî û zanînê kiriye (Bnr, *Mem û Zîn* r.,37/11-12, 41/4-7, 43/22-23, 228/15, 284/14; *Dîwan* r.,148/4-5, 174/11, 276/4; *Nûbihar* r.,9/1, 13/1, 15/1, 27/1, 29/1, 33/1). Di vê beşê da hin mînak hatine tomarkirin.

2 beytên Mele Xelîlê Sêrtî yên ku di vê mijarê da ne hatin tespîtkirin û vê beşê da hatin nivîsandin (Bnr, r.,28/3-4).

Helbestên Seyîd Elîyê Findikî da li 7 cihan qiseta perwerdehî û zanînê me tespît kirin (Bnr, r.,33/26-27, 39/15, 63/21, 93/11, 94/17, 209/26). Tevahîya van gotinan dîdaktîk in û di vê beşê da me tomar kirin.

Di vê beşê da Ehmedê Xanî li pêş e.

### 2.6.1. Feqîyê Teyran

Li gorî Feqîyê Teyran zanîn wek zêr û gewhera ye û pir bi qîmet e. Bi taybetî dive meriv zanînên sûdewer bi dost û xizmên xwe ra parve bike. Tê zanîn ku meriv û netewe bi zanînê hebûna xwe didomînin, li ser piya ne û pêş dikevin. Bo vê yekê Feqî tine ziman ku pêwist e heqîqet û agahî neyên nepenîkirin, bên belavkirin, ji merivên dîtir ra bi awayekî zelal û rewanbêjî bên gotin. Yên li pêşber divê ji gotin û axaftinên meriv fam bike. Peyvên meriv divê bi fêma pêşber ra hevdeng be, da ku ew kes sûd bigre ji wê zanînê. Feqî bi van bendan rêya perwerdeyê eşkere û şîret kiriye.

Heqîqeta van cewheran<br>
Me‘rîfeta ‘enasiran<br>
Penhan neke j’yar û biran<br>
Bê dev bibêje hikmete (Mur 21, r.118)

Bê dev û qîl û qal bibêj
Hêdî bi lefzê hal bibêj
Ber "Mîm û Hê û Dal" bibêj
Şerh û beyana kaxetê (Mur 22, r.118)

Da kaxetê "îsbat" bikin
Qeydêd hûr "î'tîbar" bikin
Carek li min "îzhar" bikin
Wazih" ku fehmê min re tê (Mur 23, r.119)

Feqî tîne ziman ku mirovên hişmend û zana dema li ser mijarekê diaxivin, axaftinên wan ne li haşê ne, bêyî lêkolîn û têgihiştineka qenc tevnagerin. Tê dîtin ku Feqî şîreta xwe ya bi vî rengî li kesên ku xwe zana, hişmend û perwerdekar dibîne, kiriye. Li alîyê din di benda duyem da rexneyeka nepenî li ser nezanan tê kirin. Herwiha mirovên nezan wek dîn û ajal hatiye şibandin. Lewra ajal û kesên dîn nikarin hişê xwe bi tevahî bikarbînin. Ji ber vê yekê bêyî lêkolîn, hizirîn û lêgerîn divê pirs ji zanayan neyên kirin û bi mijarên ne li cih ra neyên mijulkirin.

Xelkê Xwedê aqil kirî
Hem arif û kamil kirî
Nûrek di dil da hilkirî
Eslê qisan rê dibetê (Mur 33, r.122)

Ê mîslê min bê 'îlm û xet
Mecnûnekî heywan sifet
Bê teftêş pisyaran diket
Bê rehnima kî babetê (Mur 34, r.122)

Di vê bendê da şîret û hesreteka veşarî ya Feqî dixuyê. Perwerdehî bi zanîna mamoste û daxwaza xwendekar digihê kemalê. Xwendekar ku nexwaze hîn bibe, mamoste çiqas zana be jî feyde nake. Xwendekar bi coş û evîn divê guhdarîya mamoste bike û her tim hişyar û daxwazkar be. Dikare bê gotin ku ev bend xeyala Feqî ya li ser perwerdehî û dîwanxaneyan eşkere dike.

Wî demê derwêş bi coş bûn
Meclis û sohbet di xwoş bûn
B'mihbet û işq û xiroş bûn
Ji şahiyan kes xew netê (Mur 52, r.252)

Li gorî vê benda Feqî dikare bê gotin ku gava karek hate kirin, divê qenc û kêrhatî be, ji bo pêşerojê ronak û bi xeml be, hêj dereng neketî dest pê bike. Ev benda Feqî dikare li ser hînbûn û xwendevanîyê jî bê nirxîn. Divê tovên qenc ango xwendekar û zarokên behredar û jêhatî bên bijartin, li gorî wan perwerdeyeka pêşketî û pir baş bê sazkirin. Ku xwendekar li gorî behreyên xwe neyên veqetandin, hingê dibe ku ew dexl ango pol yan jî dibistan dê negihêjê armancên xwe. Tovên xweş û nexweş divê bên cudakirin, yên ne baş werin tedawîkirin; yên baş jî bi perwerdeyeka qenc divê bên baştirîn.

Tovê bijarê bê ‘illlet
Bavêje erdê bê xillet
Ew dexlekê paqij diket
Ji sunbula zira‘etê (Mur 125, r.272)

Tê dîtin ku dema axaftin zêde dirêj dibe, civat an jî yên li hember ‘aciz û bêhnteng dibin. Li gorî Feqî gotin divê kurt û resen be. Li alîyê din yên guhdar jî pêwist e ku zû fêm bikin, sebra axaftvan kêm nekin. Tê dîtin ku Feqî ji her du alîyan ra jî şîret kiriye.

Ji paş evan kitabetan
Dirêj mekin ‘îbaretan
Hûn seh bikin îşaretan
Dûr in ji halê hikmetê (Mur 194, r.292)

Di vê benda Feqî da tê dîtin ku xwendin, ilm û zanyarî qedr û qîmetê bi xwe ra tîne. Dikare bê gotin ku divê kesên xwende û zana vê rêzdarîya derdorê bi tevgerên xwe xera nekin.

Bersîs qewî xîret hebû
Hem qedr û hem qîmet hebû
Nav ‘amiyan hurmet hebû
Ji xwendin û tilawetê (Mur 17, r.340)

Li gorî Feqî meriv bi zanînê digihîje kemilînê, qedr û qîmet li gorî zanebûnê dîyar dibe. Yê ku mirovan ji hev cuda dike aqil û zanîn e. Li alîyê din yên ne zana û pîşekar her tim di nav zehmetî û geremolê da ne. Ku ilm û hişmendî tune be civat her tim tengahîyan dibîne û pirsgirêkan dikşîne.

Kîmya li ba min ‘aqil e
Însan bi ‘ilmî kamil e
Re’ya ne ehlan muşkil e
Xelqê mudam di xefletê (Mur 133, r.366)

### 2.6.2. Ehmedê Xanî

Li gorî vê beyta Xanî dikare bê gotin ku perwerdekar ne tenê dema xwe, divê dûr jî bibîne û li gorî wê tevbigere. Li gorî Xanî carinan tiştên ku ne li xweşî mamoste bin jî divê xwe bigre û tehemmul bike. Hin tiştan divê veşêre û çawa ku ne qewimî bin bipejrîne.

Ustadî divêtin û teemmul
Îxfa û texaful û tehemmul (M 48-15, r.228)

Li gorî Xanî ku meriv şareza û çavvekirî be di her rûdanên jiyanê da şîret û rênîşan hene. Bi taybetî çîrokên demên berê û dîrokî tije ders û tecrûbe ne. Li gorî wî divê meriv bêpar nemînin ji pendên ku di hemû qonaxên jiyanê da cih girtine û veşarî mane.

Her qisse ji hisse behremend in
Her emsîle ger bizanî pend in (M 58-14, r.284)

Tê dîtin ku fêrbûn, kemilîn û pêşveçûn ne karekî hêsan û ji rêzê ye. Li gorî Xanî xwendekar ku dersên dîtî dubare neke, xebata xwe nedomîne û di pratîkê da nîşan nede, nagihîje armanca xwe, nayê naskirin û navdar nabe. Mirovên nezan, rêz û hurmetê jî ji dora xwe nabînin. Xanî ev yek bi vê beytê anîye ziman.

Hetta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf
Di dinyayê tu nabî ne meşhûr û ne me‘rûf (M 1-1, r.9)

Xanî tîne ziman ku mirovên zana û pêşeng ên di nav gel da bi qencîyê nav dane, pêwist e nerm bin, sebirkêş bin û ji sînorên xwe dernekevin. Tê dîtin ku mirovên hişk û bêhnteng di nav civatê da nayên hezkirin û nikarin berê kesên din bidin qencîyê. Lewra bi tevgera hişk di nav gel da pêbawerîya wan dişkê.

Arifê ku bi qencî me‘rûfi bit
Dê helîm û sabir û mewqûfî bit (M 3-1, r.13)

Li gorî Xanî kesên xwedî armanc lazim e ku lezgîn bin ji bo gihîştina armancên xwe û xebatkar bin, ne sist bin. Lewra dewr û dem û şert û merc diguhêrin û dibe ku derfetên di dest da ji dest herin. Li aliyê din Xwedayê mezin erd û asîman û her cure pêwistîyên jiyanê ji candaran ra saz kiriye. Xanî tîne ziman ku pêwist e meriv ji Xwedê ra spasîyan bike ango jê ra îbadet bike û tu carî ji fermanên Wî xwe nede paş, lezgîn be ji bo bicihkirina fermanên Wî.

Ger dê te meqsûdek hebî lazim divê lê pê bilez
Xasma te me‘bûdek hebî daim di emrê wî bibez (M 4-1, r.15)

Zanîn û zanyarî ji bo meriv wek rûmet û payeya mezin tê dîtin û pejirandin. Lê belê girîngîya zanyarîyê, ku kirin ango ‘emel tunebe gelek kêm tê dîtin. Ku zana û mamoste bi ilmê xwe ‘emel neke bê feyde ye. Her wiha li gorî Xanî ku pratîka zanînan neyên kirin, ew zanîn resen nabin û tên jibîrkirin. Kesên ku bixwazin di ilmê da bi pêş bikevin, pêwist e ku bi zanînên xwe pratîkan bikin û di jîyana xwe da van zanînan serf bikin.

Ger te bivêtin ku beraber nebitin kes bi te ra
Ilmî bixwûn hem emelî bike sen'et ji xwe ra (M 10-1, r.27)

Li gorî Xanî li vê cîhanê ji zanînê biqîmettir tu tişt tune. Dewlemendîya herî mezin û wesîleya pêşveçûnê tenê ilm û zanyarî ye. Vêca zanîna qenc bibe nesîbê kesekê ev yek jê ra gencîneyeka bêhempa ye. Xanî bi vê beytê girîngîya zanînê pir eşkere anîyê zimên û pêşnîyaza hînbûna ilmê kiriye.

Herçî kesê ilmekî qenc xwendiye
Dewlete ger wî bi esil zaniye (M 11-1, r.29)

Li gorî vê beyta Xanî tê dîtin ku xwendekar, dema fêrbûnê da êş û zehmetîyan bikşîne jî ev yek ji bo pêşveçûnê pêwist e. Ji bo xwendekar bi ser bikeve divê mamoste ne dilnerm be, berevajî dilhişk be û ji bo hînbûna xwendekar gunehê xwe lê neyne. Ji berê ve hatiye pejirandin ku êş û eziyet merivan dikemlîne û bihêz dike. Li alîyê din xwendekar jî divê dilfireh û bêhnfireh be, ji bo serkeftinê her peywirê ku mamoste bo hindarîyê bide pêk bîne û rêzê ji mamosteyê xwe ra bigre. Girîngîya van her du vebijêrkan ji alîyê Xanî ve hatine nivîsandin.

Muellim bila dil wekî ber bitin
Divêtin ku şakird dil ber bitin (M 13-1, r.33)

Şîretên Xanî yên li ser perwerdehîyê didome ku li gorî wî xwendekar divê dilxwaz û lêkolîner be û li ilmê bigere. Alim û mamoste çiqas zana bin jî ku yên li hemberê wan nezan, bê behre û ne daxwazkar bin, tişteke ku mamoste pêk bîne namîne. Mamoste divê zana û şareza be, lê xwendekar jî divê bixwaze. Mamoste ku gencîneyek be, mifteya wê gencîneyê xwestina xwendekar e û xwendekar divê ji wê gencîneyê sûd bigre.

Talibê îlm û kemalê nebitin qabilê feyd
Hîkmet û terbiyeta 'alimê dana çi bikit?

Qelbê xanî sedefa gewherê îrfan e welê
Metinxwanek ku nebit sahibê me’na çi bikit?     (X 13/4-5, r.148)

Li gorî vê beyta Xanî tê fêmkirin ku pend û şîret divê cihê xwe bibînin û girîngîyek xwe hebe. Yên li pêşber ku ne amade be an jî qîmeta gotinan nizanibe, divê şîret û gotinên hîkemî lê neyên kirin. Lewra bi wî kesî dê qîmeta wan gotinên girîng jî kêm bibe. Ew şîret dê beredayî biçin û tu sûdê nedin. Tê dîtin ku derdor, şert û merc ne pêkhatî be li wê derê tu ronahî peyde nabin.

Rezîl û serxweşim wellahî waiz
Li min zayî' meke wan we'z û pendan[132]     (X 5-4, r.276)

## 2.6.3. Mele Xelîlê Sêrtî

Li gorî Mele Xelîl armanca hînbûn û xwendinê divê bilind ango ji bo Xweda be. Rutbeyên vê dinyayê jî wek vê dinyayê demkî û fanî ne. Gihiştina razîbûna Xwedê ji her rutbeyî bilindtir û pîroztir e. Armanca xwendin û hînbûnê divê li gorî razîbûna Wî be. Li aliyê din hînkirin û hîndarî jî divê ji bo Xweda û razîbûna Wî be, ne ji bo pesna vê dinyayê be. Razîbûn û rêya Xweda raserî her tiştî ye. Mele Xelîl bi van her du beytên xwe şîreta hînbûna ilmê ya ji bo Xwedê dike.

Heçî ku dixwînî ji bo Wî bixwîn
Ji tedrîs ji rutba dinê re mexwîn.

Tu dersê didî hem ji bo Wî bide,
Ji bo xizmet li tem' û fexrê mede!     (M 18/3-4, r.28)

Li gorî Mele Xelîl pirsyarî divê ji pispor û zanayan bê kirin. Bi vî awayî her tişt divê bicih be, da ku meriv bigihîje armanca xwe. Pispor û zana dê pirsgirêkê çareser bikin û dilê meriv xweş

[132]Durre, **h.b.**, r. 276.

bikin. Wekî din Mele Xelîl, kesên pispor û zana wek dermanê lazim pênase dike û parastina wan şîret dike.

Sû'alê ji mahir-fihûlan bike
Dewayê di lazim evin zebt bike.        (M 17-22, r.24)

### 2.6.4. Seyîd Elîyê Findikî

Merivên dimrin dikevin destê mirîşo. Mirîşo dema kesê mirî dişo ew di vê hengameyê da qet xwe tev nade, lewra mirîye. Heman wisa li gor Seyîd Elî divê xwendekar jî bi vî rengî be di heyama perwerdehîyê da û bi tu awayî ji gotinên mamosteyê xwe dernekeve. Mamoste çi peywirî bide xwendekar, pêwist e ku xwendekar wê bîne cih û li ber mamoste ranebe. Her çiqas ji bo mirîd û şêx hatibe gotin jî, ev bend ji bo perwerdehîyê dikare bê şîrovekirin.

Mirîd lazim d'dest şeyx da wisa bit
Çewa meyyit li ber destê xesalî
Ne wek van sofiye dunyaperest bin
Li şeyxê dikin naz û delalî                    (Q 7-21, r.63)

Quretî, pozbilindî, xwemezindîtin wek nexweşîyekê tê dîtin li nav zana û mamosteyan. Helbestvan bi van gotinên xwe hişyarîyekê dide zana û mamosteyan û dibêje ''Tenê bi gotinê nabe, divê kirin jî hebe.'' Li gor Seyîd Elî kirin û nerît pêwist e, da ku dilsozî derbikeve holê. Dema meriv tiştên dibêje ku neke, tu bandora wê tune ye û jixwe mirovên dîtir jî ji wî kesî bawer nakin. Helbestvan ilme bê 'emel wek dara bê fêkî pênase dike û li gor wî tu feydeya wê ilme tune ye.

'Elî seh ke tu we'ze xwe
Nebe mexrûr bi lefzê xwe
Neke tiştê ne tarzê xwe
Ji rih û şaşê fihê nakî         (Q 2-26, r.33)

Çiku gotin tenê nabê
Divê fi'la te xuya bê

Dikim nakim tu çênabê
Ezê bes kim tu bes nakî (Q 2-27, r.33)

Faîda ‘ilmê ‘emel kirne eger çend pere
Dara bêfêkî û sih fayda wê hîç e ey delal (X 11-11, r. 93)

Ey ‘Elî tu xweş dibêjî lêbelê napêjî tu
Gotina xalî ji kirnê hiç e wek xewn û xeyal (X 11-17, r. 94)

Li gorî Seyîd Elî hezkirina jîyana dinê, dibe asteng ku meriv bigihêje heqîqetê. Bi taybetî nunerên dînî gava ji dinyayê hez bike gotinên wî tu bandorê nakin, tu sûd jê nayên û li hewayê dimînin. Ku nefsa mamoste terbîye nebibe, her tişt li haşê diçe. Şîreta helbestvan a bi vî rengî li jêr hatiye nivîsandin.

Heçî dunyayê hez jê kî
Bila sed bar kitêb çêkî
Şev û rojê da we’zê kî
Diçit we’za wî ber bayê (X 3-15, r. 39)

Seyîd Elî şîretên xwe didomîne û dibêje ku ji bo bidestxistina armancê têkoşîn û xebat pêwist e. Çi ji bo karên dînî çi jî yên dunyewî, ev şîreta helbestvan dikare bê fikirîn.

Feqe divêtin ji bo Xudê
Di ilmê xwe da cehdê bide
Da ew bighête meqsedê
Dûr bi ji resma cahila (X 28-26, r. 209)

Mijara perwerdehî û zanînê di Quranê da cihekî berfireh digre. Hin mînak: Xwedayê me! Ji zaroyên me re pêxemberekî ji nav wan bişîne ku ayetên te ji wan re bixwîne, wan fêrî kitêb û hîkmetê bike û wan (ji guneh û şîrkê) paqij bike. Bêguman her Tu yî ‘Ezîzê Hekîm.[133]

Her wiha me pêxemberek ji nav we ji bo we şand da ku ayetên ji we re bixwîne, we (ji qirêja şîrkê) paqij bike, we hînî Qur’an û hîkmetê bike û fêrî yak u hûn pê nizanin bike.[134]

Di gotinên pêşîyan da mînakên li ser zanîn û perwerdehîyê hene. Hin mînak:

- Kesê biaqil, ji şaşîyên xwe pir tiştan fêr dibe.[135]
- Nezanî ne eyb e, nehînbûnî eyb e.[136]
- Zanayê ku xeber nade, ferqa wî û cahilî tune.[137]
- Li cem cahilan wek kitêba bêdeng be.[138]
- Ji zana bipirse, ji nezanan bitirse.[139]
- Kesê pirs kiriye, nexapîyaye.[140]
- Bi xwezîya bihar nayê.[141]

## 2.7. SEBIR

Em dikarin bibêjin ku sebir, di jîyana mirovahiyê da sitûnekî serfiraziyê ye. Mirovên li ber zehmetîyan sebir dikin û têkoşîna xwe didomînin bi rêjeyeka bilind bi ser dikevin û digihîjin armancên xwe. Sebir ji vî alîyî ve pir girîng tê dîtin.

---

**133**Beqere/129.
**134**Beqere/151.
135Celan, **h.b**., r.20.
**136**Celan, **h.b**., r.22.
**137**Celan, **h.b**., r.19
**138**Celan, **h.b**., r.19.
**139**Celan, **h.b**., r.195.
**140**Celan, **h.b**., r.103.
**141**Celan, **h.b**., r.36.

Sebir peyveka erebî ye. Di ferhengan da wateyên wek ‘’Nenîşandana behêvîtîyê û xweragirtina li ber xemgînîyên tên serê mirov’’[142]; ‘’ Tehemmûla zor û zehmetîyan, tengasî û êş û eleman, derdû xeman; cehd û kirina qencîyan, terk û nekirina neqencîyan.’’[143] dihundirîne.

Sebir ne kêmtaqetî ye, fezîlet e û qîmet e. Li gorî dînê Îslamê jî sebir gelek bi qîmet tê pejirandin. Dema xizanî û neheqîyê da sebir girîng e, lê ev yek nayê wateya bêdengbûn û teralîyê. Her mirov divê têkoşînê bike li hemberî feqîrî û neheqîyê. Dikare bê gotin ku sebir ew e, dema ku qeweta mirov têrê neke, mirov tehemûl bike û nekeve bêhêvîtîyê.

3 şîretên Feqîyê Teyran yên ku derbarê sebrê da ne me tespît kirin û di vê beşê tomar kirin (Bnr, r.,340/16, 345/40, 470/8).

Du beytên Ehmedê Xanî yên ku rasterast derbarê sebrê da ne me tespît kiriye û di vê beşê da nivîsandine (Bnr, *Dîwan* r.,117/5,7).

3 beytên Mele Xelîlê Sêrtî da me şîretên li ser sebrê tespît kirin û şîroveya wan tomar kir (Bnr, r.,23/17, 26/47, 27/61).

Di *Dîwan*a Seyîd Elîyê Findikî da li şeş cîyan me hêmanên sebrê tespît kirin (Bnr, r.,35/1, 89/21, 101/15, 107/11-12, 133/10). Yên ku dîdaktîk in, wek mînak hin ji van gotinan me di vê beşê da şîrove kirine.

Di vê beşê da Seyîd Elîyê Findikî bi li pêş e.

### 2.7.1. Feqîyê Teyran

Li gorî vê benda Feqî sebir, mifteya serfirazî û xelasîyê ye. Serê sebrê tehl e, lê binî şêrîn e. Ku destpêkê da giran û dijwar be jî, gava meriv sebir dike keser û karesat sivik û nerm dibin, tehmê didin û dibin wek şerbetê.

Lê sebra tal e xîret e
Tiryak biladan mîhnet e
Axir dewa û şerbet e
Yê xwar dizanit lezzetê  (Mur 16, r.340)

---

[142]Şemseddin Sami, ***h.b***,r.817.
[143] Durre, **h.b.**, r.420.

Meriv di nav civatê da dijî û gelek caran bûyer tên serê meriv. Tê dîtin ku hin meriv sebirkêş in, hin jî bê sebr in. Di vê bende da tê dîtin ku ya baş ew e meriv ji derdora xwe ra şîreta sebrê bike û yên hawarê dixwazin ra alîkarîyê bike. Lewra hawarxwaz ku bê sebir be, barê wî pir zêde dibe. Dikare bê gotin ku Feqî bi vî awayî şîreta sebirkêşîyê kiriye.

Nîne sebr, nîne qirar
Dil şewitî teşbihê nar
Ji lew dibêjim, hey hewar
Werin li min kin şîretê (Mur 8, r.470)

### 2.7.2. Ehmedê Xanî

Li gorî Xanî sebir, mifteya herî girîng a her cure serkeftinê ye. Tê zanîn ku mirovên bê sebir bi ser nakevin û nagihîjin armancên xwe. Di vê malikê da sebir, her çiqas ji bo desthevgirtina evîndaran hatibe rojevê jî, ji aliyê din bo her kar û barên jiyanê ji meriv dikare bifikire.

Aşiqê bêceger meger sebrê ji can û dil dikit
Mani'ê gencê meqsed e, heybetê ejdehayê zulf (X 4-5, r.117)

Behra cemala yar, eger keştî sebrekî bikit
Destê min û teelluqa damenê ba xwudayê zilf (X 4-7, r.117)

### 2.7.3. Mele Xelîlê Sêrtî

Li gorî Mele Xelîl divê meriv malên ku ji hewcehîyên xwe zêdetir bin, li pey negere û wan nexwaze. Tê zanîn ku sînorê xwestina mirovan tune ye, çi bê dest jî dilê meriv têr nabe û ya din jî dixwaze. Ji ber vê yekê helbestvan, têkoşîna sebrê li merivan şîret dike.

Tu, malê ji xwe zêde telbe meke!
Di şolande cehdê li sebrê bike! (M 17-17, r.23)

### 2.7.4. Seyîd Elîyê Findikî

Li gorî Seyîd Elî ne pêwist e ku merivên hejar li dewlemendan binêrin û xemgîn bibin. Ev cîhan warekî azmûnê ye ji bo merivan û şert û mercê her merivî cuda cuda ye. Hin kes belengaz, hin jî dewlemend in li vê dinyayê. Pêwist e ku meriv ji rewşa xwe ra sebirkêş û qenaetkar be. Lewra di sebrê da zewq heye.

Elî rûne ji vê qelqê
Bike sebrê bibîn zewqê
Nenêre dewleta xelqê
Çiku paşî tu pê nayê (X 3-1, r.35)

Li gorî Seyîd Elî sebir, derman e ji şîn, karesat, êşa dil, tengahîyên rih û hwd. ra. Di ekola tesewifê da tê dîtin ku li dinyayê tu carî hemû rûdan dê ne li gorî dilê merivan be. Lewra ev cîhan warê azmûnê ye bo mirovan. Ji ber vê yekê li gorî Seyîd Elî hînbûna sebrê pêwist e. Yê sebir dike dermanê dibîne, rizgar dibe; yê nake rewşa xwe xirabtir dike. Di dawîyê da poşmanî jî tê serê mirovên bê sebir. Sebir bo meriv dermanê dila ye û helbestvan wek Memê Zînê sebrê şîret dike.

Elî bes ke ji vê şînê
Wekî Ferhadê Şîrînê
Sebir ke wek Memê Zînê
Meded seyda meded seyda (Q 10-21, r. 89)

‘Elî bes ke ji nalînê
Tu nawestî ji kalînê
Sebir ke wek Memê Zînê
Ew e derman ji tibxanê (X 12-15, r.101)

‘Elî ta kengî tê ji hicran gilî kî
Dermanê hîcran ji bil sebrê nîne
Eger tu sebir bikî rizgar dibî
Û eger nekî, ji bil poşmanî nîne (X 14/11-12, r.107)

Sebr e dermanê musîbata li nik ehlê eqil
Reş girêdan şîn kirin gelka u qet fayde nekir (X 17-10, r.133)

Tê dîtin ku zilm û zordarî li cîhanê rû dide û gelek caran mezlûm nikarin mafê xwe ji zalimê xwe bistînin. Li gorî Seyîd Elî çareya vê yekê jî sebr e û hewalekirina Xwedê ye. Ku ev yek bên kirin hebûna axretê û sebirkêşî, dê dilê meriv şad bikin.

Kurt ke ‘Elî ji vê qissetê
Sebrê bike ser xurbetê
Heyfa te maye li axretê
Eywah ji derdê xurbetê (X 16-16, r.129)

Di Quranê da gelek ayetên li ser sebrê hene, li vir hin mînakên wan me daye:

Eger hûn ceza bidin, bi qasî ya ku li we hatî kirin ceza bidin. Lê belê ku hûn xwe ragirin û sebrê bikêşin, helbet ew ji xweragiran ra hê çêtir e.[144]

Xwe ragir e(sebrê bikêşe)! Xweragirtina te jî bes bi Xwedê ye. Ji bo wan xemgîn nebe û ji ber dek û dolabên wan bila bêhna te teng nebe.[145]

Ew, ên ku dema (navê) Xwedê tê gotin, dilên wan dilerize û dema belayek bê serê wan sebrê dikêşin(xwe radigrin), nimêjê bi awayê pêdivî dikin û ji rizqê me daye wan (di rêya Xwedê da) xerc dikin.[146]

Gelî yên ku bawerî anîne! Pişta xwe bi sebir û nimêjê xurt bikin. Bêguman Xwedê digel sebirkêşan e.[147]

Derbarê sebrê da gotinên pêşîyan gelek in, me hin mînak li vir tomar kirine:

- Sebr ji meriv wek jehrê ye, lê dawî dibe hingiv.[148]

---

[144]Nehl/126.
[145]Nehl/127.
[146]Hec/35.
[147]Beqere/153.
[148]Celan**, h.b.**, r.19.

- Dinya bi sebrê ava ye.[149]
- Dara sebrê tehl e, fêkîyê wê şêrîn e.[150]
- Sebra kêm, êşa zêde ye.[151]
- Heke sebir be rewşa te, wê bê cî miradê te.[152]
- Xwedîyê sebrê, melîkê Misrê. [153]

## 2.8. ŞÎRETÊN CURBICUR

Di edebîyata kurdî ya klasîk da dewlemendîyeka gotinên hîkemî eşkere ye. Piranîya helbestvanên kurd perwerdehîya medreseyê dîtine û gelek salan dersdarî jî kirine, tê dîtin ku di gelek beşan da pisporî bi dest xistine. Ev yek di lêkolîna berhemên klasîk da derdikeve pêşîya me. Vê rewşa helbestvanan bandor li vegêrana wan kiriye ku ji alîyê şîret û hînkirinê ve dewlemendîyek dixweyê di berhemên wan da.

Mijarên giştî me li jorê rêz kir û minakên wan dan. Vêca gelek beyt û bend hene ku ji alîyê mijarî ve neketine nav yên jorîn û derbirîna mijarên cûda cûda dikin. Şîretên li ser adab, rabûn û runîştin, rêzên civakî, dostanî, mêvanperwerî, dilpaqijî, dilnizmî, ji derew û hîleyan dûrbûn, wefa, quretî û hwd. me gelek gotinên bi vî rengî tomar kir û ev beş ji bo wan gotinan terxan bû.

Helbestvanên kurdî di her rewş û demê da ji helwestên kirêt şîreta dûrketinê kirine di helbestên xwe da. Di vê beşê da şîret û mijarên curbicur cih girtine.

### 2.8.1. Feqîyê Teyran

Li gorî Feqî divê meriv pêşîya bifikire, xwe amade bike û biparêze. Bê xebat, tedbîr û pêşgirî rewşa jiyanê dê di xeterê da be. Feqî bi navgînîya avê ev şîret li merivan kiriye.

---

[149]Celan, **h.b**., r.55.
[150]Celan, **h.b**., r.159.
[151]Celan, **h.b**., r.159.
[152]Celan, **h.b**., r.161.
[153]Celan, **h.b**., r.186

Avê digo: Feqî rabe

Bê tedbîr û ‘emel nabe

Ji halê te dê çawa be

J’kê ra dikî vê suhbetê (Mur 30, r.121)

Di tesewifê da quretî û kubarî cirên gelek xirab tên dîtin. Li gorî vê ekolê nefsa meriv ji pesindanê hez dike, lê ev yek karekî ne baş e. Xwedîyê her pesnê û yê mezin tenê Xwedê ye. Feqî jî van yekan tîne ziman ku li gorî wî, divê meriv xwe mezin nebîne, fexrê neke û bi tevgerên xwe mirovan ‘aciz neke.

Ava mezin firfir meke
Zikrê bike fexrê meke
Ehlê Xwedê aciz meke
Bes e bide min ezyetê (Mur 49, r.125)

Li gorî Feqî meriv divê şert û mercên dewra xwe pêk bîne û hişyar be li ber her qewimînê. Li gorî Feqî qewmê wî di xew da ye. Bo vê yekê bang dike ku gelê xwe hişyar bike. Neteweyek, dema xwe ji bîr bike û li gorî daxwazên demê tevnegere, di nava xisarek mezin da dê bimîne. Bi van bendên Feqî tê fêmê ku cîhan û rewş digorin; netewe jî pêwist e ku xwe nû bikin û şertên dewranê pêk bînin. Yên van nekin her tim dê reben û belengaz bin. Feqî bi vî awayî şîretek kiriye.

Dilo rabe dilo rabe

Veke çavan ku êvar e

Nezan û bes di xew da be

Bi newmê ra mebe yâre (Mur 1, r.203)

Li xwe şîrîn meke newmê

Ji nefsa xwe bike lewmê

Meçe nêzîkî vê qewmê

Qewî ew fi‘la xesar e (Mur 2, r.203)

Dilo newma me jê behs e

Beyana xefletê nehs e

Ne hişyar î gelek tehs e
Me nêv xabe ku mirdar e (Mur 3, r.204)

Feqî şîret dike ku meriv bilez amadekarîya axretê bikin û li vê bazara dinyayê pêwistîyên jîyana ebedî kar bikin. Lewra li gorî vê çarîna Feqî dikare bê gotin ku ev dinya demkî ye û jîyana vê dinyayê jî zû diqede, jîyana bêdawî li benda merivan e. Pêwist e ku meriv xwe amade bike.

Tu qûtê xwe niha çar ke
Zewadê axretê kar ke
Bilezîne û zû kar ke
Dinê sûk e û bazar e (Mur 45, r.223)

Her çiqas pesnê Şêxê Sen'an tê dayîn jî, şîretek veşarî heye di vê bendê da. Li gorî Feqî divê meriv ji kirinên gumanbar dûr bin û li pişt mirovan axaftinên neqenc nekin. Lewra tê pejirandin ku ev her du tişt civatê dixe nav alozîyê û aramîyê radike di nav mirovan da.

Dûr bû ji efa'lê bi şik
Ji emred û bikra xweşik
Ma kes xeberdanek li nik!
Naket qebûl wê xeybetê (Mur 35, r.247)

Li gorî Feqî ji dostên dilsoz ra xizmet ne cefa ye, sefa ye. Di deftera me'rîfetê ango camêrî û mirovahîyê da ji dostên rasteqîn ra xizmeta tê kirin dilrehetî û kêf e; ne êş û zehmetî ye.

Her durra dost lê lîqa ye
Hûn mebên xizmet cefa ye
Xizmeta ba xwo sefa ye
Di deftera me'rîfetê (Mur 262, r.310)

Di bawerîya Îslamê da tê zanîn ku xêr, bereket û sewabên bê sînor lixwedîderketina bêkes û rebenan da heye. Ji nexweşan ra û serdana wan ra jî gelek sewab hene. Li gorî Feqî pêwist e ku meriv haj ji bêkesan hebe û nexweşan ji bîr neke. Lewra xêrên pir mezin didin bidestxistin.

Tayê xerîban bermede
Ecrê digel wan bê hed e
Xêrê merîzan yek sed e
Ji bê hîsab fezîletê (Mur 146, r.168)

## 2.8.2. Ehmedê Xanî

Tesewifê da tê dîtin ku meriv di nav bûneweran da yê herî bi qîmet in, lê temenê merivan pir kurt e û peywirên merivan jî pir zêde ne. Ev cîhan mêvanxaneyek e, meriv jî tê da mêvan e. Li di vê cîhana demkî peywirê meriv ên herî mezin naskirina Xweda û bidestxistina bihiştê ye. Maldarî, zar û zêç feyde nakin li cîhana din. Divê meriv bi serê xwe bixebite û jîyana bihiştê bi dest bixe. Herkes dê bi serê xwe bê darizandin û tu malên dinyayê sûdek nikare bide meriv di dema darizandinê da. Xanî jî van yekan tine ziman dibêje vî zemanî her kesek mîmarê dîwarê xwe ye. Di malika dawî da xuya ye û tê fêmê ku ew kesên nexebitin, xwêdan nedin û xwe newestînin nikarin tu tiştî bi ser bixin, dê her û her di nav xisarê da bin. Ev malik dikare bê gotin ku bi awayekî jî gotina pêşîyan a ‘Çavê li derîyan, xwelî li serîyan.’şîrove dike.

Hoşyar bî! Da nekî ‘umrê xwe bêhasil telef
Lew ku nakit fayde mal û genc û ewlad û xelef
Maceraya Xidir dîwarê yetîmi bû selef
Vî zemanî her kesek mî’marê dîwarê xwe ye (Mur 20-3, r.163)

Bi vê benda Xanî tê dîtin ku her çiqas di serê meriv da mijulî û bela zêde bin jî, divê meriv li alîyên xweş binêre û kêfxweş bibe. Xanî vê yekê di malika duyem da bi girtîbûna sed salî tîne ziman û bi tu awayî hêvîya xwe naşkîne. Li gor Xani ji bo gihandina armancê divê meriv hêvîdar be. Ev yek ji merivên dîtir ra jî dikare bibe şîret ku meriv her tim divê hêvîdar bin û hêza xwe ya derûnî winda nekin.

Herçendi qewî muşewweş im ez
Ewçend bi muşewweşî, xweş im ez

Sed salî bigêrî min tu mehbûs
Ma ez qe dibem ji weslê me'yûs!       (M 44/25-26, r.212)

Şîreteka Xanî ya ji bo nivîsandin û nivîskarîyê tê dîtin. Her wiha li gorî wî, hemû neteweyên pêşketî xwedîyê kitêb, wêje û zanînê ne. Divê kurd ji vê yekê bêpar nemînin, bi zimanê xwe binivîsin û zimanê xwe pêşve bibin. Ji bo gelên biyanî nebêjin ‘‘Kurd nezan in û kêr nayên.’’ ev yek bi awayekî veşarî wek peywirekê ye ji hemû kurdan ra ku Xanî di kesayetîya xwe da vê yekê tîne ziman.

Safî şemirand vexwarî durdî
Manendê durrê lîsanê Kurdî

Înaye nîzam û întîzamê
Kêşaye cefa ji boyi ‘amê

Da xelqi nebêjitin ku Ekrad
Bê me'rîfet in, bê esl û bunyad

Enwa’ê milel xudankitêb in
Kurmanci tenê di bê hisêb in    (M 6/4-7, r.41)

Di hemû şaxên hunerî û zanistî da piştgirîya rêvebiran gelek girîng tê dîtin. Xanî vê yekê tîne zimên û dibêje heke piştgirîya rêvebiran hebûya ev yek wek îksîrekê dî feyde bidaya. Li alîyê din dibêje ku bi wê piştgirîyê dê min hemû gotinan rêz bikira û ew gotin dê bibana wek zêrên zer ango dê pir bi qîmet bibûna. Dema me da jî tê dîtin ku li hemû welatan hemû xebatên hunerî û zanistî bi alîkarî û piştgirîya rêvebiran li ser piya ne û pêşve diçin.

Zengîn diketin bi destê hîmmet
Hîkmet ew e naketin çu minnet

Ger dê wî nezer bida me carek
Îksîrê teweccuha mübarek

Ev qewle hemî dikirne eş'ar
Ev pûle hemî dibûne dînar

Emma nezera wî zêde ‘ame
Lew xasinezer ji dil neda me

Ew rehmetê xase bo ‘ewamê
Ya reb! Tu bidey wî her dewamê (M 6/47-51, r.46)

Tê pejirandin ku rexne cihekî taybet digre ji bo pêşketina meriv û civatan. Xanî hêvîdar e ku kesên zana dê efûkar bin û kêmahîyên wî rast bikin, xeletîyên wî veşêrin û belav nekin. Lewra li gorî wî merivên zana kesên gihiştî ne û veşartina kêmahîyan jixwe taybetîyeka wan e. Merivên bi xezeb jî berevajî ne û her tim yê xerakirinê ne, kêmahîyên mirovan li her derî belav dikin. Di her du malikên dawî da şîretek veşarî heye ku li gorî Xanî divê meriv ava rûyê helbestvan û nivîskaran nerêjin, ku ji destê meriv bê ya qenc û avakirinê bibêjin, zêde li kêmahîyan ‘ecêbmayî nemînin, li ser wan nesekinin û ji bo wateyên qenc şîroveyên baş bikin.

Umîdi ew e ji ehlê ‘îrfan
Ew dê negirin Ii min çu herfan

Teşnî'ê neken wekî xeyûran
Îslahê biken li min qusûran

Eshabê kemalê perdepoş in
Erbabê xerez di pirrxuroş in (M 7/67-69, r.53)
…

Ava rûwê şa’rî nerêjin
Ger mumkine yêke qenc bibêjin

Sehw û xeletan neken te’eccub
Te'wîlê biken ji bo te’essub (M 7/75-76, r.54)

Li gorî Xanî dostanî, biratî û yarî bi durûtî naçe serî û tenê bi gotinê çênabe; divê di pratîkê da jî xuya bike. Ev yek ne hêsan e û tê da êş, cefa, elem û zehmetî hene. Bi kêf û dilxweşî yarî û dostanî nadome, divê meriv gelek tiştên neyênî bide berçav her tim. Bi taybetî jî heke heya dawîyê ku meriv wefayê nîşan nede, hema qet ne hewce ye ku meriv wê êş û zehmetîyê bikşîne. Lewra dostanî û yarî wefayek zexm, resen û berdewam dixwaze.

Yarî û birayî û mu’axat
Nabit bi riyayî û meqalat

Yarî ne hêsanî ye cefa ye
Meqsûdi ji yariyê wefa ye

Axir tu eger nekey wefayê
Ewwel mede ber xwe wê cefayê (M 10/27-29, r.66)

Derew û derewkarî karekî kirêt tê dîtin di nav gel da û bi taybetî di bawerîya Îslamê da. Li gorî Xanî, encamên erênî ji derewan pêk nayên û meriv bi derewan nikarin bigihîjin armanc û mebestên xwe. Rê û rewşên dirust û rast, meriv serfiraz dikin û dibin wesîleya gihîştina armancê.

Evrengehe gote qasida pir:
Meqsûdi bi mekr û kizb û tezwîr

Ma qet dibitin ji bo te hasil
Bê rastirewî mehal e menzil (M 19/5-6, r.97)

Li gorî Xanî dostên heqîqî û ji dil ên ne ji malbatê, çêtir e ji sed xizmên xayîn, derewkar û durû. Eger bira bin jî, lê li alîyê din ku kîndar û bê wefa bin çi sûda wan heye? Divê meriv têkilîya xizmên wisa neke, dest ji wan berde û mixabinîyan jî qet neke. Dostên ji dil li pêşîya xizmên durû

ne, lewma pêwist e ku meriv li gorî vê yekê tevbigere. Li gorî Xanî, dostên ji dil ji meriv ra wek bira, çav û çira ye.

Yarek te hebit meger we bîtin
Ger dê we nebit meger nebîtin

Yarê bi te ra bitin muwafiq
Sed xizmê di xain û munafiq

Qurban bike qet mebê mixabin
Çi dikey bi kesan ku bê wefa bin

Qurban bide qet mebêje kî ne
Bêkêr e bira eger bi kîn e

Yarê te ji bo te ra bira ye
Hem çav e ji bo te hem çira ye (M 25/44-48, r.138)

Di bawerîya Îslamê da tê zanîn ku divê meriv quretî û kubarîyê neke. Lewra bêyî destûr û nesîbkirina Xweda kes nikare tu tiştî jî bike. Ji ber vê yekê bila meriv başîyên xwe ji xwe nebîne û nepejrîne. Xweda çawa ew başî dabe, bi heman awayî dikare ji meriv bistîne jî. Çawa meriv hildaye jorê, dikare dayne xwarê jî. Ji Xwedê ra tu tişt ne zor û zehmet e. Kibr û kubarî xisareka mezin e him li vê dinyayê him jî li jîyana bêdawî. Xanî jî di vê çarçoveyê da hişyarîyekê dide.

Mêhra felekê ezel ‘edîm e
Kîna felekê ebed qedîm e

Her çî wekû ew ji ‘erdê raket
Elbette wî dê di ‘erde ra ket (M 44/1-2, r.210)

Hevrikî û kîn tê dîtin ku xisarann dide civatê û dibe navgînê fesadê û nakokîyê. Li gorî Xanî pêwist e ku meriv bi cir û exlaqên xirab xisarê nede xwe û dora xwe. Bi kîn, kerb û qehrê kes nikare bigihîje armancên xwe. Him li nav dostan him jî li nav neyaran danîşana kîn û qehrê bê feyde ye û dê tenê xisarê bide xwedîyê xwe. Bi kîn zordarîyê tu tişt bi dest nakeve. Li gorî dem, şert û mercan meriv divê tevbigere, hin daxwazên xwe sar bike, hinan jî bivejîne û derxe holê. Hişyarîyeka Xanî ya civatî di beytên jêr da dixuyê.

Zahir meke tu evê 'înadê
Carek vekuj agirê fesadê (M 48-7, r.227)
…
Kerba xwe meke tu aşikara
Ya qenc ew e em bikeyn mudara

Şolin hene, ew bi kerbê nabin
Lewra ku bi zor û zerbê nabin

Ustadî divêtin û teemmul
Îxfa û texaful û tehemmul (M 48/13-15, r.228)

Hin zahir û hindekan bi xef keyn
Rakeyn hinekan, hinan telef keyn (M 48-19, r.228)

Li gorî Xanî xirabî bi tu awayî veşarî namîne, derdikeve holê. Bila kes xwe nexapîne û nebêje xirabîyên min dernakevin der û her û her dê nepenî bimînin. Wekî din li gor Xanî, xûy û cirên nebaş di kesayetîya merivan da şax vedane û piştî demekê bi tu awayî nayên paqijkirin. Xanî motîfa çil salî bo vê yekê bikartîne. Meriv di esl û bingeha xwe da çi be ew e. Her çiqas xebata xwenixumandinê bike jî mîzaca meriv naguhêre.

Xelqê ku bi esli bedsiruştin
Ew esli ji wan qe tête şuştin!

Çil salî tu henzelê biçînî
Sed avê bidê bi hingivînî

Perwerde bikey bi afitabê
Herdem birreşînî lê gulabê

Her rojê reha wê lê bi ker key
Wê fasileyê tijî şeker key

Xidmet bikirî tu hîndûwane
Ew bo te dibîte hîndûwane!

Da fikri nekey dema ku ber det
Ew xeyrî ji tehliyê semer det (M 56/13-18, r.276)

Li gorî Xanî kesên ku bi wan ra dostanî dê bê kirin, divê mirovên qenc û ji dil bin. Ew kesên meriv ji xwe ra wek dost pejirandîye ku mirovên xirab bin, ew xirabî dê derbasî jîyana meriv bi xwe jî bibe. Dostên qenc, qencîyê; yên xirab jî xirabîyê bi xwe ra tîne. Cefaya ji dostên rasteqîn ra tê kirin, dê bi wefayê li meriv vegere.

Ey dosti bi dil be yarê qencan
Ya qenci bibe neyarê qencan

Ew qenc in û qenciyê dizanin
Ew xeyrî ji qenciyê nizanin

Hindî ku bi wan bikey cefayê
Ew dê bikirin bedel wefayê

Zinhari mebe muhub xiraban
Ne dosti ne dujminê kilaban

Ger dosti bî, dê biken te mirdar
Wer dujmin î dê biken birîndar (M 57/45-49, r.281)

Li gorî xanî malek gava li nav mirovan pir dibe, qîmeta wê jî kêm dibe. Ew mal ku hindik be, vêca qîmeta wê zêde dibe. Wek kevirên ‘edetî û gewheran. Gewher jî ji famîleya keviran e, lê ku hindik e li cîhanê bihayê wê pir zêde ye. Bi heman awayî divê gotinên meriv jî li cih û hindik be. Dema meriv zêde diaxive, girîngîya gotinan kêm dibe. Her kevir li cîyê xwe giran e. Axaftina me divê li cih be. Li alîyê din axaftina zêde, jixwe rewşek kirêt tê dîtin din av civatê da.

Herçendi kelamê şubhê dur bit
Bê qedri dibit dema ku purr bit

Nabînî bi qîmet in cewahir
Lewra ku di hindik in, di nadir (M 60/12-13, r.297)

Di bawerîya Îslamê da tê dîtin ku Xwedê ji mirovên kubar hez nake û kubarî kirêt tê pejirandin. Xanî jî bi vî awayî kubarîyê wek barekî giran dibîne û hişyarîyê li kesên kubar dike.

Ey ku te kibr daim kirye ji bo xwu merkeb
Ewwel tu “bê” bike “yê” paşî bigêre merkeb (M 6-1, r.18)

Li gorî Ehmedê Xanî mirovên ku bixwazin bibin rêvebir û rêber û gotinên xwe di civatê da bidin pejirandin ango bibin muteber, bi tu awayî divê derewan nekin û jiyaneka li ser rastîyê ava bikin. Ku di bergîdanê da perçe perçe bên kirin jî divê derewan nekin.

Ger te divêtin tu bibî mîr û ser û muteber
Kizb û xîlafî mebêj ger te bikin ker bi ker. (M 8-1, r.23)

### 2.8.3. Mele Xelîlê Sêrtî

Li gorî Mele Xelîl bêyî rehma Xwedê, ji ber îbadeta xwe kes naçe bihiştê û berdewamîya ta’etê ferz e li ser merivan. Li gorî Mele divê meriv hêvîya qebulkirinê ji Xweda bike û ta’etên xwe mezin nebîne.

Wekî ku li te ew nekit şefqetê
Tu naçî bihiştê sebeb ta'etê.

Welê ferze daîm tu ta'et bikî
Recaya qebûlê ji wî her bikî. (M 13/7-8, r.16)

Lî gorî Mele Xelîl hirs ango neqayîlbûn, nexweşî ye; dermanê wê jî qenaet e. Divê meriv qenaet bike ango ji rewşa xwe qayîl bibe. Wekî din Xwedayê mezin mirovan ji aveka qirêj afirandîye. Ji ber vê yekê heqê evdan tune ku li ber Xweda mezinahîyê bikin û li ber fermanên Wî rabin. Peywira evdan ew e ku li hemberî Xwedê nefsbiçûk bin û tu caran ji emrê Wî derneyên. Li gor Mele, fexr û 'ucb jî nexweşîyeka li nav mirovan e. Di ekola tesewifê tê dîtin ku nefsa meriv gelek caran dixwaze pesnê xwe bide û xwe ji her aliyî ve kamil bibîne. Lê li gor Mele, ya bi rast ew e ku Xweda neke qismet tu tişt nakeve destê meriv û bêyî qudreta Wî meriv nikare bigihîje armancên xwe.

Tu dermanê hirsê qena'et bizan.
Ji mehsûdi re bêje medh û du'an.

Ji avek mehînî, tekebbur meke,
Tewadu' ji xelkê Xwedê re bike.

Ji şola çune, tu çi 'ucbê dikî?
Ji Xaliq nebîtin ne hedde bikî. (M 17/13-15, r.23)

Li gorî Mele nêrîna heram bîr û hişê meriv bê hêz dike, nêrîna heramê tê zanîn ku wekî serxweşbûnê bandorê li hişê merivan dike. Ji ber vê yekê hişyarîyeka Mele dixuyê vê malike da.

Nezer ku herame heçî ku bike,
Ji fehmê û hifzê xwe bê hêz dike. (M 19-8, r.29)

Mele Xelîl tîne ziman ku lixwekirina cil û kincan divê ji bo îbadeta Xwedê bin û meriv divê bi van cilan xwe mezin nebîne, pozbilind nebe. Wekî din cilên hevrişimî bo mêran ne helal e li dînê Îslamê. Mele ev yek jî xistîye nav şîretên xwe.

Lîbasê ji bo fexr û kibrê mepoş,
Mucerred ji bo ta'etê wî bipoş.

Heramî û dîbac û qez ber meke!
Bi wan ta'etê xwe tu berze meke! (M 21/1-2, r.33)

Li gorî Mele Xelîl meriv danûstandin û tevgerên xwe da divê nermahîyeka bêsînor nîşan bidin. Tê zanîn ku mirovên hişktevger nayên hezkirin û ji aliyê civatê ve tên redkirin. Helbestvan şîret û hişyarîya xwe da bi vê malikê.

Tu hilmê bike bê hed li bê qiyas,
Wekî munkerek te nebîtin ji nas. (M 17-61, r.27)

### 2.8.4. Seyîd Elîyê Findikî

Seyîd Elî şuştin û mikûrhatineka giştî, vegera ji karên çewt û hişyarbûnê dixwaze. Lewra di vê çarînî da tê dîtin ku meriv di xefletê da ye û ji ber vê yekê qelbê wî qirêj dibe. Ji nefsa xwe ra gotîye, hat dîtin ku gelek şîretên wî bi vî rengî ne.

‘Elî rabe heta kengê
Tu xafil bî bi vî rengê
Bişo qelbê ji vê jengê
Here rêrast di ce’dê da (Q 1-2, r.17)

Bi her du çarînên jêr tê dîtin ku gotinên zêde û piraxaftin karekî ne li cih e û meriv ji vê helwestê ‘aciz dibin. Pêwist e ku meriv hindik û rewa biaxive. Berîya axaftinê fikirîn û rewşa derdorê pêwist e ku bên berçav. Seyîd Elî dîsa ji nefsa xwe ra gotîye, lê dikare bê gotin ku ev şîret giştî ne û bo her kesî carî ne.

Ey ‘Elî j’kî ra dibêjî
J’keskî ra naçête mêjî
Tu çiqa ‘ezmandirêj î
Ka devê xwe bîne hev (X 24-12, r.177)

‘Ezmandirêj î tu ‘Elî
J’her tiştê tu diştexilî
Heqê te ye j’bê ‘eqilî
Mû l’te bidîtin çend zela (Q 28-34, r.211)

Li gorî Seyîd Elî quretîya male dinyayê ne rast e. Lewra ew mal nikare xwedîyê mal û milk ji veqetandinê rizgar bike. Ev veqetandin jî di demeka veşarî û ne kifş da pêk tê. Li ber pozbilindîya malê dinyayê dîsa hişyarî li nefsa xwe kiriye ku ev yek wek rêbazekê dikare bê nirxîn bo Seyîd Elî.

Deka rabe ji vî halî
Nebe mexrûr bi vî malî
Qe nabêjî demek xalî
Diçî axir di qebrê da (Q 1-8, r.19)

Li gorî Seyîd Elî yê ku dixwaze bigihêje armancên xwe divê zor û zehmetîyan, kul û derdan bide berçavê xwe. Lewra xweşî beyî xem nayê. Ew êş û keserên ku meriv dikşîne jî paşê dibin rehmet.

Feqet gul bê stirî nabî
Xezîne bê tilism nabî
Xweşî bê xem tu ca nabî
Xuda yek bê yekî nadê (X 8-10, r.73)

Ji van gotinên Seyîd Elî tê dîtin ku keda helal a hindik, çêtir e ji male pir ên heram. Keda helal, bereket e ji jîyana meriv ra. Merivên ku çavên wan li dervê ne, her tim xemgîn û dilteng in. Pêwist e ku çavê meriv ne li malê zêde be û divê qenaet bê kirin. Lewra daxwazên meriv yên li vê dinyayê tu carî naqedin. Ev şîreta helbestvan ji bo jîyana kesane û civatê ra dikare bê nirxîn.

Bike tê da îdare
Ne ku bikê wê male
Nekitin hîlebazî
Bixwê keda helal e (Mur 51-4, r.321)

Bixwe keda destê xwe
Bila cih bit newale
Nine çêtir ji qena'et
Temahî ne tu hal e (Mur 51-6, r.323)

Seyîd Elî di dîwana xwe da li ser dostanîyê pir rawestîya ye. Li gorî wî dostanî ne karekê hêsan e û tenê bi gotinan naçe serî. Dostanî berîya her tiştî sebir dixwaze. Dost ne tenê di rojên xweş da, divê di rojên ne xweş da jî li bal hev bin. Dostanîya rasteqîn heya mirinê divê bidome. Li alîyê din Seyîd Elî tine ziman ku dostê heqîqî tenê Xweda ye. Dostên li vê dinyayê jî wekî dinyayê demkî ne. Di serî da dost xweş bikin jî, paşê vir û bêbextî dikevin holê û wê dostanîyê diqedînin. Pêwist e ku meriv bizanibe dostê rasteqîn tenê Xweda ye û ne hewce ye meriv xemgîn bibe ji dostanîyên demkî yên vê dinyayê. ‘‘ Xudadar î çi xemdar î’’ ango meriv dema ku Xweda nas kir û jê ra bawerî anî, êdî tu xemgînî tune ji meriv ra û jixwe ne pêwist e ku meriv xemgîn jî bibe. Lewra Xwedê ji bo meriv ji her tiştî ra bes û zêde ye jî.

Hezar heyf e ku dostanî
Ne safî bê j'dil û canî
Biye b'hîle û du'exmanî
Me cerbandiye sed carî (X 4-5, r.41)

Divê dost lev bikin sebrê
Şerîk bin xweşî û qehrê

Heta ku ew biçin qebrê
Eger ne hîç e ew yarî   (X 4-7, r.43)

Me cerbandin ji xelqê pur
Heta dost û bira û kur
Heçî gotî hemî bûn vir
Xudadar î çi xemdar î

Eger ewwel ji te hes kin
Ewê paşehiyê bes kin
B'vir û bêbextî te kes kin
Xudadar î çi xemdar î            (X 5/5-6, r.49)

Hin gotinên pêşîyan ên li ser mijarên curbicur li jêr wek mînak me rêz kirine:

- Her kesê ku destê te bişidîne, pê re nebe dost; her kesê ku dilê te diêşîne, jê re nebe dijmin.[154]
- Mêvan bi du qismetan tê: Yek dixwe, yek dimîne.[155]
- Sirrê dostê xwe yê kevin, ji dostê nû re nebêje.[156]
- Kesê qisûr û kêmasîyê meriv ji meriv re bibêje, ew dost e.[157]
- Bila dost be, bila perçeyek post be.[158]
- Dostê dijminan jî dijmin e, ne ji min e.[159]
- Kî wefa ye, ew bira ye.[160]
- Şîreta rasterast, merivan xemgîn dike.[161]
- Şîreta bav û bapîra, ji mirov re wek find û çira.[162]

---

[154]Celan**, h.b**., r.20.
[155]Celan**, h.b**., r.123.
[156]Celan**, h.b**., r.20.
[157]Celan**, h.b**., r.21.
[158]Celan**, h.b**., r.36.
[159]Celan**, h.b**., r.59.
[160]Celan**, h.b**., r.107.
[161]Celan**, h.b**., r.18.
[162]Celan**, h.b**., r.169.

# ENCAM

Edebîyata klasîk piştî belavbûna Îslamê di nav kurdan da bûye şaxeka edebî. Edebîyata klasîk di nav kurdan da bandoreka gelek mezin kiriye û gelek helbestvan û nivîskarên kurd li gorî rêzikên vê wêjeyê berhemên xwe dane.

Di vê xebatê da armanc ew bû ku mijar û unsurên şîretî ji edebîyata klasîk ya kurdî bên berhevkirin, dabeşkirin û şîrovekirin. Dema ku berhemên kurdî yên bûne mijara vê xebatê hatin vekolîn, di nav van berheman da hat dîtin gelek zêde gotinên ku civakê têkildar dikin hene.

Bi tevahî şeş berhemên çar helbestvanan hatin analîzkirin û di encamê da ev xebat derket holê. Di Nûbihara Biçûkan a Ehmedê Xanî, Nehc'ul Enam a Mele Xelîlê Sêrtî û dîwana Seyîd Elîyê Findikî da pir zêde şîret derketin pêşîya me. Rêjeya şîretan û rêbaza dîdaktîk di van her sê berheman da pir zêde derket hole. Wekî din Mem û Zîn û dîwana Ehmedê Xanî û helbestên Feqîyê Teyran da jî rêya dîdaktîzmê bi dirûvên cuda têra xwe cih girtine. Unsurên hîkemî, şîretî û dîdaktîk pir eşkere derketin pêşîya me di berhemên navborî da.

Hin encamên şênber ên ku di vê xebatê da hatine bidestxistin li jêrê hatine dayîn:

- Em dikarin bibêjin ku berhemên ku me lêkolîn kirine bi rêjeyeka bilind qiseta eşqê û aşiqan dikin. Li alîyê din hat dîtin ku helbestvanên kurd yên klasîk cih dane gelek mijarên cihêreng.
- Bandora tesewif, dînê Îslamê û motîfên wê gelek eşkere di berhemên kurdî yên klasîk da dixweyê. Di van berheman da gelek mijarên ku civakê têkildar dikin hatine nivîsandin. Di helbestên Feqîyê Teyran da mijarên dîrokî û jîyana civakî; di helbestên Ehmedê Xanî da perwerdehî û zanîn; di helbestên Mele Xelîl da rabûn û rûniştin û rêzên civakî; di helbestên Seyîd Elîyê Findikî da jî mijarên mirin û dostanîyê zêdetir derdikevin pêşîya me.

- Helbestvanên kurd yên klasîk di nav dîwan û helbestên xwe da pir caran cih dane beyt, bend û gotinên hîkemî û unsurên dîdaktîk. Şîretên li ser dîn û tesewifê, fanîbûna dinyayê û mirovan, hezkirin û evîndaran, qencî, camêrî û xîretê, dostanî û sebrê, wefa û sozgirtinê, dua û perwerdehîyê û hwd. gelek mijarên curbicur di berhemên ku dikevin nav sînorê xebata me da, me tesbît kirin û hin ji wan jî şîrove kirin.
- Bi vê xebatê derket holê ku helbestvanên klasîk ji civaka xwe bêpar nemane û gelek mijarên ku bi civakê ra têkildar in anîne ziman, rê nîşanê civakê dane û bi derdên civakê ra hevderd bûne, qiseta gelek mijaran kirine û ji rastîyên gel bêpar nemane, ji bo pirsgirêk û çareserîyên gel hizr û şîretên xwe anîne ziman. Lewra tê zanîn ku rexneyeka mezin li wêjeya klasîk tê kirin û ew wek ‘‘wêjeya qesrê’’ tê binavkirin. Gava ku me ew berhemên vê xebatê xwendin û em li ser wan rawestîyan, encam bi giştî berevajî derket û wêjevanên klasîk jî wek merivên ‘edetî yên li nav civatê derketin pêşîya me. Lewra gelek hêmanên ku civatê peywendîdar dike di berhemên wan da cih digirin û di xebata me da jî hin mînakên wan hatine dayîn.
- Di vê xebatê da hat dîtin ku berhemên klasîk ji alîyê lêkolînên akademîk ve qadeka beyar e û li benda gelek xebatên cihêreng e. Lewra di berhemên klasîk yên kurdî da gelek mijarên cihêreng hatine nivîsandin. Ji ber vê yekê pêwist e ku li ser mijarên cihêreng xebatên akademîk werin kirin.
- Hat dîtin ku di mijara şîretên dînî û tesewifî da Mele Xelîlê Sêrtî; di mijara şîretên ku li ser fanîbûna dinyayê ne Seyîd Elîyê Findikî; di mijara nesîhetên derbarê duayê da ne Mele Xelîlê Sêrtî; di mijara şîretên li ser hezkirin û evîndarîyê da ne Feqîyê Teyran; mijara qencî, camêrî û xîretê da Ehmedê Xanî; mijara perwerdehî û zanînê da Ehmedê Xanî û di şîretên sebrê da jî Seyîd Elîyê Findikî li pêş e û zêdetir şîret kirine di helbestên xwe da.

# ÇAVKANÎ


ACAR, Hayrullah, ***İbrahîm bin Muhammed, Devlet ve İnsan, Siyasetin İlkeleri, Yöneticilerin Vasıfları, Âdâbu'l-Hilâfe ve Esbâbu'l-Hisâfe***, Büyüyenay Yayınları, İstanbul, 2016.

ADAK, Abdurrahman, ***Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk***, Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol, 2013.

ADAK, Abdurrahman, ***Mela Xelîlê Sêrtî:Helbestvanê bi Mexlesa Şewqî û Helbestên Wî Yên Kurdî(Kurmancî) Mukaddîme***, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, j.1.,Mêrdîn 2010.

ADAK, Abdurrahman, ***Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî Ya Klasîk De,*** Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2019.

Ahmed ibn Hanbel, ***Müsned,*** Beyrut, 1999, 28/138.

AKÜN, Ömer Faruk, ***Divan Edebiyatı***, TDV İslam Ansiklopedisi, C.9., İstanbul 1994.

ARSLAN, Mehmet, ***Divan Edebiyatında Nasihatnameler (Pendnameler) ve Vak'anüvis Es'ad Efendi‟nin Pendnâmesi***, Türk Dili ve Edebiyatı Makaleleri, Sayı: 4, s. 5-80., Sivas 2004.

ART, Dilazat, ***Lêkolînên Kurdî, Fasîkul II,*** Weşanên Zanîngeh, Stenbol 2013.

BALCI, Musa, ***Taşa Kazınmış Sözler: İslam Öncesi Fars Öğüt Edebiyatı,*** Büyüyenay Yayınları, İstanbul, 2016.

BİLGİN, Azmi, ***Emre Tercüme-i Pendnâme-i Attar, Pendname***, Enderun Kitabevi, İstanbul 1988.

ÇAĞRICI, Mustafa, ***"Nasihat", TDV İslam Ansiklopedisi,*** İstanbul 2006, C 32, r.408.

CANIM, Rıdvan**. *Pendnameler ve Türk Edebiyatında Benzer Nitelikli Öğüt Kitapları***, Millî Kültür**,** 1989, s.22-25.

CELAN, Ebdulah, ***4250 Gotinên Pêşiyan***, Weşanxaneya Pencînar, Stockholm 2017.

ÇETİN, ***Ramazan, Şêx Musayê Şêxanî Gundikî û Berhemên Wî yên Menzûm(Metn û Lêkolîn),*** Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Çapnebûyî, Mêrdîn 2019.

DENİZ, Muhammed İkbal, ***Jîyana Seyîd 'Eliyê Findikî û Dîwana Wî,*** Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Edebîyata Kurdî, Teza Çapnebûyî, Çewlig 2017.

DEVELLİOĞLU, Ferit, ***Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat***, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 2006.

DURDU, Mustafa, ***Türk Edebiyatında Nasihat,*** Yayınlanmamış Xebat, Konya 2008

DURRE, Abdurrahman, ***Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jîyana Wî,*** Weşanên Avesta, Stenbol 2002.

EHMEDÊ XANÎ KÜLLİYATI 4***, Dîwan***, Kadri Yıldırım(Amd), Weşanxaneya Avesta, İstanbul 2014.

EHMEDÊ XANÎ, ***Mem û Zîn***, Huseyn Şemrexî (Amadekar), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013.

EHMEDÊ XANÎ, ***Mem û Zîn, Şîrove û Kurdiya Îro***: Jan Dost, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2008.

ERGÜN, Zülküf, ***Di Peydabûna Edebiyata Kurdî ya Li Cizîra Botan De Karîgeriya Bajarvaniyê,*** Teza Çapnebûyî, Mêrdîn 2012.

ERTEKİN, M. Zahir, ***"Naveroka Helbestên Seyid 'Eliyê Findikî",*** Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2012.

ERTEKİN, M. Zahir, ***Analîzek li ser Guldana Hezîn di Çarçoveya Şîretnameyên Kurdî de,*** Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü DeYıl/Year/Sal:2 Cilt/Volume/Cîld:2 Sayı/Issue/Hejmar:3 ss.62-86.

ERTEKİN, M. Zahir***, Li Tirkiyeyê Hin Astengên Li Pêşperwerdehiya Kurdî û Pêşniyarên Çareseriyê,*** Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi Yıl:1, Cilt:1, Sayı:1, Ocak 2015, ss. 28-38.

ÊSÎ, M. Huseyn, M. Seîd GIRDARÎ, M. Muhemmed BÊRKEVANÎ, ***Wergera Qur'ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî,*** Ravza Yayıncılık ve Matbaacılık, Stenbol, 2011.

FARQÎNÎ, Zana, ***Ferhenga Kurdî-Tirkî,*** Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2007.

FEQÎYÊ TEYRAN, ***Feqîyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî***, M. Xalid Sadinî (Amd.), Weşanxaneya Nûbihar, Çapa 8., Stenbol, 2014.

Gözeten, İbrahim, ***Mele Xelîlê Sêrtî ve Nehcu'l-Enâm Adlı Eseri (Metin Ve İnceleme),*** Muş Alpaslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, (Teza Çapnebûyî), Muş 2015.

GÜLTEKİN, İbrahim, ***Taşlıcalı Yahyâ Bey'in Divanı'nda Nasihatname Türünde Yazılmış Şiirler Ve Bu Şiirlerin Konuları, Dili Ve Üslubuna Dair Bazı Hususiyetler,*** Turkish Studies - International Periodical For The Languages, Literature And History Of Turkish Or Turkic Volume 8/9 Summer 2013, P. 1525-1552, Ankara-Turkey.

KAPLAN, Mahmut, ***Türk Edebiyatında Manzum Nasihat-nâmeler,*** Türkler, Ankara 2002.

KOÇ KESKİN, Neslihan, MERMER, Ahmet, ***Eski Türk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü***, Akçağ Yayınları, İstanbul 2005.

KOYUNCU, Hüseyin, *"**Di Hin Dîwanên Kurdî de Bandora Tesewûfê**",*(Teza Çapnebûyî), Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanê Kurdî, 2014.

KURDO, Qenatê, ***Tarîxa Edebîyata Kurdî***, Weşanên Öz-Ge, Ankara, 1992.

LEVEND, Agâh Sırrı, ***Divan Edebiyatı***, Enderun Kitabevi Yay., İstanbul 1984.

MELE XELÎLÊ SÊRTÎ, ***Nehcu'l Enam***, Zeynelabidîn ZINAR(Wergêr), Weşanxana Kurdistan, Stockholm, 1988.

MENGİ, Mine, ***Eski Türk Edebiyatı Tarihi,*** Akçağ Yay., Ankara 1995.

ÖZTÜRK, Murat, ***''Klasik Türk Edebiyatında Babadan-Oğula-Ebeveynden Çocuğa-Nasihat Geleneği'',*** Akademik Bakış Dergisi Sayı:39, Celalabat-Kırgızistan 2013.

PALA, İskender, ***"Nasihatname",*** Diyanet İslam Ansiklopedisi, C.32, Ankara 2006.

PALA, İskender, ***Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü,*** Akçağ Yayınları, Çap.3., Ankara,1995.

PALA, İskender, ***Divan Edebiyatı***, Kapı Yayınları, Çap.13., İstanbul 2010.

SAĞNIÇ, Feqi Huseyn, ***Dîroka Wêjeya Kurdî,*** Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002.

SAMİ, Şemseddin, ***Kamûs-ı Türkî,*** Çağrı Yayınları, İstanbul 2006.

SELVİ, Dilaver, ***Kaynaklarıyla Tasavvuf***, Semerkand Yayınları, C.1.,İstanbul 2001.

ŞÊX EHMEDÊ FEQÎR, ***Dîwan***, Hayrullah Acar(Amd.), Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol 2016.

SEYÎD ELÎYÊ FİNDİKÎ, ***Dîwan,*** Selman Dilovan, Huseyn Şemrexî (Amd.) Weşanên Nûbihar, İstanbul 2012.

SÖNMEZ, Nesim, ***Tehlîla Nehcu'l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî***, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi Yıl:4, Cilt:4, Sayı:7, Bingöl 2018/1, ss. 67-85.

***TDK TÜRKÇE SÖZLÜK***, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2005.

TÎGRÎS, Amed***, 6762 Gotinên Pêşiyan,*** Weşanxaneya Rewşen, Stockholm 2001.

ULUDAĞ, Süleyman, ***Aşk***, TDV İslam Ansiklopedisi, C 4., İstanbul 1991.

ULUDAĞ, Süleyman, ***Dua***, TDV İslam Ansiklopedisi, C 9., İstanbul 1994.

UZUN, Mehmed, ***Destpêka Edebiyata Kurdî***, İthaki Yayınları, Ankara 2007.

VARLI ,Ebdullah M.,***Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn***, Sîpan Yayınları, Stenbol 2004.

XEZNEDAR, Me'rûf, ***Mêjûy Edebî Kurdî***, Dezgay Aras, Hewlêr, 2002.

ZINAR, ZeynelAbidîn, ***Di Çanda Kurdî de 37 Şaxên Zanistiyê***, Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm 2009.

ZINAR, ZeynelAbidîn, ***Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî,*** Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Stockholm, 1991.

## Çavkanîyên Dîjîtal:

***http://nimetyildirim.com.tr/hukumdarlara-ogutler-nasihatul-muluk/(29.07.2019)***

***http://mollahalil.siirt.edu.tr/(04/12/2019)***

***https://dilazad.wordpress.com/kurdi-kurdish-kurtce-dilazad-a-r-t/ (08.07.2019)***

***https://islamansiklopedisi.org.tr/molla-halil-siirdi(04/12/2019)***

***https://nyildirim.wordpress.com/2008/02/17/fars-ogut-edebiyati/(28.07.2019)***

***https://tr.glosbe.com/ku/tr/qirqirok/(03.05.2019)***

***https://www.agri.edu.tr/upload/anasayfa/2-uluslararasi-ahmedihani-sempozyumu.pdf (08.07.2019)***

***http://mollahalil.siirt.edu.tr/(04/12/2019)***

***https://islamansiklopedisi.org.tr/molla-halil-siirdi(04/12/2019)***

T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

**İNTİHAL RAPORU**

ŞÎRET DI HELBESTA KURMANCÎ YA KLASÎK DA:
NIMÛNEYA FEQÎYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ, MELE XELÎLÊ SÊRTÎ Û SEYÎD ELÎYÊ FINDIKÎ

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 120 sayfalık kısmına ilişkin 31/12/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından ***Turnitin*** adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orjinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 16

**Uygulanan Filtrelemeler:**

**Kaynakça hariç**

**Alıntılar dahil**

**5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar**

**Açıklamalar** Mardin Artuklu Üniversitesi ***Turnitin*** adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Mehmet Emin Demir

Öğrenci No: 14711028

Programı: Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Statüsü: Yüksek Lisans

Tarih ve İmza
08.01.2020

Danışman Onayı

Doç. Dr. Hayrullah Acar

A.B.D. Başkanı Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman Adak

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

# KLASİK KURMANCÎ ŞİİRİNDE NASİHAT: FEQÎYÊ TEYRAN, EHMEDÊ XANÎ, MELE XELÎLÊ SÊRTÎ ve SEYÎD ELÎYÊ FINDIKÎ ÖRNEĞİ

Mehmet Emin Demir

14711028

Danışman

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mardin-2019